K. T
Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstituya Zimanên Zîndî li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Teza Lîsansa Bilind

# Efsane di Grupa Nûkirin Her û Her da Hizirvan Ebdulla Wek Nimûne

Rêber Siyabend Ebbas
14711002

Şêwermend
Dr. Shahab VALI

Mêrdîn 2018

T.C
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
Yüksek Lisans Tezi

# Nûkirin Her û Her Grubunda Efsane Hızırvan Ebdulla Örneği

Reber Siaband Ebbas
14711002

Danışman

Dr. Shahab VALI

Mardin 2018

# İçindekiler

DESTPÊK ..... 5
1. Babetê Vekolînê ..... 5
2. Giringîya Vekolînê ..... 5
3. Armanca vekolînê ..... 5
4. Sînorên Vekolînê ..... 6
5. Pirsgirêkên (Arîşên) Vekolînê ..... 6
6. Rêbaza Vekolînê ..... 6
7. Peykerê Vekolînê ..... 6
BEŞA YEKEM ..... 8
1. Têgeh û Pênaseyên Efsaneyê ..... 8
1.1. Têgeha Efsaneyê: ..... 8
1.2. Zaravê Efsaneyê ..... 10
1.3. Pênaseyên Efsaneyê ..... 11
1.4. Peywendîya EfsaneyêbiBabet û Warên Cuda Cuda ve ..... 14
1.4.1. Efsane û ziman: ..... 14
1.4.2. Efsane û Derûn ..... 15
1.4.3. Efsane û Cadûyî ..... 15
1.4.4. Efsane û Hizir ..... 16
1.4.5. Efsane û Huner ..... 16
1.4.6. Efsane û Felsefe ..... 17
1.4.7. Efsane û Ayîn ..... 17
1.5. Mêjû û Serhildana Efsaneyê ..... 18
1.6. Naveroka Efsaneyê ..... 21
1.7. Curên Efsaneyê ..... 24
1.7.1. Efsaneyên Gerdûnî ..... 24
1.7.2. Efsaneyên Hodozî ..... 25
1.7.3. Efsaneyên Şaristanî ..... 26
1.7.4. Efsaneyên Cevengî ..... 26
1.7.5. Efsaneyên Ayîrdeyî ..... 27
1.7.6. Dîroka Efsaneyê ..... 27
1.8. Dabeşkirina Efsaneyê ..... 28
1.9. Regezên Efsaneyê ..... 30
1.9.1. Qehreman diEfsaneyê da ..... 30
1.9.2. Cih diEfsaneyê da ..... 31

1.9.3. Dem diEfsaneyê da ....................................................................................32
1.9.4. Rûdan diEfsaneyê da ................................................................................33
1.9.5. Kerestên Efsaneyê ....................................................................................33
1.9.6. Hizra Efsaneyi ..........................................................................................33
1.10. Efsaneya Kurdî ..........................................................................................34
1.10.1. Taybetmendiyên Efsaneya Kurdî ..........................................................38
1.10.2. Curên Efsaneya Kurdî ...........................................................................38
1.11. Efsane û Hozan ..........................................................................................39
1.12. Hinek Mînakên Efsaneyî diNav Şiîra Kurdîda .............................................41
BEŞA DUYEM ......................................................................................................43
2. Serhildana *GrûpaNûkirin Her û Her*li Devera Behdînan ....................................43
2.1. Grûpa Nûkirin Her û Her ...............................................................................47
2.1.1. Navkirina grûpa Nûkirin Her ûHer ............................................................49
2.1.2. Hizra Danan û Pêkanîna Grûpa(Nûkirin Her û Her.......................................49
2.1.3. Egerên Pêkînana Grûpa Nûkirin Her û Her .................................................51
2.1.4. Armancên Grûpa Nûkirin Her û Her ..........................................................53
2.1.5. Kar û Çalakiyên Grûpê ..............................................................................56
2.1.6. Nebûna Beyannameyê ..............................................................................59
2.1.7. Ciyawazya GrûpaNûkirin Her û Herdi gel Grupên Nûxazî yên Cîhanî ..........62
2.1.8. Egerên Lawazî û Nemana Grûpê.................................................................64
2.1.8.1. Lawazîya grûpê .......................................................................................64
2.1.8.2. Nemana Grûpê ........................................................................................68
2.1.9. Jiyannameya Endamên Grûpa Nûkirin Her û Her ........................................69
BEŞA SÊYEM .......................................................................................................80
3.1. Diyarkirin û Şirovekirina Efsaneyê di hozanên Hizirvan Ebdullayî da ................80
Çavkanî ...............................................................................................................118

## DESTPÊK

Efsane bi kevintirîn berhemê hizra mirovayetiyê dihête hejmartin, anku li despêka hebûna mirovî peydabûye, berî hebûna zanistî û nivîsînê, herwesa efsane bi jêderekê serekî ji bo edebî dihête hejmartin.

Efsane di edebiyata kurdî da bi beşekî zor giring dihête hejmartin ku dibîte egerekê mezin yê dewlemendikirina edebê folklori yê kurdî, ku resentiya gelê kurd didete diyarkirin û dibîte jêder bo pitiriya vekolînên li mêjuya gelê Kurd dihêne kirin ji gelek layenanve wek: layenê ayînî, aborî, dabonerît hwd. Efsaneya kurdî bûye jêderekê giring yê babetên edebê yên serdem, jiberku babetên efsaneyên kurdî layenên jiyana kesê kurd û hizr û bîrên wî diyardiket.Lewra nivîserên edebî pena biiriye ber efsaneyê û rêjeka zor ya berhemên edebî yên kurdî lijêr karîgerîya efsaneyê hatîne nivîsîn. Her ji serdemê hozana klasîkî ve efsane di hozana kurdîda hatiye bikarînan, herwesa di edebê nûxazîda bi şêweyekê berçav babetên efsaneyî hatîne bikarînan bi taybetî di hozanê da, ewjî bo meremên ciyawaz.

### 1. Babetê Vekolînê

Di vê vekolînêda babetên efsaneyê di hozanên grûpa Nûkirin Her û Herhatine vekolîn û hozanên Hizirvan Ebdulla wek nimûne hatîne destinîşankirin, çawanîya bikarînana wî boefsaneyê û merema bikarînanaefsaneyê hatiye diyarkirin.

### 2. Giringîya Vekolînê

Giringîya vê vekolînê di wê çendêda diyardibît ku giringîyê didete layenê kartêkirina efsaneyê diwarên edebî da, her çend dibît berî nike vekolîn li ser efsaneyê û regezên wê hatibine encamdan, lê belê ev vekolîne bikarînana efsaneyê di hozanê da didete diyarkirin û kartêkirina wê li ser hozana nûxaz, ji ber ku babetê efsaneyê pişkeka here mezin ji naveroka hozana nûxaz bixwe ve digirît.

### 3. Armanca vekolînê

Armanc ji vê vekolînêew e kugiringîdanebi hozana nûxaza devera Behdînan, û dest nîşankirina rolê efsaneyê di avakirina babetê hozana nûxwazda.

4. **Sînorên Vekolînê**

Dîwana *Hindek Ji We û Hemû Ji Min* ku ji dû bergan pêk dihêt, ku hemî berhemê hozanê yê hozanvan Hizirvan Ebdullayî bixwe digirît her ji yekem hozan binavê *Werîs* ku li havîna sala 1979an nivîsaye û heta derçûnaberhemê wî li sala 2009an, anku berhemê30 salan bûye keresteyê vê vekolînê ku keftiye di warê praktîzekirinê da, ewjî bo diyarkirina efsaneyê û merema bikarînana wê dinav evê berhemê da.

5. **Pirsgirêkên (Arîşên) Vekolînê**

Bêgoman her vekolerek li demê encamdana vekolînekê, tûşî çendîn astengan dibît, ji wan astengên beramber vê vekolînê peydabûyîn ev in: kêmîya jêderên li ser efsaneyêbi zimanê Kurdîdi pirtûkxana Kurdî da; jibo çareserkirina vê arîşê vekolerî penabiriye ber jêderên bizimanê Erebî herçende zehmeteka zor ji bo wergêrana wan bo ser zimanê Kurdî biriye.

6. **Rêbaza Vekolînê**

Ev vekolîne hatîye encamdan lidûv rêbaza Wesfî – Şîrovekarî. Ji ber ku me pênaseyên efsaneyê dayîne, cureyên wê senifandine û li ser hozanên hozanvanekî tetbîq kirine, li gorî ev rêbaze gelek guncav e jib o vê xebata me.

7. **Peykerê Vekolînê**

Ev vekolîne dabeş dibîte ser sê beşan:

**Beşa Yekem:**Ji serenavê Têgeh û Pênaseyên Efsaneyêye pêk dihêt.Têgehê Efsaneyê, Zaravê Efsaneyê, Pênaseyên Efsaneyê, Peywendîya Efsaneyêbi babet û warên cuda cuda Mêjû û Serhildana Efsaneyê, Naveroka Efsaneyê, Curên Efsaneyê, Dabeşkirina Efsaneyê, Regezên Efsaneyê, Efsaneya Kurdî, Efsane û Hozan, Efsane Di nav Şî'ra Kurdî da bi berfirehî hatine nasandin.

**Beşa Duyem:**Ji serenavê Serhildana GrûpaNûkirin Her û Her liBehdînan pêk dihêt.Babetên wekî Grûpa Nûkirin Her û Her, Navkirina GrûpaNûkirinHer û Her, Hizra Danan û pêk înana Grûpa NûkirinHer û Her, Egerên Pêkînana GrûpaNûkirinHer û Her, Armancên GrûpaNûkirinHer û Her, Kar û Çalakiyên Grûpê, Nebûna Beyannameyê, Ciyawazya GrûpaNûkirin Her û Her di gel

Grûpan Nûxaz ên Cîhanî, Egerên Lawazî û Nemana Grûpê, Jiyannama Endamên GrûpaNûkirin Her û Her hatine vekolîn û vegotin.

**Beşa Sêyem:**Ev beş layenê praktîzekirinê bi xweve digirît û babetê Diyarkirin û Şirovekirina Efsaneyê di Hozanên Hizirvan Ebdullayî dabi xweve digirît.

Li dûmahîkê encamên ku di vê vekolînê da em gehiştînê hatîne destnîşankirin û li dûvda lîsteya jêderan û kurtiyek li ser naveroka vekolînê bi zimanên kurdî, turkî, erebî, ingilîzî hatine dayîn.

# BEŞA YEKEM

## 1. Têgeh û Pênaseyên Efsaneyê

### 1.1.Têgeha Efsaneyê:

Efsane yek ji kevintirîn berhema edebî ya mirovayetiyê dihête hejmartin, pitiriya zana û feylesofan efsanebi zanista mirovê destpêkê dihejmêrin. Ji wan zanayan Kunt Spencer û Tillrum wisa dibêjin: "zanist her zanist e xweeger yê kevin bît, lewra zanist her hebûye, anku efsane zanistê ji zanistên destpêkî hatiye."[1]Çunkî digel peydabûna mirovî li ser vê gerdûnê efsanejî digel da peyda bûye. "Efsane her di kevin da jêderekê sereke ye ji bo vekolîna liser miletan û komelgehan, herwesa ji bo şirovekirina dîtina wan derbareyê kevnî, komelgeh û ayînan, û zanîna hizrên wan derbareyê kêşên serekî û rudanên siruştî"[2], efsane "berhemêkî mêşkî, yan lêkdanewey mirovî ew serdemeye ku yek car bê desthilat buwe beramber bew rûdawe siruştîyekan we bê tuwana buwe le lêkdanewe ew diyarde û rûdawe siruştîyan da bûye naçar buwe (weku wutman) lerêgay efsanewe hestî derûnî xwey hilbjêrê ta aram bigirê le gerdûn û siruştêkda ke ew betirsewe tiya ejî, kewate her efsaneş bu ke xwedawendî le mêşkî mirovda dirustîkird, weku xwawendî şer, aştî, behar, ciwanî hwd[3]. Mirovê seretayî jibo parastina jiyana xwe "hendê rêwresmê aynî damezranduwe behuy ew rêwresmanewe wîstuyetî peywendî legel hêzekanî siruştda dirust bikat û karîyan têbikat. Le serma û brsêtî û mirdin û ne xweşî biyan parêzît efsane be şêweyekî giştî peywendî nêwan mirov û xwawendekan, mirov û diyardekanî siruşt nîşandedat pûxte mêjûyîbirway mirove û seretakanî bûnman degêrêtewe zorbeyan weku hekayetêkî pîroz, kirdewey xwawendekan degêrinewe"[4], bê goman mirovên destpêkê demê şirovekirinên xwe li ser diyardeyên siruştî û gerdûnî danan, ev şirovekirine li ser binemaya zanistî nebûn, belê hêdî hêdî piştî belavbûna hizrên berbelav û bûne wek jêderên sereke ji bo dahênana hunerî û edebî ya mirovan û bûne destpêka şaristaniyeta mirovan ku dibîte beşekê herî girîng ê edebiyata folklorî ku heta niha bi hizaran vekolîn li ser hatîne encamdan û bûye jêderekê giring bo xwendina felsefe û aynî û bîrdoziya miletên kevin, lewra giringî zor pê hatiye dan ji layê gelek vekoler û pisporan ve û çendîn pênaseyên cuda cuda bu efsaneyê hatîne kirin, efsane evro bûye yek jiwan îdîyomên

---

[1] Alîksî r.wesîf, Felsefet Al-Astore, Tercume: Minzir Hilum, T1, Dar Al-Hiwar lil- Neşir wel Tewzi', Al-Laziqiye: 2005, r. 53 – 45.

[2] Mohamed Ecînet, Mawsua Asatir Al-Arab An Alcahilye wa Dalalatuha, T1, Dar Al-Farrabî, Beyrut: 1994, r.13.

[3] Kameran Mukrî, Edebî Fulikluriyê Kurdî, beşî yekem, çapxaney Zankoya Sellaheddîn, Hewlêr, 1984, r.40.

[4] Necim Elwenî, Efsane û Pendî Komîdî Galte amêzî Kurdî, Dezgay Muzîk û Kelepurî Kurd, Hewlêr: 2007, r. 10.

giring yên edebî, jiber vê giringiyê bûye cihê serincrakêşana gelek ji zana û pisporan. Didestpêkê da giringî ya pêdivî pê nehatiye dan û danpêdan pê nehatiye kirin[5], derbareyê vê çendê Malînoviskî ku danerê xwendingeha karînî dibêjît: “efsane qonaxa cadûyî û sêhrbendiyê ye, ne qonaxa paşikeftina hizrî ye”[6], çunkî “efsane di jiyana civakanda ya berdewam bû, lê herdem ramaneke nebaş dida, ewjî ku hevdijî mentiqa mirovî bû. Li her du sedên hevdê û hejdê da ku berî ronakbîrî dihatin zanîn, efsaneyê ramaneka negetîf hebû, endîşe û aşopek bû, tiştê nedirust û nezanistî û nefelsefî bû”[7]. Efsane di navbera ramaneka baş û nebaş dibîte du hêz: “1-hêza baş ew hêze ye be bê tirs le jêr tîşkî roj da dejî 2- hêzî xirape ew hêzeye eme ke le tarêkîda dejî û le tîşkî roj detirsê”[8], efsane “rûdanên waq'î ne, yên mîtafîzîkî ku ne diberaqil bin, belê rastîyeka waq'î heye û bi dirustahî hatîye rûdan.”[9]

Ev hizir û bîre diserdemê kevinda bû, lê diserdemê nû da ev hizir û bîre hatine guhertin jixewin û xeyalan berev zanistî ve çûn. Li dûmahiya sedê nozdê efsaneyêbiyavekê baştir dizanistên hemecurda bixwe vedît, weku zanistên sosyolojî, psîkolojî, antropolojî, ziman, ayîn, folklore, felsefe, mêjû û ede ku ji encamê vekolînên van hemiyan zanistek jê peydabû ku bi navê mîtolojî dihête binavkirin[10], disedê bîstê da “mêjûnûsan hestiyan be we kird ke efsane rengdanewey diyarde komelayetîye[11], li sedê bîstê piştî mêjûnûsan vekolîn li ser efsaneyê kirîn çar serdem yan qonax dest nîşankirin ji bo destpêka efsaneyê:[12]

1 – Serdemî palewanyetî yonanî kon ke le xakî yonan le hezarey duwemî pêş zayîn serî hildawe.

2 – Serdemî palewanyetî hîndî ke mêjuwe direwşawekey dway serdemî yonanî kon be nîzîkey sedeyek dekewê.

3 – Serdemî nyotronî, ke le sedey çwar ta sedey şeş zayînî zorbey bakurî ewrupa girtewe.

---

[5] Şivan Cercîs Ebdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê di çiwar romanên devera Behdînanda, nama masterê, Koleja Adabê, Zankoya Dihok, 2012, r.5.
[6] Arif Hîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, govara Peyv, j.14-15, r.17.
[7] Şivan Cercîs Ebdulrahman, hb., r.5.
[8]Kerîm Şareza, Efsane le Şî'rî Hawçerxî Kurdîda, çapî yekem, berêweberayetî çapxaney roşenbîrî, Hewlêr, 2005, r.7.
[9]Xalîl Hena Tadiris, Ahla Al-Asatir Al-Alemiye, Dar Kîtabina r.îl Neşir, Beyrut: D.T, r.5.
[10] Şivan Cercîs Ebdulrahman, hc.
[11] Ranya Semara, Efsane û Edeb, w: Hisîn Sabîr Alî, çapxaney Şehab, Hewlêr, 2008, r.11.
[12] Ranya Semara, hc.

4 – Serdemî palewanyetî Somerî, ye kêke le kontrîn serdemekan, em serdemeş, bo çiwarekî hezarey sêyemî pêş zayîn degerêtewe.

Bê goman efsane “rewangeyekî mîtafîzîqî ye û cure derbirînêke le pîşandanî bîrî berey xwa perstan û xelkê reş û rût û sade û dûremekî û awat û xewnî rujaneyane, efsane şan be şanî bîrubawer û aynî şit û diyardey siruştî ... Be kurtî efsane qonaxêkî giringî seretayî bîrkirdinewey felsefî mirov denwênê – le her serdem û qonaxêkda.”[13]

### 1.2.Zaravê Efsaneyê

Zaravê efsaneyê bîr û boçûnên ciyawaz li ser hene, her ji kevinda her peyveka giring çend zarav bo dihêne danan da ku erkê wê pê bihête nasîn.Her ji kevinda babetê efsaneyê bûye cihê giringî pêdanê lidev vekoleran çunkî efsane yek ji kevintrîn berhemên edebî yê mirovayetî ye.Piştî pêşikeftina zanistî û berfirehbûna vekolînan û jêkcudabûna pisporiyên ciyawaz her liqekê zanistî zaravên taybet bi xwe ve girtin, ji ber hindê pitir pîte bi her zanistekî bihête dan û cuda cuda ûbêyî ku têkelî çi zanist û babetekê dî bît, di babetê efsaneyêde jî çendîn zaravên cuda cuda ji boefsaneyê hatîne danan.

Lê jêderê herî girîng û sereke bo cihê giringî pêdana efsaneyê û peyva efsaneyê têda hatibît Qur’ana Pîroze ku peyva efsane neh (9) caran di Qur’ana Pîrozda hatiye.Xwedayê mezin dibêjît: [يَقولُ الذين كَفَرُوا إِنْ هَذا إِلاَّ أَساطيِرُ الأَوَّلينَ][14], bi wateya “ewên kafir dibêjin eve ji çîvanokên berê pêvetir nînin”[15], peyva [أَساطيِرُ الأَوَّلينَ] gelek ji zana û ravekerên misilmanan bi tiştê xwerafat û direw û nerast pênase diken. İmam Al-Faxir Al-Razî derbareyê peyva [أَساطيِرُ الأَوَّلينَ ] dibêjît ku “ hîç zanist û rewanî û wirdî û rastî yekî têda nîye”[16], her dîsan Zemeşxerîjî amajêbivê çendê diket û dibêjît “efsane bo tiştê bê wata û direw û xwerafî dihêt gotin.”[17]

Dizimanê kurdî da “le ferhengî Kurdistanda efsane be watay çîrok û be serhatî û piro poç hatiwe.”[18]Efsane dizimanê kurdîda anku di çîrokên dewrê berê de lihemberî peyva *estore* ya erebî ye, anku çîrokeke yan hîkayeteke ji tiştên aşopî û tîtalên mîlî pêk hatîye.nivîserêereb Wedî' Beşur

---

[13] Ehmed Zerdeşt, Kawe û Newroz ... Efsane û bîrî nwê, dezgay rewşenbîrî û blawkirdnîwey kurdî, Silêmanî: 1999, r.16.

[14] Qur’ana Kerîm, Sure Al-Aniam, Ayet: 30.

[15] Şivan Cercîs Ebdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.8.

[16]Mewlud İbrahîm Hesen, Geran Be diway Nemri le Felsefey Kurdi û Farsi da, r.10.

[17] Şivan Cercîs Ebdulrahman, hc.

[18]Bêrîvan Samed Hewêz, Rehendî Efsaneyî le Şî’rekanî Newzad Rafet da, r.6.

amajêbi hindê didet ku dibît peyva *estore*ya erebî ji peyva *stora* ya grekî hatibîte wergirtinku bi wateya hîkayetên nerast jibo xweşiya mirovî dihêtine gotin ku hevdije ligel rastiyê. Boçûna hindek vekolerên dî yên ereb ewe ku peyva efsane jipeyva *sêrtu – serto* ya zimanê suriyankî hatiye wergirtin, bi wateya *rêz*dihêtin.Lê boçûneka dîtir heye sebaret peyva efsaneyê*(estore)* dibît ji navê xwedawenda Babilî *Eştar* hatibîte veguhastin û bûye bineret bo çîrokên pîroz (*İstar – İsatir*).Şiroveyê wan bo vê çendê ew e ku peyva *storiy*ya ingilîzî jî ji*Eştar* hatiye wergirtin û peyva *historiy*pêkhatiye jihindek rûdanan ku behsê Eştarê diken[19].

Lê belênivîserê Îranî Eqîlî Mehmûd Bextiyarî pêçewaneyê hizr û bîrên erebane derbareyê peyva zaravê efsaneyê yên ku ereban behs kirîn, dibêjît: “wişey*estore*be pêçewaney ewey ke ferheng nûsan, nûsîyane! Erebî niye, belke rîşeyekî ariyayî heye, le sanskirîtî (sutra) be manay dastan û zortir le nusînekanî budalîr bekar dê.”[20] Ev nivîserê Îranî peyva *estore*yê bo ereban nahejmêrît û dibêjît: “wişey efsane be nawî – bekarhatuwe, wişey efsane wişeyekî kunî kurdî ye”[21], li dev farisan “ziyatir zarawey *estore*le beramber mîs da denêt.”[22]

### 1.3.Pênaseyên Efsaneyê

Efsane yek ji wan babetên gelek aloz û çir û pir ku bûye cihê giringîpêdana vekoler, zanayan û pisporan, lewra her kesê li dûv nêrîn û dîtina xwe efsane şirovekiriye û heta nike neşiyane pênaseke yek layen yan yekgirtî boefsaneyêbiken. Çendîn bîr û boçûnên cuda li ser efsaneyê hene. Sebaret pênase û boçûnên ciyawaz li ser efsaneyê dizivrît bo “wan metod, rêbaz û qutabxanan bi nêrîneka cuda û li dûv taybetmendî û pisporiya xwe vekolîn li ser kiriye. Lewra çendîn pênaseyên ciyawaz boefsaneyê peydabûyîne ku her yek li dûv goşenîgaha pisporan hatiye ravekirin.”[23]Wesa xuyadibît ku efsane di mejiyê her kesekî da bişêweyekê cuda derbirînê jiefsaneyêdiketû hizir û dîtina kesekî boefsaneyê ji kesekê dîtir cudaye.

Divî warîda hindek vekoler amajê bi hindê diden ku bîr ûboçûnên cuda li ser siruştê efsaneyê hene.Lê ji ber wê alozya babetê efsaneyê da heyî[24], Augistin dibêjît: “efsane çiye? Min zor çak dezanim çiye, bew mercey kes lêm nepirsê, belam eger pirsîyan û wîstim welam

---

[19] Şivan Cercîs Ebdulrahman,Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.7.
[20]Mewlud İbrahîm Hesen, Geran Be diway Nemri le Felsefey Kurdi û Farsi da, rr.9 - 10.
[21] Mewlud İbrahîm Hesen,hb. r.11.
[22]Mewlud İbrahîm Hesen, hb. r.10
[23]Mewlud İbrahîm Hesen, r.9.
[24]Mewlud İbrahîm Hesen, hc.

bidemewe, zemanim têk degîrê.[25]Augistin wesabo me diyar diket ku efsane babetekê gelek çir û pir û aloze ku dinav mêşkê her kesekî da, efsaneka baş ya hey lê di şêwazê praktîzekirinê û derbirînê aloz dibît.

Hinek pênaseyên efsaneyê:

Platon dibêjît: "Efsane heqayetêkî çîrok amêze û palewanekanîş merc niye xwedawend dibin hendê car kesanî asayî bûyne."[26]

Anedodidibêjît: "Efsane komeka çîrokên seyire, yên hatîne wergirtin ji kevintirîn qonaxên jiyana mirovayetiyê ku ev çîrok pirin ji nimûneyên seyir ku tê da aşop û diyardeyên siruştî têkel dibin."[27]

Funtî dibêjît: "Efsane çîrokên mecazîne jiwan çîrok û bûyer û rûdanên ji dewrê berê me çêdibin û efsane ne mêjûye, belkî mêjûya siruştî ye."[28]

Diferhenga Paul Rubat da efsane wesa tête pênasekirin: "Hîkayeteka  xwerafî ye, herdem danerê wê civake û palewanê wê kesayetiyên radebederin wekî hêmayên siruştîne û derbirînê jibar û doxekê diyarkirî yê jiyanê diket."[29]

Bohîmîros yek ji feylesfên Yewnanî ye ku derbareyê pênasa efsaneyêdibêjît: "Efsane tenya hendê qisey xeyalîye bo ew karesatane ke le mêjû rûy dawe."[30]

Levi Straussdibêjît ku "ew pirsyareye kewa pêwîst dekat welamî nebê."[31]

Şivan Cercîs Ebdulrahman sebaret efsaneyêdibêjît: "Efsane çîrokeke yan çîvanokeke behsêhindek rûdanên seyir diketî çi rast bin yan xeyalî, ji encamê endîşê mirovê berê hatiye dirust kirin."[32]

---

[25]Mewlud İbrahîm Hesen, Berew Efsanenasî Kurdî, çapî yekem, Serdem, Silêmanî 2015, r.16.
[26] PîrDawidMexmûrî, Ferhengî Efsane Cîhanîyekan, gouvara Asoy Folklorî, j.48, 2010, r.73.
[27] Marof MohamedAlî, Efsane û hozan, Govara Peyv, j.13)., çapxana Hawar, 1996, r.62.
[28] K.K. Ranfîn, Al-Astore, wer: Cafer Sadiq Al-XAlîlî, Menşurat Awidat, Beyrut1981,  r.23.
[29] Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.9.
[30]ElaeddînîSeccadî, Mêjûy Edebî Kurdî Efsane, r.120.
[31]Mewlud İbrahîmHesen, Geran Be diway Nemri le  Felsefey Kurdi û Farsi da, r.22.

Jivan pênaseyan bo me diyardibît ku efsane komeka serhatî û çîrokên kevinin, çi waq'î bin yan xwerafatbin, efsaneyê aşop û xeyal digel rastîyê têkel dikin. Efsane milkê kesê nine, ji kesekî bo kesekî hatîye veguhastin; "efsane ne diyardeyeka takekesî ye, yan jilayê komeka mirovan hatîye dirustkirin, belkîberhemê miletekîye yan çend miletan ku xwedanê wê nahête nasîn."[33]

Hindek zana ûvekoleran li demê pênasekirina efsaneyê wêbi aynî ve girêdiden, ew jî wesa ne:

Funkdibêjît:"Efsane çîrokeke kupehlewanên wê jixwedê yan jî nîv xwedêyan pêk dihêtin."[34]

Vekolera Frensî Elyadidi pirtûka xwe ya bi nav ûnîşan, jilayenênefsaneyê wesa dibêjît: "Efsane behsê çîrokeka pîrozva aynî diket, ku di serdemê destpêkê da, birêya bûnewerên radeberên siruştî rûdaye"[35], herwesa "efsane serbordeyeke pîroz û asmanî degêrêtewe, pêşanderî rûdawêke kele zemenî destpêk, zemenî pir nehênî seretay hemû şitêk rûydawe.[36]

Tomas Prlfînşdikitêba xweda ya binavê (mîtolojiya Yunan û Roma)dibêjît: " efsane aynî ye piranya çîrokên efsanan jiİncîlê û Tewratê hatîne wergirtin"[37].

Cuzêf Funtinusdibêjît ku "efsane çîrokeke xwedan pilaneka diyarkirî ye û rolekê giring dibehskirina wan deng û behsanda digêrît ku girêdayî ne birêwûresmên ayîrdeyî û cejnanve.[38]

Eleksander Girapdibêjît: "efsane, gêranewe yan çîrokêke ke xwedawendekan têda rolî serekî de bînin."[39]

Eve çendîn pênase û bîr û boçûnên ciyawaz jilayê zana û vekoleran ve li ser efsaneyême xweyakirinkuher kesekî li dûv dîtin û hizra xwe efsane pênasekiriye, heta nike pênaseyeka yekgirtî bu efsaneyê peyda nebûye. Erinist Tayser amaje bi vê babetî daye sebaret negehiştina vekoleran bi pênaseyeka yekgirtî boefsaneyêû wesadibêjît: "kêmasî dikerestê efsaneyê da nîne,

---

[32] Şivan CercîsEbdulrahman, hc.

[33]Xalîl HenaTadiris,, Hilî Al-Asatir Al-Alemiye, Dar Kitabina lil neşir, Beyrut 2013, r.7.

[34] ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, Govara Peyv, j.14-15., r.15.

[35] Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.11.

[36] Ferhad EzîzXoşnaw, Afrandin û Mirdin le efsaney Kurdîda, bepêy Avêsta û deqe pehlewîyekan, çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr 2013, rr.15 – 16.

[37] ArifHîto,Nejad û Peydabûna Efsaneyê, hb. r.16.

[38] Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.11.

[39] Heman Jêder, r.16.

belkî di zorî û jêder û kerestê wê da ye, çunkî her zanayekî yan feylesofekî li dûv dîtin û hizrên xwe vekolîn li ser kirîne"[40], wate di vê pênasê da diyar dibît ku efsane babeteke wesa ye ku hemî zana û her vekolerekî lidûv têgehiştin û hizra xwe efsane şîrovekiriye, herwesa jiber ciyawaziya zana û vekoleran derbareyê pênaseyên efsaneyêKîrkdibêjît: "zor ya bizehmete em bişên pênaseyekê bo efsaneyêbiken ku bibîte pîverekî giştî jibo wê; çunkî çendîn curên cuda yêefsaneyê hene, çi jilayê pêkhata morfolojî yan jî jilayê erkê wê yê civakî ve."[41] Wate di vê boçûnê da efsane babetekê çir û pir û aloze û efsane digel hemî babet û zanistan dihêt û diguncît digel hemî bûyerên jiyanê û her miletekî mêjûya efsaneya xwe ya hey, lewra her miletek yan her zana û vekolerekî dîtin,hizir û pênaseya wî derbareyêefsaneyê ya ciyawaze ji zana û vekolerekê dî.

### 1.4.Peywendîya EfsaneyêbiBabet û Warên Cuda Cuda ve

#### 1.4.1. Efsane û ziman:

Hindek vekoler wesa hizirdiken ku efsane nesaxîyeka zimanvanî ye[42], zanayê warê zimanewanî Maz Mûller dibêjît ku "efsane dimêşkê mirovî da nesaxiyeka zimanvanîye.Mirovê berê bi efsaneyan ve diaxivît nebi zimanî, çunkî li wî serdemî hêj zimanekê puxteyê axaftinê peydanebûbû, lewra demê diviyan hezên xwe yên kesokî jibo derbirîna hestan şirove biken efsane bikardihênan."[43]Di vê pênaseya Max Mûllerî da diyardibît ku digel hebûn û peydabûna mirovî efsane peydabûye, ku li destpêka hebûna mirovî zimanekê puxteyî nebû kumirov derbirînê jihizirên xwe biket, anku bizimanekê îşaretî yan efsaneyî derbirînê ji her tiştekî dikirin kewate efsane kevintirîn berhemê edebye ku berî zimanî jî hebûye, "efsane zimanê jiyana rasteqîn e."[44]

Dû zanayên dîtir cextê liser vê boçûnê diken û dibêjin ku efsane berî her tiştekê hebûye. Zana Claude LeviStrauss, zanayêwarêantropolojî û mêjûnivîs Domînîlî wesa dibêjin "le ser ewe kok in ku efsane le bêş hemû şitêkda le warî ziman wa xwetinewe (logs) bûye"[45], "çunkî li wî

---

[40]Şivan CercîsEbdulrahman, hb.r.9.
[41] Şivan CercîsEbdulrahman, hc.
[42]ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, Govara Peyv, j.14-15.r.17.
[43] Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.12.
[44] NecimElwenî, Efsane û Pendî Komîdî Gayte amêzî Kurdî, r.10.
[45]RanyaSemaraû Hisên Sabîr Alî, Efsane û edeb, çapxaney Şehab, Hewlêr, 2008, r.4.

serdemî zimanekê puxtê axaftinê hêj peyda nebibû, ji ber hindê demê diviyan hezên xwe yên kesokî şirove biken, ji bilî efsaneyê çi ziman nebûn ji bo derbirîna hestan."[46]

Bo nimûne digel hilatina rojê ûbelavbûna tîrojkan, mirovî wesa hizirdikir ku ev tîrojk tiliyên Xwedêne ku dikevine ser erdî lewma kes nikarît wanbigirît[47], li goreyî zanayanev qonaxeke nebêşikeftî ye.Piştî mirovî şiyay zimanekî puxt peydabiket ûçend zanist ûzanîn pêdabiçît û belavbît, efsaneyê çi giringiya xwenamînît.

### 1.4.2. Efsane û Derûn

Danerê xwendingeha şirovekirina derûnî Sigmund Freud wesahizirdiket ku efsane wek xewnê ye, çewa xewn xwedîarîşênmirovî yên civakî û derûnî ye, ku vîn û hezên mirovî yên veşartî bi mînakên perestgeha derdikevin, herwesa efsane jî livê dere dihête nasîn ku ramaneka veşartî ya mijdar û tiştê cevengên têhilkêşayî ne. Ev cevenge jî bigoreyîbîrdoza Freudî mînakeke dî ya arîşên seksê ye kumirov dihişê ya xweda divedişêrin. Lê Jung ê danerê xwendingeha derûnnasî li dijî bîr û boçunên Freudîye. Wî şîrovekirineka dî heye boefsaneyê.Jung wesa hizirdiket ku efsane ji aliyê derûnî ve (xewn) bîrîneyeke jibopeydakirina hevsengîyekê dinavberahêzên hevrik dinax û derûnê mirovî da û çi hevbendî digel hez ûviyanên sêksî yên veşartî nine.[48] Bi dîtina me ciyawazî dinavbera wan herdu xwendingehna da heye lê herdu wesa hizirdiken ku efsane wek nexweşiyeka hizrî ya derûnî ye. Derbareyê vê mijarê da Şivan Cercîs wesa dibêjît: "zanayên xwendingeha derûnî efsaneyêbiberhemê ne hişyariyê didanin ku ya pire ji komeka mezin ya hêma û xerîzên kipkirî yên lidef mirovî[49], lê "efsane wekî xewnê ye, cîhaneka mijarî birêka vê cîhanê wan heza derdixît."[50]

### 1.4.3. Efsane û Cadûyî

Danerê xwendingeha erkî Malinovskiwesahizirdiket ku efsane qonaxa cadûyî û sêrbendiyê ye.[51]Di vê pênasa Malinovski da bo me diyardibît ku qonaxa cadû ya hevbende digel qonaxa hizrî û civakî ûpeywendî biefsaneyê ve heye.Mewlud İbrahîmHesendibêjît: "cadû wek

---

[46] ArifHîto, hc.
[47] Şivan CercîsEbdulrahman, hc.
[48]ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, Govara Peyv, j.14-15.r.17.
[49] Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.12.
[50] Şivan CercîsEbdulrahman, hc.
[51] ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, Govara Peyv, j.14-15., r.17.

hizrêkî nasraw le mêjûy mirovayetîda, ewîş rêgayeke û hêzêke efsane penay bu debat û palewan sudî lê debînê.”[52]

James Frazer derbareyê efsane û cadûgeriyê dibêjît: “efsane peywendîbebarî qonaxî sîhrî benî adem heye, belay ew efsane le qonaxe berayîyekanda hawşanî sihre û bepêy guranî barî têgeyiştin û pêşkewtinî sîhrîş çemkî efsane berew pêş deçê.”[53]

### 1.4.4. Efsane û Hizir

Efsane xwedîhizra her mirovekî ye, gelek caran her takekesek digel hizir û bîrên xwe dikevîte milmilanê û dan standin û gelek babetên efsaneyî li dor mêşkê wî dizivirin.Endor Lancderbarey efsaneyê û hizirê dibêjît: “herbeşî ye ku mirovek rojekê beramber siruştî rawestîn û pisyarket. Kîme ez?Ji kû ve hatîme? Çewa ev dinyaye peyda bûye? Bo çî ev tiştên heyîn weku xwe hatîne çêkirin ne bi awayekê dî?”[54]

Ev pisyar û danûstandine digel xwe bixwedibine destpêka hizirkirina qonaxên mirovan. Arif Hîtodibêjît ku “bi vê çendê em dikarîn bêjîn ku efsane xwedîkaqonaxa yekê ya hizirkirineka fîlosofî ye beramber xweristî û kewnî û hevbendiya van her du tiştan bi jiyana mirovî ve ser ruyê 'erdî.”[55]

### 1.4.5. Efsane û Huner

Her ji destpêka peydabûna mirovan li ser rûyê 'erdî, babetê efsane û huner têkelî hev bûyîne û pêk ve serhildane û geşekiriye û peywendîyeka bê sinor digelêk da heye.Her ji destpêka hebûnê têkelîyeka yekcar dinavbera efsaneyê û hunerî da ya peydabûye.Vê boçunê kevintirîn nexş û paşmayên Grekî yan fîrewnan û Hinda Budî pesend diken.Zanayan jî danê pê diden.[56]Bo nimûne şêweyê dirustkirina hunerê ehramatên mêrî ku heta nike vekolîn li ser dihêne kirin daku bizanin şêweyê dirustbûna wî ku çendîn hizir û bîr û boçûnên cuda cuda li ser hene.Herwesa şûnwarên Misrî û Grekîya û Aşurî û Babilyan liser dîwaran yan tabloyan bi nexşe û nîgar û wêne dirust kirîne, ku bûye cihê giringî pê dana vekoleran bi vî hunerî.

---

[52]Mewlud İbrahîmHesen, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.34.
[53]Bêrîvan SamedHewêz, Rehendî Efsaneyî le Şî’rekanî Newzad Rafetda, r.10.
[54] ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, r. 17.
[55] ArifHîto, hc.
[56]Efsane û HunerAvîvan, Kovara Peyv, j.129 – 130, Çiriya yekê û duwê, 2002, r.54.

### 1.4.6. Efsane û Felsefe

Me li despêkê amaje pêkir ku efsane digelqonaxa despêka hebûna mirovî liser rûyê vî gerdûnî ya peydabûye, anku demê mirov peydabûyîn li wî demî efsane jî peydabû.Vekoleran jî amaje bivê çendê daye, herwesa felsefe jî dizivrît bo despêkapeydabûna qonaxa mirovî liser gerdunî, ku wate demê qonaxa mirovan peydabûyîdigel hindê felsefe û efsane jî peydabûn. Efsane jilayêHîkl ve hatiye pênasekirin, ew demê efsaneyêbi felsefê ve girêdidet û dibêjît "efsane rêgayeke le rêgayekanî felsefekarê."[57]Wate efsaneyê peywendî digel felsefê heye ûherdu dizivirinboqonaxa despêka jiyanê ûqonaxa kevin. MewludÎbrahîmHesendibêjît: "efsane hewlî yekemînhizre le mîjûy mirovayetî, bo ewey binemayekî felsefî dabinê ta mirov lew sergeranyeynezanînî nehênî siruştî diyardekat rizgarbibê"[58], çunkî felsefe wekî efsaneyê jidayik bibû. Zana ûvekoler jibopeydabûn ûserhildana mêjûya felsefeyê ûefsaneyê dizivirînin bo qonaxa despêka mirovî; "be kurtî efsane qonaxêkî giringî seretayî bîrkirdinewey felsefî mirov denwênê le her serdem û qonaxêkda."[59]

D. İzedidîn Mustefa Resül derbareyö felsefeyê dibêjît: "eger le kuncî felsefewe birwanîne detwanîn be curêkî hoşyarî komelayetî dabinîn, herwek be hewildanêkî seretayî mirov dezanrê bo ewey le cîhan bigat û binasît."[60]

### 1.4.7. Efsane û Ayîn

Ji encama wan pênaseyan û boçûnandiyardibît ku efsane û ayîn pêkve digirêdayî ne û berhemê yek diyardeyamirovayetiyê ne, û herwesa têkelî yekbûyîne. Efsane û ayîn, "peywendiyekî du qûlî mêjûyîyan le gel yektirîda heye û weha lenaw yekda tewawnetewe ke zor car her beyek dadenirên."[61]Derbarey efsane û aynî feylesofê Elmanî Erinêst Kasir cextê li ser wê çendê diket"ke ciyawazîyekî rîşeyî le nêwan fikirî efsaneyî û aynî da niye"[62] anku çi ciyawaziyên binyatî dinavbera aynî û efsaneyêda nînin anku dişiyanbêjin efsane û ayîn verêja yek hizira mirovayetiyê ne.

---

[57]Mewlud İbrahîmHesen, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.292.
[58]Mewlud İbrahîmHesen, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.293.
[59] EhmedZerdeşt, Kawe û Newroz ... Efsane û bîrî nwê, r.16.
[60]İzzeddîn MistefaResul, Edebê fulkLorî kurdî r.êkolînewe, Aras, Hewlêr 2010, r.17.
[61] Ferhad EzîzXoşnaw, Efrandin û mirdin le efsaney kurdîda, r.21.
[62] Dilêr DawidFetah, Sembol di romana Rojên Êtûn da ya romannivîs Kovan Sindî, Hewlêr 2016, r.39.

### 1.5.Mêjû û Serhildana Efsaneyê

Sebaret serhildan û mêjûya efsaneyê, her kesekî li dûv vekolîna xwe behs ji mêjûya efsaneyê kiriye û efsane şîrovekiriye, lê boçûnên hemiyan nêzîkî yekin, çunkî efsane babetekî gelek kevne. Wek me li destpêkê amajepêdayî, efsane digel qonaxa destpêka peydabûna mirovî serhildaye, ku wate mêjûya efsaneyê dizivirît bo destpêka hebûna mirovî.Lê neşên bidoristî jimarekê bo mêjûya efsaneyêbidanîn çunkîdem, cih û rûdandiefsaneyê da rasteqîn nînin. Dîsa jî em dişên destpêka peydabûna mêjûya efsaneyêbizivirînîn bo peydabûna destpêka mirovî, eger pirsiyar bikin ji mêjûya efsaneyê kengî û çewa û likû ve peyda bûye? Kesek bi dirustahî nizanît, lê hemî amajê dikene jêderê berê, ewjî ku efsane digelqonaxa destpêka hebûna mirovî peyda bûye.Lêçibelgeyên dî liser mêjûya efsaneyê nînin "zanayên taybetmend diwarê kolturî da neşên bidirustî wî serdemê peydabûnê destinîşan bikin, çunkî efsane dinav wan komelgehanda peyda bûye yên ku xwedan rewşenbîrî û berhemekê zarekî nebûne, wate pêş peydabûna nivîsînê û tomarkirina mêjûyê."[63] Bi gotineke dî mêjûya peydabûna efsaneyê nehatiye diyarkirin û çi rêkeftin li ser nînin, çunkî efsane wek çîrokeka bê nivîser ku demekê dirêj li ser boriye dihête pênasekirin, wate efsane milkê kesekê bitenê nîne da ku mêjûya peydabûna efsaneyêbo me diyar bibît.

"Efsane komeka çîrokane ku bi rêka serzarî dihête veguhastin ji neweyekî bo neweyekê dîtir, ew ji kevintirîn çerxên mirovayetiyê ye"[64] wate, destpêka efsaneyê çi tiştekê tomarkirî nîne bi tenê ji serzarê kesan ya bo me hatiye veguhastin ji kesekî bo kesekê dîtir, ji encamê van veguhastinan bo me ron û aşkira dibît ku efsane dizivirît boberî çerxê xwendin û nivîsînê.Jiber vê çendê efsaneyê mejûyeka tomarkirî nîne lê "efsane mêjûyekî konî heye û degerête bo serdeme seretayyekanî mirov û yekemîn serçawey mirovayetîye bo guzariştkirdin le bîr û bawerekanî."[65]

Efsane yekemîn serçawe û jêdere boqonaxa destpêka jiyana mirovî."Çunkî her lidestpêkê efsane digel jiyana wî ya rojane hebû û kartêkirin li ser wî dikir, qonaxa destpêka peydabûna mirovî, mirovî diviya digerdûnî û diyardên wê yên hemecur bigehît"[66], li qonaxa destpêka peydabûna mirovî teknolojî diastê zanistî nebû ku derbirînê jijiyana xwe ya rojane biket û jiyana

---

[63] Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.15.
[64] EnîsDawid, Al-Astore fî Al-Şeiiri Al-Arabi al-hadis, r.19.
[65] Perîşan XalidSabir, Rehendî efsaneyî le r.awkî kurdewarî da, Nama masterê, Koleja Ziman, Zankoya Selaheddîn, Hewlêr2014 r.81.
[66]NebîleAlbuweyle, fî Al-Qisas Al-Şa'bî, dar Al-Maarif, Al-Qahire, 1977, r.9.

xwe ya rojane bişêweyekê baş û bê tirs û aramî biborînît, lewra hemî dema mirovê berê dinav efsaneyan û xewn û xeyalanda û herwesa dijiyaneka metirsîdarda dijiya. Şivan Cercîs derbareyê ve yekê da dibêjît ku “mirovê berê di hizra xwe da xwedawend afirandîne, ew hêzên kartêkirin liser wî dikir, wan dikirine xwedawend, wesa peyker û peristgehbo danan û aheng û ayirdeyên aynî bo sazkirin.[67]Ji encamê dirustkirina peyker û xwedawendan James Frezer û Edward Taylor dibînîn ku “efsane bi destpêka jiyanê ve girêdayî ye, çunkî li wî demî mirov dinav gelek tiştê sersonhêner û metirsîdar da dijiya , vê çendê kartêkirin liser wî dikir û nedişiya ravekirineka zanistî bidete van diyardeyan ku bişêt aramiya derûnî lidefxwe peyda biket, lewra berev çêkirina efsaneyê ve çû.”[68]Herwesa qonaxa destpêka jiyanamirovî navên siruştî û giyaneweran boxwe danan.Herbert Spencerbehsê vê çendê diket û dibêjît ku “hozekê li kêşwerê Asyayê, ku wan navên siruştî danane ser zarokên xwe,wekî ronahî, spêde, heyv hwd. piştî borîna demekê dirêj liser vê yekê neviyên nû yên wan kesênberê nedîtî, ev navdigel diyardeyan têkel kirîne, bivê çendê ev diyarde bûyîne xwedan ruh, lewra wan hizirdikir ku bapîrên wan – bo nimûne – roj bûn.”[69]

Li ser danana navên siruştî û giyaneweran li ser zarokên xweMax Muller ji pêşengên qutabxaneya efsaneyê yê ûdibêjît: “efsane ji egerê kêmasiyên zimanî peydabûye ku bûye egerê peydabûna tiştekî tak bi çend navekên ciyawaz, herweku navek yê bitenê bo çend tiştekan bikarhênin … Û ji egerê vê çendê têkelbûna navan û tiştan lidev mirovî peyda bû. Ji bo wê yekê diçûn ku xwedawendên ciyawaz bi tenê dîtinên ciyawaz in jibo xwedawendekê tak. Herwesa dîtinên wan bûn ku ewxwedawendê tak bi şêwê cuda diyarbiken.[70]

Jiber vê çendê gelek ji zanayan wesa dibînin ku “efsane wergêranek e bo vegêranahindekrûdanên mêjûyî, ewên destpêka jiyanê peydabûyîn.Bi merema veguhastina serborî û taqîkirinên wan yên jiyanê.”[71]Hindekji zanayên dîtir wesa dibînin ku “mirovê destpêkê bi nêrîneka kûr temaşeya tiştan û siruştê cîhanê dikir,hindekji zanayên dî dibînin ku çend zanist kûrtir biçît û b taybetî zanistê derûnî yê takî di nehêniyên jiyanê û diyarkirina wan, nêzîktir lêdihêt ji cîhana efsaneyê”[72].

---

[67]Şivan CercîsEbdulrahman, hb.r.16.

[68] Şivan CercîsEbdulrahman, hc.

[69]Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê Di Çiwar Romanên Devera Behdînanda, r.15.

[70] EnîsDawid, Al-Astore fî Al-Şa’ri Al-Arabî Al-Hadis, r.35.

[71] Şivan CercîsEbdulrahman,hb., r.17.

[72] EnîsDawid,hb. r.21.

Destpêka jiyana mirovî dibîte destpêka hizirkirinê û hewla zanîn û şirovekirina dewrûberê xwe mirovî pena biriye ber efsaneyêçunkî“temenî efsane û çîrokên milî bête derê temenî ademîzade”[73], wate peydabûna efsaneyêbi destpêka hebûna mirovî vedigerît, “ her ji destpêka jiyanê liser rûyê erdî, mirovî hizirdikir jibotêgehiştin û şîrovekirina dewrûberê xwe, çunkî girêdaneka mukim digeljiyana wî ya rojane da hebû. Jivê yekê em dikarînbêjîn ku mirovî serederî digel siruştê dikir wek tenekê giyandar û hewldana mirovî bû jibo peydakirina hevbendiyekê digel van giyandaran (siruştî) ku tamê didete wê jiyana pê dijît û bo dijît. Jiber ku mirovî baweriyeka mukim bi hêza siruştî hebû jibo xweşkirin û nexweşkirina jiyana wî, lewra di hizra xwe da evhêzên siruştî dikirine xwedê û pit û peyker bo danan û peristgehbo avadikirin û aheng û ayirdeyên ayinî bo dikirin, çunkîdîn, oldarî yan bîrûbawerên xelkê şengistê werara hizirkirinê ye û her jibîrûbaweran efsane peydabûye”[74].

Sebaret peydabûna efsaneyê jibîrûbawer û hizira mirovê berê ye. (Esil - Estore) nejadê efsaneyêTomas Bulfînşdikitêba xweda yabinavê *Mîtulujiya Yunan û Roma*peydabûn û nejadê efsaneyê şîrovediket û wan dikete çar xal[75]:

1. Aynî ye: Piranya çîrokên efsanan ji încîlê û tewratê hatîne wergirtin.
2. Dîrokî ye:Efsanehindekbûyerên rastin di dîrokê da hatîn û xelkê hez jê kirîye. Herwesa digel wextê da tiştên seyr lê hatîne zêdekirin ji bo xweşiyê û tamwergirtinê.
3. Mecazî ye:Hemî efsane di mînakên xwe yên oldarî,feylesofî û dîrokîda bi tene hindekmecaza bi ezmanî hatîne xuyakirin.

4. Xwerstî ye: Hindektuxmên kewnî xuyadiket, wek ba, agir, av, bûrisk, baran, volkan, hişkatî. Ev tuxm dihêne guherîn û giyandar ûhindekgiyanleber li pişt van tuxman veşartîne.

Ligoreyî van her çar xalan efsane jimirovî peyda bûye, wate mirovî efsane peydakiriye û navên efsaneyî lixwe û li ser her tiştekî danane. Derbareyê mêjûya peydabûna efsaneyêda çendbîrûboçûnên ciyawaz yên zana û vekoleran wergirîn ku evên li xwarê ne:

1. D.Mewludİbrahîmdibêjît: “şitêk heye û pêy degotirê efsane û le nêwan efsaneşda mêjûy efsane heye, ewa mirove dirustker û dahênerî ew mêjû efsaneyî her boye, eger mirov

---

[73]Alî EşrefDeruyşanû Ezîz Gerdî, Efsanezarî kurdî, Silêmanî, 2002, r.7.
[74] ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, r.14.
[75]ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, r.16.

nebê! Ewe ne efsane heye û ne efsaney mêjû û ne mêjûy efsane”[76], wate mirov mêjûyê tomar diket û danît: “mêjû le kwê be payan bika, efsane le wêwe dest pê deka”[77], wate mêjû û efsane herduli gelêk jidayik bûyîne.

2. Namirsun derbareyê mêjûyê dibêjît: “ewe eqlî mirovew mêjuwe nûsîyewe, debê her xweşî bixwênêtewe, ewe ye Ebîl- Hol le seriyetî hir xwey nihênî xwey aşkira bikat”[78].
3. Loy Şitrawsdibêjît: “beyekgeyiştinêk le nêwan mêjû efsaneda bedî dekirêt”[79], wate Loy şitraws efsane û mêjûyê pêkve girê didet. Maykl Tirantdigelboçûna Loy Şitrawsî ye û dibêjît: “ efsane weku mêjûye.”[80]HerwesaJung jî digel van herduboçûna ye û dibêjît: “efsane çiye? Ew pêkhateyekî dûlayeney mêjuwe û mêjûniye – pêkewe – ye ne efsane û mêjûye.”[81]Herwesa Nestiyon Nison jî herdigel van boçûnaye ku dibêjît: “mêjû cige le efsane şitêkî tir nîye!”[82]

Lidûv vanbîr û boçûnên zana û vekoleran mêjûya efsaneyêbi peydabûna gerdûnê ve qelem diden çunkî“efsanekan temenêk beqed temenî mirovîyan heye, lew katewe ke mirovekan hêzî îşkirdinewe û bîrkirdinewey siruşt û komelgayan kird em babete le çiwarçêwey osure, wênekêşan, peykertaşî, sema, ..., piştawpişt bo yektiriyan gewastutewe û deyguwazinewe.”[83]HerwesaElaedidîn Secadîdibêjît: “efsane le qewme seretayyekanewe bo ewe dahatuwe, guya ademîzad zor kune.”[84]

### 1.6.Naveroka Efsaneyê

Naveroka her babetekê efsaneyî mîna çîrok, hozan, hîkayet, çîvanok hwd.ji hindekbinemayên siruştî û nesiruştî pêk dihêtku evbinema dibine delaletên hindekdiyardeyên dûr jimentiqê.Ji bodirust bûn û afirandina rûdanekê yan serhatiyeka efsaneyîku dinav van rûdan û serhatiyan da karekterên serekî hene mîna xwedawend, giyanewer, hêz, heyv, roj hwd. Derbarey naveroka efsaneyêda Ranya Smaredibêjît: “efsane le komelêk çîrok û heqayet pêkdê ke

[76]Mewlud İbrahîmHesen, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r. 272.
[77] DariyoşBehmaniyan, Efsaney r.orî, wer. Ezîz Gerdî, dezgay çap û pexşî Serdem, Silêmanî: 2004, r.12.
[78]DariyoşBehmaniyan, hb.r.193.
[79] Ferhad EzîzXoşnaw, Efsane û mirdin le efsaney kurdîda, Hewlêr, 2013, r.29.
[80] Mewlud İbrahîmHesen, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.193.
[81]Mewlud İbrahîmHesen,Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.194.
[82]Mewlud İbrahîmHesen,r.194.
[83]Bêrîvan SamedHewêz, Rehendî Efsaneyî le Şî’rekanî Newzad Rafet da, r.16.
[84]ElaeddînSecadî, Mêjûy edebî kurdî efsane, r.121.

peywendî darinbe xwedawendekan û lêkdanewey hokare siruştiyekan.”[85]Çîrokên efsaneyê pitiriya caran peywendî bi giyaneweranve yan qehremanekê ve heye û diyardê, siruştî şirove diken her derbareyê naveroka efsaneyê.D.Anîs Dawdidibêjît:“efsane pirî serhatiyên xwedawenda û qehremanên neasayî û mûcîzatan e.Birêka têkelkirina bûyerê digel xeyalî û herwesa têkelkirina cîhana bûyerî û cîhana li sersiruştî da anku cîhana xeyalî.”[86]

Herdîsan derbareyê naveroka babetên efsaneyêEleksander Kirapdibêjît: “xwedawendekan têda rolî serekî dibînin.”[87]Naveroka babetên efsaneyî ji van binemayan pêk dihêt:

1. Xwedawend:

   Mirov (Jin, Zilam)
   Giyanewer
   } Zîndî (bi ruh)

   Nîv mirov nîv giyanewer

   Tîmsal (senem) → ne zîndî (bê ruh)

   Heyv + roj hwd.

2. Dûr ji mentiqê
3. Tirs
4. Têkel kirina diyardên siruştî û nesiruştî
5. Hêz → Hêza dervey leşê mirovê asayî
6. Komediya → xweşî
7. Trajediya → ne xweşî

Efsane diramana xweda demê emguh li peyva efsaneyê dibînhindekraman û şîrovekirin dinav hizir û mêşkê mirovî da peyda dibin liberamberî peyva efsaneyê ewjî bi vî şêwê li xwarê ne:

Efsane:

- Efsane: beramber → sêhr

[85] RanyaSemara, Efsane û edeb, r.8.
[86] EnîsDawid, Al-Astore fî Al-Şa’ri Al-Arabî Al-Hadis, r.9.
[87] Ferhad EzîzXoşnaw, Efrandin û mirdin le efsaney kurdîda, r.16.

- Efsane: beramber ⟹ derew dûr jimentiqê
- Efsane: beramber ⟹ xwûrafat
- Efsane: beramber ⟹ tişteke çi hebûn nîne
- Efsane: beramber ⟹ alozî
- Efsane: beramber ⟹ xeyal

Berawirdîdinavbera Xwedê û xwedawenda da:

| Xwedê | Xwedawend |
|---|---|
| 1. Xweda.<br>2. Xwedê yeke û take û tenyaye xwedayê mezin dibêjît(قل هو الله احد)[88]<br>3. Layenê sêksî nîne.<br>4. Nivistin nîne.<br>5. Xwedayê erd û asmana ye.<br>6. Xwedanê dirustkirina ruhê.<br>7. Bi Hêz in. | 1. Ebid.<br>2. Xwedawend gelekin (jin + zilam + giyanewer hwd.)<br>3. Layenê sêksî heye.<br>4. Nivistin heye.<br>5. Bitenêxwedawendê feqîra û jara bûn.<br>6. Neşên ruhê diorust biken.<br>7. Bê hêz in. Hêza wan sinordare. |

[88] Qorana Pîruz, soreta (Al-İxlas) ayeta (1).

### 1.7.Curên Efsaneyê

Piştî ku her vekolerekî vekolîn li ser efsaneyêkirîn,lidûv dîtin û hizra xwe efsane dabeşkirîne li ser çend curan, çunkî efsane yek jiwan babetên kevn, aloz û peywendîdare digel hemî babetên dîtir wek mêjû, felsefe, ayîn, ziman, zaniest hwd.Efsane dinav hemî bûyerên jiyanê da berbelav e.Piştî ku vekolînên taybet li ser efsaneyê hatîne encamdan, vekoleran gelek curên efsaneyê diyarkirîne bi gelek şêwazên cudacuda,hindekjiwan curan dê destinîşan bivî şêwê li xwarê destnîşan bikin:

1. Efsaneyên Gerdûnî
2. Efsaneyên Hodozî
3. Efsaneyên Şaristanî
4. Efsaneyên Cevengî
5. Efsaneyên Ayîrdeyî
6. Dîroka Efsaneyê[89]

#### 1.7.1. Efsaneyên Gerdûnî

Efsaneya gerdûnî yek ji kevitirîn curên efsaneyê ye û mêjûya peydabûna wê neya diyare.Lê li dûv zanyariyên liberdest boserdemê Sûmerîyan dizivrît, anku sê hizar salan berî zayînê.Ev curwekî yekem curê efsaneyê dihête hejmartin. Ev curê efsaneyê amrazeke jibo derbirîna tiştên dinaxê mirovê kunda heyîn, kiriyara derêxstin û aşkirakirina wan hezên veşartî wekî wêneyekîne ku dixewnanda çê dibît, paşî ewbixwe dibîte çîrokek.[90] Ev curê efsaneyêbehsê çawaniya dirustbûna gerdûnêdiket, ka çewa ev gerdûn dirust bûye. Her ji destpêka peydabûna mirovê seretayî hizir li ser vê çendê hatiye kirinû nêrîna mirovî bostêran, heyvê, esmanî, şev ûrojan hwd.kubûye cihê pirsyar û bersivan.“Ev curê efsaneyêbersiva wê pirsyarê didet: ka çewa ev gerdûne bivî awayî peydabûye?”[91]

Derbareyê bersiv û pisyarên efsaneyêArif Hîtodibêjît: “efsanebersivdana pisyarên bê bersiv e, wek pisyarên zarokan bo nimûne; Kê cîhan danaye? Kengî dê cîhan temam bît? Yekem

[89] Marof MohamedAlî, Efsane û Hozan; Hozanên Arif Hîto wek nimûne, Kovara Peyv18/1/1999, r.64.
[90] Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.24.
[91]Şivan CercîsEbdulrahman, hc.

kes li ser rûyê erdî kî bû?Piştî mirinê giyan kû ve diçin?"[92] Ev cure jêwerên kewnî dibêjin û çewa ev kevne bivî awayî peydabûye, jibotêgehiştina diyardeyên kewnîû jibotêgehiştina dûrî ya erdî û esmanî û hebûna stêran li esmanî."[93]Mirovî hewldayebersivê bo van pirsyaran bînît, ew ên girêdayîbi gerdûnê ve.Ev curê efsaneyê dinav hemî miletanda heye, lê her miletekê bi şêwazekê cudacuda hatiye gotin.Nebîle İbrahîmdibêjît ku "evî curê sebaret çawaniya peydabûna gerdûnê rolekê giring hebûye."[94]

Sebaret çawaniya dirustbûna gerdûnêbi dîtin û hizira olê Êzidiyan dibêjin "liberahiyê Xwedê hebû, çikesê dî nebû. Xwedê bi xwe keştîyek çêkir û liser deriyayan digeriya û paşî yeka dîbo xwe çêkir û bo mawê çil salan digeldabû, paşî pênek lêda û peqî, ji kadiya wê asman peydabû û ji pirtên wê stêr û çiya û erd peydabûn û paşî ji ronahiya xwe şeş xwedê yên dî (milyaket) yên wekî xwe peydakirin. Yê yekê Şems al-Din li roja yekşembî roj çêkir; û yê duyê Dirdaîl/Fexr el-Dîn liroja Dûşembî heyv çêkir; û yê siyê Mîxaîl/Amadîn liroja Sêşembî Surret – Al Fallak çêkir; û yê çarê Arafîl/ Melik Taws liroja Çarşembî sitêra bisehêçêkirîye; û yê pêncê Secadîn liroja Pêncşembî rûwek û berhemên erdî çêkirîne;ûyê şeşê Şimfaîl/Nêraldîn liroja Eynî hemî sax û mirî nivîsîn; û li roja heftê Şembî Xwedê /Nuraîlbû ku ew bixwe Êzîdî ye.Wesa kewn bi heft rojan peydabûye[95], peydabûn û dirustbûna kewnî lidevefsaneya olê êzidîyan bivî rengî ye.

Lê li defhindek efsanenasên dî, behsê çawaniya dirustbûna stêr, heyv, roj, erd û esmanî diken û dûratiya erdî jiesmanî efsane dibêjît: "erd jina esmanî bû û pêkve bûn wan zarok hebûn û zarokên wan dimirin, jiber tariyê êdî neşiyan li daristanê bijîn, lewra hizirdikirin jêkvebin, rabûn tîrupîşik havêtin boberdanê, erd û esman jêkvebûn û zarokên wan anku heyv, roj, stêr li defesmanî man, lewra heta niha erd liesmanî dinêrît, çunkî zarokên wî li wêrê ne."[96]

### 1.7.2. Efsaneyên Hodozî

Ev efsane wekî efsaneya gerdûnî ye penayê dibene ber pirsyar û bersivan, û behsê wan diyardeyên siruştî diken yên seyir ku li dewrûberê mirovî hene."Di vî curê efsaneyê da hewldaneke jibo çêkirin û peydakirina hindek huy û semedan jibo peydabûna tiştên heyîdigel

[92] ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, r.15.
[93]ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, r.17.
[94]Şivan CercîsEbdulrahman, hc.
[95] ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, rr.19- 20.
[96] Şivan CercîsEbdulrahman, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.24.

şirovekirina siruştê peydabûnê.Piştî mirovî hizirkirî kuhindekgiyanên dî heneberamberî wan, wek bûyerên siruştî: brûsk, volkan, hişkbûna erdî hwd.ev efsane belav bûn”[97]Efsaneya Hodozî bizaveke jibo dirustkirina şêwazekê mentiqî jibo şîrovekirina tişta diçerxekî da ku dûr e ji şêwazê zanistî.[98]Jiber nebûna astê zanistî “mirovê destpêkê negehiştbû wê qonaxa hizrî ku bişêt egerekê zanistî bi karbînît, ewneçar bû bi şêweyekê seretayî û sade û sakar lêk deteve.”[99]Ji ber vê çendê gelek xelk peydabûn wek kahin û sahir[100], bo me diyarbû ku efsaneya Hodozî peywendîdare digel diyardên siruştî.

### 1.7.3. Efsaneyên Şaristanî

Ev curê efsaneyêbehsê hemî qonaxên cuda cuda yên şaristanîyên jiyana mirovî têda derbazbûyîdiket.Ew peywendîdare digel hemî bûyerên jiyanê ve wek aborî, komelayetî, mêjûyî hwd.ûbehsê peywendiya mirovî bisiruştî ve diket, “her jiqonaxên seretayî yan jî (hemecî) taku şiyay jibo jiyana xwe şêwazekê rêkxistî jilayê peywendiyên civakî û madî ve dirust biket û efsaneya şaristanî ewe ku hevrikîya mirovî digeljiyanê  xuyabiket.”[101]Ev cure efsane hevrikiya mirovî digeljiyan û dewrûbera şirove diket û rijdiya mirovî ku jiyanê jiqonaxa xweristî veguhêzîte qonaxa şaristanyetê.[102] Bo nimûne lidûv hizrên şaristaniyeta mêra kevin dema xwedawendekê wan miriba, ew da wî mumya ken û zêr û parên wî digel kene digorî da. Wan wesa hizirdikirku cîhana duyê ye, wate “efsaneyê peywendî heye digelbarûdoxê şaristanîyên mirov têda jiyayî.”[103]Bojiyana piştî mirinê ye, çunkî mirin ne dûmahî ya mirovî ye, li dûv hizirên şaristanyeta kevinbelkî kiryara veguhastinê ye jihaletekê bo yekê dî.”[104]Efsane wekî bizaveka şaristanî ya pêkve girêdayî ye.[105]

### 1.7.4. Efsaneyên Cevengî

Ev curê efsaneyê diqonaxeke wesa da peydabûyeku vekolerbiqonaxeka pêşkeftî bi nav dikin. Kameran Mukirî dibêjît: “em efsaneye le qonaxêkda peydabûwe, pêşkewtûtir le qonaxey

---

[97]ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, r.20.
[98] Marof MohamedAlî, Efsane û Hozan, r.64.
[99] Nebîle İbrahîm, Efsane (Al-Astore), û: Mohamed Bedirî, çapxaney (Ala Al-Wezîriye), Bexda, 1986, r.37.
[100]ArifHîto, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, hc.
[101] Alî, Marof Mohamed, Efsane û Hozan, r.64.
[102] Hîto, Arif, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, Govara Peyv, jmare(14-15), r.20.
[103] Heman Jêder, r.21
[104] Hisên, Fazîle Ebdulrahman, Fikre Al-Astore û Kitabe al-tarîx, dar Al-baruzî, Tabiae al-awlî, 2009, r.38.
[105] Ebdulrahman, Şivan Cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.27.

ke efsanekanî pêşûy têda peydabûwe, em çeşne xwey nabestêtewe tenya begerdûnewe belkî lenaw cergey jiyanî ademîzadewe hill equlê, weherweha giringtirîn tuxmî serekî efsaney tiyaye weku ( xwedawendekan, siruşt, ademîzad, peywendî komelayetî hwd.)”[106]Zana û vekoler vê curê efsaneyê jiefsaneyên dîtirbaştir didanin, çunkî“ev curê efsaneyê pêkdihêtin jihindekcevengan ku pêdivî bi şîrovekirinê hene.”[107]Karê cevengê diefsaneyê da jibo çarçovekirin û pitir xuyakirin û aşkirakirina têgehiştina mirovî bo kewnî ye.Livêre xuya dibît ku demê mirovî diviya serederiyê digel tişta biket, serederî digel xwe dikir û behsê serborî û jiyana xwe dikirbi rêka efsanan.Evjî pêşkeftin û werara zimanê mirovî diyardiket û bikarhênana wêneyên hunerî û cevengên efsanî,[108]wate wekî me li destpêkê amaje pê dayî,ziman û axaftin nebûn li destpêka qonaxa jiyana mirovî , wan hêma (ceveng) bikardiînan dinav jiyana xweya rojaneda.“Ev cur diwê qonaxê da peydabûye demê mirovbi ayinên asmanî ve hatiye girêdan, bivî rengî efsane berev amrazê dahênanên hunerî pêşikeft.Pitiriyaefsaneyên Grekî yên îroliber destê me, jilayê hozanvananve hatîne bikarhênan.”[109]

### 1.7.5. Efsaneyên Ayîrdeyî

Ev efsanene ku jibineret da hatîne girêdanbikiryarên perestvaniyê ve.Wan giringî ya daye pişka axaftinê (cizi al-kelam) jikiryarên ayîrdeyî berî ku bibine hîkayet jibo van ayirdeyan.[110] Ev cure efsane hevbendin biîbadet û çîvanoka ayîrdeyî kuberbelave liser dîwarên perestgehan,bo nimûne roja Taws Melekî ye dulê êzidiyan da “gencek yê liTawusekî Siware, lidestê wî yê rastê mare û lidestê çepê depeke dixweynît”[111], ev mare yê hatiye doristkirin li ser perestgeha Şêx Hadî Laliş.James Frezer dibînît ku “ efsane ji ayirdeyan dihête wergirtin.”[112]

### 1.7.6. Dîroka Efsaneyê

Ev şînwarên dêrîn, ewên mayîne liberdestê me wekî Pira Delal, Şkefta Şaneder, Gundê Çermo, Ehramatên Misrê hwd.kubûyîne dîrokeka efsaneyi û çîvanok û serhatî dinav xelkê da bo hatine gotin.Çunkîhindekpehlewanên dîrokî ûhindekkiriyarên seyr û aşopî têda hene, wek

[106] Mukrî, Kameran, edebî fulkLorî kurdî, beşî yekem, çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 1984, r.42 – 43.
[107] Alî, Marof Mohamed, efsane û hozan, r.64.
[108] Hîto, Arif, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, Govara Peyv, jmare(14-15), r.20.
[109] Ebdulrahman, Şivan Cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.27.
[110] Alî, Marof Mohamed, efsane û hozan, r.64.
[111] Hîto, Arif, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, Govara Peyv, jmare(14-15),L 19.
[112] Ebdulrahman, Şivan Cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.25.

çîrokekê dihête gotin, û çunkîbi cihekê diyarkirî û pehlewanên dîrokî yên rasteqîne ve hevbende, lewma xelk hez jê diken[113], û jikesekîbo kesekî dî dihête veguhastin.[114]

### 1.8.Dabeşkirina Efsaneyê

Her vekolerekîlidûv nêrîn û vekolîna xwe efsane bivî rengê li xwarê dabeşkirîne:

Nebîle İbrahîmefsaneyê dabeş dikete ser van curan:

1. Efsaneyên Afirandinê
2. Efsaneyên Ayîrdeyî
3. Efsaneyên Hêmayî
4. Efsaneyên Egerî
5. Efsaneyên Palewanya xwedawendan[115]

Feylesofê Elmanî Hêrdirefsaneyê dabeş dikete ser sê curan:

1. Efsaneyên Teorî: ev curebrîtî ye jiveguhastina zanyariyan bidîtina diyardên siruştî.
2. Efsaneyên Akarî: ku bi erkê perwerdê radibin.
3. Efsaneyên Qeder û Çarenvêsî.[116]

Kameran Mukirîefsaneyê dabeş dikete ser çiwar curan:

1. Efsaney nerît û bone aynî yekan
2. Efsaney Gerdûnî.
3. Efsaney Hêmayî
4. Efsaney Qehremanî Xwedawend[117]

Vekolerê ErebAhmed Kemal Zekî efsane dabeşkiriye li ser çiwar curan:

1. Efsaney Siruştî
2. Efsaney Şîkarî
3. Efsaney Hêmakarî

---

[113] Alî, Marof Mohamed, efsane û hozan, r.65.
[114] Hîto, Arif, Nejad û Peydabûna Efsaneyê, Govara Peyv, jmare(14-15), r.22.
[115] Ebdulrahman, Şivan Cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.21.
[116] Heman Jêder, r.22.
[117] Mukrî, Kameran, edebî fulkLorî kurdî, beşî yekem, çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 1984, r.41 - 44.

4. Mêjuwe Efsane[118]

Nivîserê Îranî Cemal Mîr Sadiqî efsanebivî rengî dabeşkiriye:

1. Efsaney Giyanleberan
2. Efsaney Nimayşî
3. Efsaney Perîyan
4. Efsaney Palewanan
5. Estore[119]

Qeys El-Nurî efsane dabeşkiriye û komeleka efsaneyan dest nîşankiriye:

1. Efsaney Diyarde siruştiyekan
2. Efsaney Diyanleberan
3. Efsaney Rûwekekan
4. Efsaney Ayîn
5. Efsaney Bineçe ûJiyan
6. Efsaney Cins
7. Efsaney Tendirustî
8. Efsaney Nerît û Perstinekan[120]

MirceaEliadeefsane dabeşkiriye liser çaar curan:

1. Efsaney bineçe û efrandinî gerdûn
2. Efsaney Nûêkirdinewey cîhan
3. Efsaney Dûmahî
4. Efsaney Yadewerî[121]

Lidûv dîtin û vekolîna me bu efsaneyê em dişêyn efsaneyêbi vî rengê li xwarê dabeş bikin:

1. Efsane û Hizir
2. Efsane û Xewn
3. Efsane û Diyardên Diruştî ('esman, dinya, 'erd, beheşt, cehenem hwd.)
4. Efsane û Jiyan (Cîhana Yekê)
5. Efsane û Mirin (Cîhana Duyê)

---

118Hesen, Mewlud İbrahîm, Geran Be diway Nemri le  Felsefey Kurdi û Farsi da, r.14.

119 Heman Jêder, r.14.

120Hewêz, Bêrîvan Samed, Rehendî Efsaneyî le  Şî'rekanî (Newzad Rafet) da, r.20.

121 Xoşnaw, Ferhad Ezîz, efrandin û mirdin le  efsaney kurdîda, bepêy avêsta û deqe pehlewîyekan, r.19.

6. Efsane û Endamên Laşî ( dest, çav, guh, ziman hwd.)

## 1.9.Regezên Efsaneyê

Her cureyekî edebî li ser çend binema û regez ûkerestan dirust dibît û her cureyekî edebî regez û kerestên taybet yên xwe hen. Bo nimûne efsane regez ûkerestên wê cudane jicûreyekî dî yê edebî.Efsanedipêkhata xweda jihindekregez û kerestan pêk dihêt ku ew regez û kereste dieslê xweda dibine asayî û neasayî: waq'î û ne waq'î; ev regez ûkerestên efsaneyê pêk tîninjî qehreman, cih, dem, hizir, rûdan û kereste ne.

### 1.9.1. Qehreman diEfsaneyê da

Hebûn û peydabûna efsaneyê qehremane û qehreman regezê sereki yê efsaneyê ye.Diefsaneyê da qehreman kesekî asayî nine, anku ew ciyawaze ji qehremanên dî yên cureyên edebî çunkî"qehremanên efsaneyî dipitiriya caranda nimûneyîne, bi gelek reng û sîmayan dihêne dîtin dinav efsaneyê da,hindekjiwan hilgirê saxletên başiyêne û hindekên dîtir yên xirabiyêne."[122]

Ev qehremanên efsaneyî nimûneyîne çunkîew xwedan hilwest, saloxet, hêz û kesayetiyeka taybet in. "Kesayetiyên efsaneyî xwedan hêz in û radebederin,bilindtirin ji ketwarî û dibît bilindtirbin ji tiştê mentiqî, lewra ew dişên beramber her hêzeka mezin rawestin."[123] Ew kesê biba xwedawend yan qehremanê efsaneyê diviya hêza wî û kesayetiya wî jimirovê asayî bihêztirbaya daku biba qehreman.

Qehremanê, efsaneyî di rastiyê da da çi hebûn bo nîne mentiq qebîl naket, lê bi tenê nav warê efsaneyê da dihêne dîtin û bikarînan. Hindekqehreman û kesayetiyên dinav efsaneyê daev in:

- Ehrîmen: Serokê hêzê şere le efsaneya farsî da

- Amûn: Xwedawendê mêriyekan

- An: Xwedawendî asmane le efsaneyên Sûmerî da

[122] Ebdulrahman, Şivan Cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.34.
[123] Heman Jêder, r.34.

- Awzîrîs:  Xwedawendê Misrê ye[124]

- Hêra: Hevjîna Zeus bû

- Esîna: Kiça Zeus bû

- Hêlîna: Hevjîna şahê Siparta ne

- Parîs:Kurê şahê Terwad e

- İrîda:  Xwedawenda fitinê ye[125]

Dinav efsaneya kurdî da çend curên qehremanan hene wek perî, dêw, ecin, şeytan.[126] Derbareyê qehremanên efsaneyaa kurdî da Mewlud İbrahîm Hesendibêjît: “palewan beşêwey rolgîrrî efsaneyî û karekter efsaney xwe yi le dêw, cin, perî, şeytan, hawçeşnekanyanda nimayiş dekat û em palewanane her be siruştî xweyan le nêw efsane, palewanêkê efsaneyîn û hêz gelêkî efsaneyiyan heye û karî seyir û efsaneyî deken cige lew palewananey ke asayîn û keçî karî efsaneyî deken.”[127]Her dîsan zanyarekî dî wesa dibêjît “qehreman dinav efsaneya kurdî da pitiriya caran qehremanê mirov in, bo nimûne Xidirê Zîndî, Loqman Hekîm, Pîrejin, Kuse, Jin Bab, ZirXwîşk, Deroyş hwd.”[128]

### 1.9.2. Cih diEfsaneyê da


Diberhemên edebî da giringîyeka taybet ya cihî heye û ewsinordare û diyarkirî ye.Lê diefsaneyê da cih ne cihekî sinordarkirîye çunkî“cihê rasteqîne dinav efsaneyê çi hebûn nînin, cih yan jîngeha siruştî dinaveroka xwedahindekhêma û delalet û watayên efsaneyî hilgirtîne, lê wek cihên rasteqînenahêne hejmartin.”[129]Cih dinav efsaneyê da cihekî rast û dirust nine, mentiq wernagirît û qebîl naket, wate ew cihê dinav efsaneyê da diwaq'î da nine.Herwekî komeleka mamostayên zankoyê derbareyê cihê efsaneyê dibêjn: “şiwên le efsaneda şiwênî asayî niye, ke

[124]Avîvan, Efsane û Hozan, Govara peyv, jmare (129 – 130) çiriya yekê ya duwê, 2002, r.58.
[125] Ebdulrahîm, Mohamed r.atîf, dîroka edeba kevnare (edeba Yonanî), ji weşanên zankoya Dihok, r.9 – 11.
[126]Hewêz, Bêrîvan Samed, Rehendî Efsaneyî le  Şî’rekanî (Newzad Rafet) da, r.25.
[127]Hesen, Mulud îbrahîm, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.178.
[128] Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.35.
[129] Heman Jêder, r.35.

eqlê mirov natwanên penayan pê bibat û qebû lyan bikat, çunkî le waqî'da bûnyan niye wekdûrgey Waq Waq, yan Benî Ruiya, yan her şiwênêkî tir bêt.”[130]

### 1.9.3. Dem diEfsaneyê da

Diefsaneyê da çi demên diyarkirî û asayî nînin, çunkî“demê efsaneyî îşaretê didete serdemekê gelek kevin û seretayî yê her tiştekî, bivê çendê mêjû û biha û giringiya xwe ya bineretî ji dest didet”[131], di kitêba Kurdolojî da komeleka mamostayên zankoyê derbarey demê efsaneyê dibêjn: “kat le efsaneda katî rasteqîne nîye”[132], wate efsaneyê çi demên rast û dorist nîninçunkî efsane her ji destpêka peydabûna mirovî peyda bûye û heta nikejî berdewam e. Belkî “demekê zîndî ye, çunkî efsane dibînît ku rabirdû, nike jî yaberdewame û bidûmahîk nehatiye.”[133]Watedemê efsaneyê da ne dihête destnîşankirin ne bidûmahîk dihêt hindî jiyan li ser vî gerdûnê hebît, “dem diefsaneyê da yê têkira têkiraye û nahête dest nîşankirin, çunkîew ê hatiye avakirin liser bineretê wê yekê ku çi caran bidûmahîk nehêtin. Efsaneyê erkekê rewşenbîrkirinê heye û herdem mirovî pêdiviyatî pê heye.”[134]Watedem diefsaneyê da bivî rengê li xwarê ye:




Mewlud İbrahîm Hesenderbareyê demê efsaneyî dibêjît: “efsane wek hîkayetêk ku pirle kesayetî ciyaciya rûdawî seyr û heme cur, her boyeş pêwîstiyekî bineretî be kat heye, ca çi katî asayî çi katî efsaneyî, em katane be herdu curiyewe, katî pabewane asayî û efsaneyeyekanî, herçende katî deq wek mêjû katêkî diyarî kirawî xwey nadate dest...”[135]

---

[130]komelêk mamustay zanku, Kurdolocî, çapxaney Hîvî, Hewlêr, 2015, r.1.

[131] Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.36.

[132]komelêk mamustay zanku, Kurdolocî, r.1.

[133] Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.36.

[134] Heman Jêder, r.37.

[135]Hesen, Mewlud îbrahîm, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.178.

### 1.9.4. Rûdan diEfsaneyê da

Rûdanên dinav efsaneyê da hîç rastiyek waq'î nîneçunkî"rûdaw le efsaneda asayî nîye, belkî sîmayekî efsunawî werde girêt û bexêrayî berewpêş deçît."[136]Şivan Cercîs dinama xwe ya masterê da, ya li jêr navê *Erk û Regezên Efsaneyê diÇiwar Romanên Devera Behdînan da*rûdanên efsaneyêdikete du cur:

1 – Rûdawe asayîyekan: Ewrûdanên asayî û siruştî ne û rojane rûdiden û dubare dibin.

2 – Rûdawe efsaneyîyekan: Ewrûdanên ji derveyî waq'î da ne, ev rûdan çi hebûn bonînin. Hindek rûdanên seyrin ku mentiq qebîl naket û wernagirît, tenê evrûdane serinca mirovî bo xwe radikêşît. Mirov pê dihête girêdan, wek mirovên dibine ejdeha, pîrhevok hwd. Ev rûdan bi dîtina me û xwendina me boefsaneyê dibine du cur:[137]

1 – Rûdanên xweş

2 - Rûdanên ne xweş

### 1.9.5. Kerestên Efsaneyê

Dinav her cureyeke edebî da kerestên xweyên taybet hene û her cureyekê kerestên wê cuda cudane. Efsaneyê jî kerestên xwe yên taybet hene û cudane jihemi cureyên dî yên edebî,ev kerestê dinav efsaneyê da hemecurin û ciyawazin û seyrin û serinc rakêşin. Hindekji wan kerestan neberaqil in, mêşkê mirovî bawerî pê nahêtin û hindekên dî asayî ne wekî avajiyanê, cama cîhanê wek cama dîtinê, morka xewê, çerx û felek, 'ebayê sêhrî.[138]Herwesa Engustîley Hezretê Silêman[139], ev kerestên hene mirovî berê bikardînan jibo her karekê pêdivî.

### 1.9.6. Hizra Efsaneyi

Raste ku hîç nbawerî bi serhatî, çîrok û çîvanokên efsaneyê nahêtinûew neberaqil in, lê her çi efsaneyek hebît ew li serhindekhizir û bîran hatiye avakirin.Egerew hizir û bîre gelek ya

[136]komelêk mamustay zanku, kurdolocî, r.1.

[137] Ebdulrahman, Şivan Cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.37.

[138] Ebdulrahman, Şivan Cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.37.

[139] Sabir, Perîşan Xald, Rehendî ,efsaneyî le r.awkî kurdewarî da, r.80.

sadejî bît yan ya beraqil nebît, dirustbûna efsaneyê li ser bineretê hizrîxuyabûye. Derbarey hizra efsaneyêMewlud İbrahîmHesendibêjît: “hîç efsaneyek nîye kubinema hizrîyekey leser bîrokeyek û felsefeyek danemezrabê, çunkî amancî hemû efsanekanîş amancêkî mirovaneye.”[140]Wate efsane li jêr hizra mirovî dirust bûye, wek “geran be duway nemirî, pîrî mirov kirdinbe xwedawend.”[141]

### 1.10. Efsaneya Kurdî

Her miletekê efsaneya xwe ya taybet û cuda heye jimiletên dî.Miletê kurd jî yek ji wan miletane ku xwedan mêjû, serhatî, çîrok û çîvanokên xweyên taybet hene.Piştî kuvekoleran vekolîn kirîn li ser wan şînwarên heta nike mayîne liber destê me, mîna Pira Delal, Şkefta Şaneder, Şikefta Hezarmêr, Gundê Çermo hwd.diyarbû ku miletê kurd ji kevintirîn miletên cîhanê dihête hejmartin.Miletê kurd mêjûyeka kevin û dêrîn heye û bo wî serdemî dizivrît ku hêşta jiyan lidev miletên dî negehiştbû rengê şaristanyetê.[142]MewludİbrahîmHesendipirtûka xwe yabi navê *Pêkhatey Efsaneyi Kurdî*da efsane û şaristanyeta kurdan dabeş dikete ser sê qonaxan:

1. *Qonaxî Eşkewt*: Destpêka efsane û şaristanyeta kurdan, li nav şikeftan da dest pêkiriye û Kurdistan yekem landika jiyana mirovayetiyê bû, çunkî yekem û kevintirîn şikeft di mêjûya mirovayetiyê da hatine dîtin û bo maweyekê dirêj jiyan têda derbazbûye, ewjî şikefta Şaneder û Hezarmêrd in. Belge ji bo vê çendê şûnewarinasê Emrîkî Sulîkî demê vekolîn li ser şikefta Şaneder kirî wesa digot “îskbendî mirovî neyandertalî dozîyewe ke mêjûwe ke bo dewrûberî şest hezar sal ber le êsta degerêtewe.”[143] Her dîsan şûnewarinasekê dî yê bi navê Garod demê vekolîn kirî li ser şikefta Hezarmêrd wesa digot “şûnnewarî ademîzadî dozîwetewe ke mêjûwekey bo dewrûberî penca hezar sal ber le êsta degerêtewe”[144], şikefta Şaneder û Hezarmêrd wek paşmaweyek bo miletê kurd maye heta nike.

   Derbarey şikefta Şaneder Alyasander û Elfiroydivîç dibêjin ku şkefta Şaneder “eşkewte be nawbangekey Şaneder le şaxekanî Kurdistan wek arşîfêkî nayabî parastinî şîwênewarî şaristanî û mêjûyî û mirovayetîye be rêjay sed hezar sal (100.000).”[145]Wate di vî maweyê dîrokî da berdewam mirov têda jiyane, ji wan mirovan “mirovî neyandertal le maweyeda le


[140] Hesen Mewlud îbrahîm, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.180.
[141] Hewêz, Bêrîvan Samed, Rehendî Efsaneyî le Şî’rekanî (Newzad Rafet) da , r.26.
[142] Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.29,
[143]Xoşnaw, Ferhad Ezîz, efrandin û dirun le efsaney kurdîda, çapxaney hacî haşm/ Hewlêr, 2013, r.21.
[144] Heman Jêder, r.29.
[145]Hesen, Mewlud îbrahîm, Pêkhatey Efsaney Kurdî, 67.

şanederîş jiyawe.”[146] Derbareyê borîna jiyana mirovê dêrîn li nav şikeftan da Rêbwar Sîweylî dibêjît: “ême mindalî neteweyî  xweman le pal çiyakan û lenaw şikewtekan û kenar rubarekanda beser brduwe, emeş çiya û eşkewtekann penagey ême û malî yekemî êmebûn”[147]

2. *Qonaxî Gund*: Yekemîn gund li ser astê cîhanê ku liKurdistanê peydabûye, ev gunde bi navê Çermo ye li nêzîkî Çemçemale ku mêjûya wî gundî “le cîhanda duwazde hezar sale leme û ber mirov têyda fêrî dirust kirdinî xanû buwe.”[148]

3. *Qonaxî şar:*Derbarê qonaxa şar anku bajêran da MewludİbrahîmHesendibêjît: “eger kewntirîn eşkewt û kewntirîn gund le Kurdistanbin, ew rêy têdeçê ke kewntirîn şarîş her lêre debêt, zanakan kokin le ser ewey ke Hewlêr yekêke le kewntirîn şarî cîhan ke ta êsta be awedan mawetewe.”[149]

Wate şaristanyeta miletê kurd di sê qonaxanda derbas bûye wek ku li vî nexşeyê li xwarê hatiye diyarkirin:




Miletê kurd xwedan şaristanyeteka kevine ku bo demekê dûr û dirêj dizivrît ku li destpêka peydabûna mirovayetiyê ye.Her ji destpêka mirovayetiyêKurdistanbûye cihê çendîn şaristanyetên mezin û pêşkeftiyanan.Mirovê destpêkê li vê nawçê bûye, lewra efsane mêjûya wê vedigerîtebo

[146] Heman Jêder, r.67.
[147] Heman Jêder, r.67.
[148] Heman Jêder, r.36.
[149]Hesen, Mewlud îbrahîm, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.66, 68, 69.

destpêka mirovayetiyê.Em dişên bêjîn ku destpêka mirovayetiyê li vê deverê peyda bûye, bo wate destpêka serhildana efsaneyê li her heman cihbûye.Efsaneya kurdî bicureyekî giringê edebê kurdî dihêtenasîn û derbirînê jirûdanên komelayetî û diyardên siruştî diket.

Efsaneya kurdî wekî efsaneyên miletên dî xwedanê wê nediyare û mulkê hemî miletî ye.Şirîn HemedEmîn Hesendibêjît: “ efsaney kurdî ew çîrokeye ke danerekey diyar nîne û le nêw komelanî xelkda degêrdirêtewe.”[150]Wate li dûv vê pênasê efsaneya kurdî jikomeka çîrok û serhatiyan pêk hatiye û xwedanê wan diyar nîne, ku wate kes xwedanê serek nîne, anku jikesekî bo kesekî hatiye vegêran. Efsaneya kurdî “her weku efsaney netewekanî tir derbirînî hewlî mirove sebaret be jiyanî komelayetî û rûdawe siroştiyekan.”[151] Efsaneya kurdî wekî efsaneyên miletên dîtirjiyan û kulturê miletê kurd nîşanîmiletên dîtirdidet. Weku dêkûmêntekê dêxîte pêş çavên xelkê. Dinav efsaneya kurdîda gelek remz û hêma û wênên giyanewer û mirovên hêza baş û hêza xirab dinavda hene:

1- Hêmayên êza xirab: mar, dêwu, dirinde, pîrejn, ejdeha hwd.[152]

2- Hêmayên hêza baş: ademîzade, “e efsaney kurdî da qehremanî serkewtû hemêşe le ademîzade, zortirîş le hejar û renc kite”[153], dinav efsaneya kurdîda hemî dema şer û milmilanê di navbera hêza xirab û hêza başda peydadibît û hemî dema hêza baş serdikevît li ser hêza xirab.Hemi deman qehremanên hêza baş kesên hejarin, hêza “xêr xwa ke birîtiye le ademîzad û eme wêney mîlete, hemû şiwênêkî pirkirdutewe û le hemû şiwênêkda heye û bebê tirs le jêr tîşkî rojda dejî û her çakey binyad nawe, belam hêzî xrabe û bedî keme û le tarêkîda dejî û le tîşkî roj detirsê û her ke rojhilat ew û derevêt.”[154]Di navbera hêza baş û hêza xirab duxwedawend hene (1) xwedawendê xêr û ronakî *Hurmiz* (Ormuzd), (2) xwedawendê şer û tarêkî*Ehrîmen*(Ariman).wate“xwedawendê xêr û ronakî Hurmizsopayekî nebînrawe le şêwey perî le ber destdabe bu yarmetîdanî mirovî çakekarî bekardênê û xwedawendî şer û tarîkî Ehrîmen ke sopayekî nebînrawî le şêwey rêw, dirinde, mar, ejdeha bu xirabekarî bekardênê.”[155]Xwedawend Hurmiz yek jiwan hêzên baş bû dinav efsaneya kurdîda berî Îslamê.Lê piştî hatina ayinê Îslamê

---

[150] Hesen, Şirîn HemedEmîn, çawlêdaxşandinêk be efsane û dastanî kurdî, govara asoy fulklorî, jmare(28), 2007, r.33.
[151] Hewêz, Bêrîvan Samed, rehendî efsaneyî le şî'rekanî (newzad ref'et)da, r.10.
[152] Mukrî, Kameran, edebî fulkLorî kurdî, r.47.
[153]Şareza, Kerîm, efsane le şî'rî hawçerxî kurdîda, r.12.
[154] Heman Jêder, r.12.
[155] Heman Jêder, r.10.

"duway musilman bûnî kurd hate nêw efsaney kurdî nimûne: Xidirî Zinde, wek rizgarkerêk."[156] Xidirê Zîndî ku birengê mirovekê riye spî dihête dîtin, dibêjin ta ku dûmahiya dinyayê dê mînît, lê ev wênê başyê dinav gelek netewanda dihête dîtin. Bibawerahindekfolklornasan ev kesayetiye berî hatina Îslamê hebûye, lê ew vekolerên ravekirin li ser Qurana pîroz kirîn, bi zilamekê baş didanin.Herwekî di sureta Kehf da hatî ku li gel Musayî (s.x) danûstandinek heye.Demêxwedê diwesa ferman kirî: "فوجد عبدا من عبادنا اتيناة رحمة من عندنا و علمناة من لدناعلما"[157] , ramana vê ayeta pîroz ewe ku "herdukan bendeyek jibendên me dît, me dilovanî jinik xwe pê birbû û têgehiştin û aqil ji nik xwe dabûyê me jidef xwe fêrî zanînekê kiribû."[158]

Miletê kurdxwedan kevintirîn ayinin çunkî xwedan kevintirîn efsane û kevintirîn şaristaniyetanbûyîne, "kurd weku mîletêk, wek her şitêkî tirî xwey mêjûy ayînî xweşî heye, ke kewntirîn ayîn le şanederî Kurdistan hebûwe."[159] Kuwate piştî vekolernasan vekolîn li ser Şkefta şaneder kirîn ûhindekhestîkên rêwûresm û bîrûbawerên ayînî dinavda dîtîn bo mêjûyeka dûr û dirêj dizivrînin.Belge bo vê çendêEbdulreqîbYusifdibêjît: "le gorî mirovanî eşkewtî şaneder, ewaney ke gul le ser cesteyan danirabû, herweha le Çermû peykerî xwedawendî dayik ke le qurbu, bem şêweye yekem beristiraw le Kurdistan le Çermû buwe."[160]Danana gula li ser gorî eve yek ji wan bîrûbawerên wan bûn, yek ji cure ayînê destpêkê bû "aynî beşêwe le seretayekey destkewtuwe, emeş kewntirîn mêjûwe le cîhan."[161]

Ayîn "le 65 hezar sal pêş êsta bîrokey ayîn le şanederKurdistan serî hildaye, ew peykereye ke peykerî dayike bo 30 hezar sal pêş êsta degerêtewe."[162]Serhildanaayînî liKurdistanê çend ayinên cuda cuda û mêjûyeka dûr ûdirêj heye, Cemal Nebez wesadibêjît: "yekêk lew kereste giringane, belgename pîrozekanî ew ayinanen kele Kurdistanda peydabûn wek ayînî Êzdî û Ehlî heq(Kakeyî yan Yarsan) û Şebek û Sareyî û Şemseyî û Heqqe.Herwiha ew ayinaney kele Kurdistanda her le diyanetî ayînî îslam."[163]Dinav efsaneya kurdîda bi çend ol û ayîn û mezhebên cuda cuda serhildaye, lê hemiyan armancek pê heye ewjî peristina xwedayê mezin.Herwekî me li destpêkê amaje pêday eger yekemîn qonaxa destpêka şaristanyetê li dev miletê kurdibît, ew

[156] Hewêz,Bêrîvan Samed, rehendî efsaneyî le şî'rekanî (newzad ref'et)da, r.13.
[157] Qorana Pîruz,soreta El-Kehif, ayeta 65.
[158] Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.31.
[159] Hesen, Mewlud İbrahîm, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.281 - 282.
[160]Hesen, Mewlud İbrahîm, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.282.
[161] Heman Jêder, r.282.
[162]Hesen, Mewlud İbrahîm, Pêkhatey Efsaney Kurdî, r.283.
[163] Hewêz, Bêrîvan Samed, rehendî efsaneyî le şî'rekanî (Newzad Ref'et)da, r.13.

yekemîn ayîn jî her li defmiletê kurd yê peydabûyîçunkî efsane û ayîn herdu peywendîdarin li gel yek. D.İsmaîldibêjît:“ efsanekan weku rêwresmî ayînî xweyan denwênin. Bîrubawerî mirovî seretayî le efsanekanewe dest pêdekat û duwatir le serdeme tazekanda, weku ayîn derdekewn.”[164]

### 1.10.1. Taybetmendiyên Efsaneya Kurdî

Mewlud İbrahîmHesen dinama xweya masterê da yabi navê “*Geran be diway nemirîda le efsaney kurdî û farîsida*”behsê taybetmendiyên efsaneya kurdî diket.Jilayê ziman, mêjû, ayînî, cografî, dabûnerîtên komelayetî ku ev taybetmendiye efsaneya kurdî jiefsaneya miletên dîtir cudadiket:

1. *Taybetmendiyên Zimanî*: Ew efsaneye ku li ser zarê zimanê kurdiye, û girêdayîbizimanê kurdî ve ye.Ew efsane, efsaneka kurdiye ku xala ciyawaz û cuda yaefsaneya her miletekî bihête cudakirin ji miletê dî, xala here serekî zimaneku birêka zimanî dê zanîn ku efsaneya kîjanmiletîye.
2. *Taybetmendiyên Mêjûyî*: Ew efsaneye ku behsê rûdanên mêjûyên miletê kurd diketbi şêweyekê efsaneyî. Bo nimûne Kawayê Hesinkar, Cejna Newrozê, Qela DimDimê hwd.
3. *Taybetmendiyên Ayînî*: Şêweyekê efsaneyêbehsê serhildana ayînên kurdî diket, û hêzeka efsaneyî didete kesayetiyên ayînî.
4. *Taybetmendiyên Cografî*: Ew efsaneye ku behsê cografyayaKurdistanê,bi giştî yan cihekê cografyaya taybet yaKurdistanê diketbi şêweyekê efsaneyî, bo nimûne Pira Delal, Şikefta Şaneder hwd.
5. *Taybetmendiyên Dabûnerîtên Komelayetî*: Ew efsaneye ku behsê dabûnerîtên dinav miletê kurdan de diket ku ev dabûnerîte dibîte xala ciyawaz û cuda li gel miletên dî wek: cil û berg, xwarin, dîlan, veguhastina jinê hwd.[165]

### 1.10.2. Curên Efsaneya Kurdî

Efsaneya kurdî wekî her efsaneya miletên dîtircurên xweyên taybet hene, çunkî efsane babetekê kevin û aloze û ya peywendîdare li gel hemî babetan wek ayîn, zanist, mêjû, hwd.Vekolînên cuda cuda li ser hemî babetan biefsaneyêve dihêne encamdan, jiber vê çendê bûye eger ku çend curekan jiefsaneya kurdî dest nîşan bikeyn: MewludİbrahîmHesendinama xweya masterê da li ser deh (10) curên bivî rengê li xwarê disekinît:

[164] Xoşnaw, Ferhad Ezîz, efrandin û mirdin le efsaney kurdîda, r.18
[165]Hesen, Mewlud İbrahîm, Geran Be diway Nemri le Felsefey Kurdi û Farsi da, r.18.

1. Efsaney Xwedawendî
2. Efsaney Dildarî
3. Efsaney Palewanyetî
4. Efsaney Jinxwastin
5. Efsaney Geran be Diway bext
6. Efsaney Geran be Diway nemirî
7. Efsaney Ser dozî
8. Efsaney Afirandin
9. Efsaney Giyanleberan
10. Efsaney Lafaw[166]

Şivan Cercîs dinama xweya masterê ya bi navê *Erk û Regezên Efsaneyê di Çar Romanên Devera Behdînanda*curên efsaneya kurdî bi vî rengê li xwarê dabeşdiket:

1. Efsane jilayê felsefîve dibîte du cur: efsanegeriyalidûv bextîda û efsanegeriya lidûv nemirî da.
2. Efsane jilayê civakîve dibîte du cur: efsaneyên jinxwestin û efsaneyên dildariyê.
3. Efsane jilayê siruştîve dibîte du cur: efsaneyên lafaw û efsaneyên giyandaran.
4. Efsaneyên Xwedawendan.
5. Efsaneyên Palewanan.
6. Efsaneyên Egerî[167]

**1.11. Efsane û Hozan**

Hozanî peywendiyeka mukim û bihêz heye li gel efsaneyê. Herduyan giringî bo yek û du heye[168], çunkî“şiir beşêkî edebe û edebîş liqêkî keş û gulî hunere emeş peywendi yekî behêz legel efsane mîlîekanda heye, bûye gelî le rexne girekanî edebî hawçerx lew bîr û rayen ke şîir û efsane peywestiyekî behêz yan le nêwanyanda heye, herdu kiyan le bineretda deçne we ser yek serçawe.”[169]Efsane di wî demî da peydabûye ku mîletan nek bihizira asayî, belkîbi wênê şiîrî hizir kiriye û ditiştê gehiştî ye.[170]Peywendiya dinavbera efsane û şiîrê da jiber ku xala herî girîng

[166]Hesen, Mewlud İbrahîm, Geran Be diway Nemri le Felsefey Kurdi û Farsi da, r.19 - 20-21.
[167] Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.31.
[168] Heman Jêder, r.50.
[169]Şareza, Kerîm, efsane le şî'rî hawçerxî kurdîda, çapî yekem, berêweberayetî çapxaney roşenbîrî, Hewlêr, 2005, r.13.
[170] Alî, Marof Mohamed, efsane û hozan,L 65.

e di nav şiîrê da, şiîr derbirînê ji xeyalê diket, mirov seretayê bê desthilat bû liberamber bûyerên jiyanê.Jiber bêdesthilatiya wî hizir û bîr û xeyala xwe tijî dikirbiefsaneyê û “her le kewnewe babete efsaneyekan kerestek serekî şî'r bûne.”[171]

Jiber wê peywendiya dinavbera efsaneyê û hozanê da heyî hindekjivekoleran hozanê bi mîratê efsaneyêdatînin û dibêjn “hozan kurê rasteqîn yê efsaneyê ye”[172], derbarey vê peywendiya dinavbera efsane û şiîrê dahindekbîr û boçûnên vekoleran wergirîn:

*Vîktor Şloviskî*dibêjît efsane “şêwey yekemî şî're”

Vekolerê Elmanî *Olandid*ibêjît“ewe tenya şa'îrekan detwanin bi şêweyekî rast le efsane biken”[173]çunkî her şa'îrekê li dûv hizr û bîrên xwe û xeyala xwe efsane dinav şiîrê da bikarînaye.

Romannivîsê kurd Bextiyar Elîdibêjît“ efsanebo şiîr giring eçunkî efsane heman şêwey ew çawe mîtolociye çawî seretaye, çawî mirove ber le lojîk û logus û hêzekanî tir kewntir olî biken”[174]

Vekolerê İtalî *Ciyam Bavîku* dibêjît“efsane cure zimanêkî şi'îriye, take zimanêke ke mirov destî beserîda deşkêt le hengawekanî pêşkewtin ûserhildanî seretayî xweyda.”[175]

D. Fadil Ebdulwahîd Elî dibêjît“efsane qeêydeyekî şiîrîye be şêwazêkî zorberz helbestirawe, le barey sîfetekanî xwedawendu karîgeriyekanî dedwê, bebê gwêydane hîç berbestêk lepabendibûn bekat û şiwênêkî diyarîkiraw.”[176]

Zanayê sosyolocî *Fîgu*dibêjît“endîşe û şiîr ji yek cudanabin, li dûv bîr û bawerên wî şiîr û efsane berhemê endîşeya mirovî ne û hozanvan û dahênerê efsaneyê di cîhanekê da dijîn û xwedan yek cure behre ne”[177]Şaîr û danerê efsaneyê hewil diden ku efsane bi şêwazekê ku digel civakî biguncît û herwesa bi guncînin digel yasayên siruştî.Eger temaşayaefsaneyên destpêkê biken dê

---

[171] Hewêz, Bêrîvan Samed, Rehendî Efsaneyî le Şî’rekanî (Newzad Rafet) da, nama masterê, kolîja adabê, zankuya Selaheddîn, Hewlêr, 2004, r.10.
[172] Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.50.
[173] Heman Jêder, r.50.
[174] Hesen, Mewlud İbrahîm, Geran Be diway Nemri le Felsefey Kurdi û Farsi da, r.9.Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.50.
[175] Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.50; Sabir, perîşan xald, r.80.
[176] Sabir, Perîşan Xalid, rehendî efsaneyî le r.awkî kurdewarî da, r.80.
[177] Heman Jêder,L 78; Ebdulrahman, Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.50.

bînîn ku hewil ya day nêzîkî dinavbera hevdijiya û herwesa peydakirina hawkêşa hevrikîya dinavbera başî û xirabiyê de.”[178]

Wesa diyardibît ku hozanvan û efsane di yek cîhanê da anku dihev serdemê bûn, çunkî“efsane dicîhaneka pirî şiîrî da peydabûye.Ji berku neteweyên destpêkê bi tenê hizir di şiîrê da dikir û behs liefsaneyên wê dikir.”[179] Bo nimûne destanên Homerî Elyade û Odîsa, Şahnameya Fîrdewsî, Şirîn û XesrewaXanay Qubadî.[180]Dinav van nimûneyandamifa ji remz û hêma û kerestên efsaneyê dihate wergirtin dişiîrê da.Her hozanvanekê lidûv xeyalaxweefsane dinav şiîrê da bikarînaye, jiber armanc ûmeremên xweyên taybet û giştî. Ya diyare ku herdu wêneyên efsaneyî û şiîrî pêk dihên ji hêmayên derbirînê.Herwesaastarewşenbîriyaefsaneyê di heman asta şiîrêda ye, anku wekî şiîrîberhemeke ne bi tenê derbirînê, jibabetekê diketbelkî rihê didete babetekî anku tiştekîû diafrînît û bi rih dêxît.”[181]

## 1.12. Hinek Mînakên Efsaneyî diNav Şiîra Kurdîda

1 – Şiîra klasîk:

Melayê Czîrî

“ dêwê mel'ûn û minafiqê xwedê rû reşkirî

Mabebala hilkîşîtin 'aqîbet çî bit selab

Ehremen te'îmdabû ebyezî dest tê hebû

Purbi vê te'lîm û rayê hat bû çû bû xîtab”[182].

2 – Şiîra Nû

Dilzar

“zorî nebird em dîmene

[178]Ebdulrahman ,Şivan cercîs, Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.50.
[179] Dawd, Enîs, Al-Astore fî Al-Şa’ri Al-Arabî Al-Hadis, r.41.
[180] Ebdulrahman, Şivan Cercîs Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanê, Devera Behdînanda, r.51.
[181] Eliksîl, Wesîf, Felsefet Al-Astore, r.112.
[182] Şareza, Kerîm, efsane le şî'rî hawçerxî kurdîda, çapî yekem, berêweberayetî çapxaney roşenbîrî, Hewlêr, 2005, r.20.

serxweşî em Ehrîmene!

Ahûremezdayî Mîhreban

xweway çakew rûnakî û jiyan

Hat û(ehrîmen)î bezan

Nêrûy şerr û şûmî şikand”[183].

3 – Şiîra Nûxaz:

Şukirî Şehbaz

“di vê jurêve sîtafik bi dîwaranve diyar nabin

Tevinpîrk jiber dûkêla cigara bibanî ve yêt

Hatîne qinarekirin

Perdêt pencera û dîwarêt rûs

Jisermada xwe têk werdiken

Şev leşekê mirare diçavêt mn da

Li kujiyê he.......

...... Ev jure sindirîka hizrêt mine

Eve çi xewnin ez dibînim?!

Spêdê radibim serûçavêt min yêt bûyîne dîwar

Dergeh dêwekê birsî ye leşê min dixwet

Asinêt pencera marin leqa didanemin”[184]

---

[183]Şareza, Kerîm, efsane le şî'rî hawçerxî kurdîda, çapî yekem, berêweberayetî çapxaney roşenbîrî, Hewlêr, 2005, r.45.

**BEŞA DUYEM**

## 2. Serhildana *GrûpaNûkirin Her û Her*li Devera Behdînan

Piştî karesata sala 1988an anku kimyabarana Hilebçe û reva bi milyonan xelkê Kurdistanê bû egerê guherînan li ser jiyan û hizra xelkê.Pirsyar û goman li def xelkê peyda bûn.Livêrê hizra xelkê hate azrandin, çunkî hizir û dîtina xelkê hate guhertin bo hizir û dîtineka avaker.

Piştî raperîna bihara sala 1991êguherîneka mezin bi ser rewta rewşenbîrîya kurdî bi giştî devera Behdînan bi taybetî diwar ê hunerî û edebîda hat[185], nexasma piştî hilbijartinên perlamenoya Kurdistanê û danana hikûmeta herêma Kurdistanê û dest bi karkirina wê.[186]Di vî serdemî da hizra rewşenbîrî ji salên berî raperînê li deverê berfirehtir û kûrtir lêhat, çendîn kovar û rojnameyên rewşenbîrî, hizrî û siyasî derkeftin.[187]Vê qonaxê werareka mezin di biyavê rojnamevaniya devera Behdînan da peydakir.[188]Rewşeka nûtir ji bo azadiya ragehandin û rewşenbîriya hemî netewekî, olekî û îdeolojiyekê li Başurê Kurdistanê hate pêş[189], çunkî her miletek di werara xweda çendîn hejandin vê dikevin, her hejandinek jî daxbarî û karîgeriya xwe li ser wî civakî heye ku dibîte egera guherîna çendîn îdîyem û jêderên hizrî dinivîsa wî miletî da. Ewdibîte egera hindê ku hejmareka nû ji erkên ku pêdivî biencamdanê hene û bikevne hember

---

184 Şehbaz, Şukrî, kevalekê Riws, çapa yekê, ji weşanên yeketiya nivîserên kurd – Dihok, çapxana Hawar, Dihok, 2005, r.49.

185 Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla: Hozana Nîxazî li devera Behdînan, çapa yekê, çapxana wezareta perwerdê/Dihok, 2005, r.79.

186Badî, İsmaîl, govara Nîxazî merem ji derkeftina wê çi bû, govara Peyv, jmare (7), bhara (1998), r.64.

187 Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla: Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 79.

188 Ehmed, Yasîn Ehmed, binemayên rexneya edebî di rojnamevanya devera badînan da, çapa yekê, çapxana Xanî, Dihok, 2015, r.34.

189 Hîto, Erşed: Dadayizm di hozana Nîxaza kurdîda, çapxana Hewar, Dihok, 2013, r.112.

wî.[190]Miletê me tuşî hejandinên mezin û giran bûye, ew hejandinin yên ku bi egera rabûna serhildan û şoreşa bi civakî dikevin û dibine egera guherîna bîr û boçûnên qonaxa berî rabûna wê serhildanê yan şoreşê.Ev hejiyane hemû civakî pêkve û bi hemû neweyên xwe dihejînît û berev qonaxeka nû dibet ku digel hindê hejmareka erkên nû serhildidetî[191]Muhsin Qoçan derbareyê wê hejandina dinav miletê me da peyda bûyî dibêjît: "li gor dîtina min hejiyanên mirov li ba me peydabûyîne wek komkojîya bi çekê kîmyayî, herifîna bawerên tundên çeprew berev navinciyê, rûxyana yekîtiya soviyêtî, serhildana pîroz, mişextibûna milyonan, peydabûna deverê tenê digel nîv serbestiya dever têda, şerê navxweyî. Van hejiyanan mirov karkiriye li ser rengê hizirkirinê û jiyanê û dîtina kesanî û bajêrvanyê, van hejiyana layekê mirov ji şêwê hizirkirinê û jiyarê rûxandiye û kartêkirina wan dê bimînît bodemekê dirêj, çunkî kerxa mêjûya kurdî pê hatiye veguhastin. Her ev eger bûyîne paldereke dijwar digel gehiştina hizrên cîhanî qada hunerê kurdî hejandîn bi dijwarî û pêleka berhemên nû ketîn gore.[192]Hejîneka mirov bû bi ser hemû layenên jiyana takê kurdida hat li başûrê Kurdistanê û bûye egerê gorankariyên mirov li warê cura bi cur jiqonaxekê berevqonaxeka dîtir çû.[193]Van rûdanên diqonaxa piştî serhildanê da xuya bûyîn, karîgeriyeka mirov li ser takekesê kurd hebû û karîgeriyeka mirov li ser hest û naxê hizra kurda kir.Dîtin û hizra xelkê hate guhertin, ji berpabûna vê serhildanê çendîn ciyawazî û milmilanê li nav civakê kurd da peydakir. Ji encamê vê hejandina mirov û giran û serhildanê li Kurdistanê, gurankariyên mirov peydabûn, çi ji layê siyasî, aborî yan rewşenbîrî û bi taybetî ji aliyê rewşenbîrîve gurankariyên rê û rêşal bi serdahatin. Ew jî ji encamê wê azadiya derbirînê û berifirehbûna biyavê çapkirinê, sansora kevin ji navçû.Ev jî bû rêxweşkerek ku edebiyat bi giştî û hozan bi taybetî guherîn bi serda bihên û ji peykerê kevin derkevît û şêwazên nû hatine praktîk kirin.[194]Hozana kurdî li devera Behdînan berev pêş çû, afirandin zêde bû, hozana rexneyî cihê xwe dît û şiyanên hozanvanî pitir diyar bûn.[195]Piştî serhildanê, edebiyata kurdî bi giştî û hozan bi şêweyekê taybet berev qonaxên geşve çûyîne.Qonaxên formê kevin û hizir, darêtin û avahiyên kevin red kirin. Ew bûne egerên dirustbûna pêleka nû di biyavê şiîrê da, anku şaîrên kurd şiyan şoreşekê li ser binema û têgehên kevinên şiîrê biken. Ev jî kiryareka erênî bû ûşiya nifşekî nû û

[190] Findî, Emîrê, livandna 'Eqlê kurd berev xandneka rexneyî, govara Metîn, jmare(71), kanuna yekê, 1997, r.33.
[191]Heman Jêder,L34.
[192] Qoçan, Mihsin, mijdarî di hunerî da, govara Peyv, jmare (14),(15), 19/6/1997, Dihok, r.6.
[193] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), nama masterê, kolîja perwerde, zankuya Dihok, 2005, r.12.
[194] Ebdulkerîm, Ebdulqadir Nurî, yaxîbûn di nav hozana Nîxaza kurdîda, nama masterê, kolîja adabê zankuya Dihok, 2008, r.37.
[195] Kovlî, Selman, hozana evru, govara Metîn, jmare(25), çiriya yekê, 1993, r.26.

berev semteka nû ya hizirkirinê ve bi bet.[196]Li dor çewaniya serhildanê Mustefa Selîm dibêjît: “serhildanê guherînên mezin di nav civaka meda kirin, çavên miletê me vebûn, lewra me viya em jî guherînekê bikin, piştî hingê tiştê nû peydabûn lewma alavên me jî hatine guherîn da em bişên serederiyê digel kawdanekê nû bikin.”[197]Serhildan bû egerê hindê ku hizir û dîtin û tiştên nû ji dayik bibin di nav civaka meda.Muhsin Qoçan dibêjît: “serhildan ne tiştekî bi sanahî bû, peqîna mirovê kurd bû jibinê piya heta klovankê serî û rizgarbûna wî ji kîmyayê, ji enfalê, ji kuştinê û zulmê û ji girtinê. Paşî reva mezin û vegeriyan û dîsan bo bajêran roxîna Soviyeta Kevin û ev hejiyanêt mirovê kurd welê kir ku li xwe bigerît û xwe binasît.Têgehiştin, bîr û boçûnêt miletê kurd hatine guhertin, lewma wan diviya derbirînê bi rengekî nû, bi zimanekî nû biket.”[198]Ev nûbûn û guherîn bi sanahî yan ji valatîyê nehatîne, İsmet Mihemed Bedel dibêjît: “serhildana me, peqînek bû, ketiye nîv rejîmeka faşîst û encamê vê peqînê da Kurdistana me li jêr destê wî faşîstî derketiye û demokrasiyek lê peydabûye ta radeyekê serbestiya ramyarî û serbestiya rojnamenivîsînê heye.”[199]Hetaberî serhildanê miletê me miletekê li bin dest bû, lê piştî serhildanê her takekesekî kurd bayê azadiyê hilkêşa. Emîr Findî dibêjît: “ belê rewş ku piştî serhildanê derket, çavê ronakbîrên kurd vekirin.”[200] Serhildana Adara 1991ê wergeryanek bû di hemî alên jiyana gelê kurd da, lewra nivîskar ji her kesên dî pitir têhnîyên azadiyê ne, her zû dest bi bizava xwe kirin.[201] Piştî herêma Kurdistanê bayê azadîyê hilkêşay, biyavekê berfirehtir û kûrtir bo rewşenbîriya kurdiyê vebûye.[202]Ew bizava rewşenbîriya deverê hindek ji rewşenbîr û hozanvanên beşdar di kovara *Dengê Me* ya salên heştêyanda şiyan kovareka edebî hunerî li jêr navê *Nûxazî* liDihokê derbêxin.Ev kovar piştî raperînê wekî yekemîn kovara rewşenbîrî hunerî dihête hejmartin[203], çunkîkovara *Nûxazî* liDihokê li demekî wesa derkeft ku çikovarên rewşenbîrî û hunerî liDihokê nebûn.[204]Derbareyê derkirina kovara Nûxazî da Hizirvan Ebdulla dibêjît: “piştî serhildana sala 1991ê, zivirîn ji çiya û koça milyonî ya xelkê, me meydan vala dît ji rojname û kovara, çikovar û rojname nebûn, lewra me jî bîr li wê çendê kir ku dergehekî vekin, dengê xwe

---

196 Nimettulla Hamid Nehêlî: deravek ji rexnê Nûkirin Her û Her ji blindahyê berev gurê, govara Peyv, jmare(51), 2009, r.4.

197 Selîm, Mustefa, hev Peyvîn, govara Gazî, jmare(46), 1998, r.38.

198 Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, govara Gazî, jmare(46), 1998, r.38.

199 Bedel, İsmet Mohamed, hozan û kawdanên wî, govara Serhildan, jmare(2), r.48.

200 Findî, Emîr, Serhildan nêrîneke din, govara Biyav, jmare(2), r.85.

201 Bedel, İsmet Mohamed, kurtiyek r.dor pêşdaçuna kurte çîrok û rumanê li devera behdînan, govara Peyv, jmare(33), r.24.

202 Hîto, Arif: hev Peyvîn, govara Karwan, Dihok, r.44.

203 Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan , r.79.

204Badî, İsmaîl, govara Nîxazî merem ji derkeftina wê çi bû, govara Peyv, jmare (7), bhara (1998), r.66.

bigehînîn.Em heval pêkve kombûn û rûniştîn, me hizir li wê çendê kir ku grûbekê dirust biken ji bo dengê xwe têda belav biken. Lê li despêkê em pêkve kombûn çi nav bidanîn li ser grûpê, gelek nav hatine danan, yek ji wan nava, yên ku temamkerê Dengê Me bît, belê ji ber ku komeka hevalên nû hatibûne digel me,di nav grûpê da razî nebûn, lewra ji koma navên hatîne diyarkirin ev grûpe ku Nûxaze û navê kovarê bibite Nûxazî.[205]Ku wate serhildana kovara Nûxazî ji dayîkbûna kar û çalakiyên berî serhildanê ye.Mihsin Qoçan dibêjît: "li salên heştêyan Nûxazî li dev min hebûye min şiîrên Nûxazî dorist kirin"[206]bo nimûne Hilweşyan Yek, Hilweşyan Du, Hilweşyan Sê, li sala 1987an ku bi yekemîn hozanên Nûxazîyê li devera Behdînan dihêne hejmartin.[207] Her wesa Mihsin Qoçan dibêjît: "anku ew pêngavên me havêtîn li salên heftêyan û heştêyan bigire jigrûba Torevanên Genc li sala 1980yî û paş koma kovara Dengê Me li sala 1984an û paş yana hozanê di nav yeketiya nivîseran da li dawîya heştêyanda.Li sala 1987an belavkirin ew pêngavên me havêtîn bû eger û rêxweşker, em hizir li wê çendê bikin ku grûbekê pêk bînîn, nexasme piştî serhildanê rewşenbîriya me berev astekê baştir û geştir çûye lewma me ev grûp pêk îna û ji pêkînana vêgrûbê ew pêngavên berî serhildanê bûne hêvên û binyatek bo Nûxazîyê.[208]Wate li dûv axivtina hindek hozanvanan berî serhildanê Nûxazî li dev hozanvanên devera Behdînan hebû, lê bi şêweyekê takekesî bû.Piştî serhildanê hizir li wê çendê hate kirin ku hozanvanên devera Behdînanxwe bikene yek û kovarekê bi şêweyekê komî dirust biken, ewjî kovara Nûxazî bû.Yekemîn palder bo nêzîkkirina hozanvanêt devera Behdînanda ew bû ku li salêt heştêyanda hozanvanêt deverê digel hindek ji rewşenbîr û edeb dostêt Behdînankovarek li jêr navê Dengê Me derêxistin û çendîn hozanêt wan têda hatîne belavkirin.[209]Baştirîn zemîne boNûxwazîya kurdî diqonaxa piştî serhildana bihara sala 1991ê bi şêweyekî baş dest pêkiriye. Kovara Nûxazîkovara devera Dihokê bûye, vê kovarê xwe bikovareka edebî û hunerî daye nasîn.[210]Kovara Nûxazî yekemîn hewl û bizavên hizirmend û rewşenbîrên Nûxazî yên devera Behdînaneku bi şêweyekê komî, bêyîku grûbekê pêk bînin beşdarî di vêkovarê da kiriye û babetên hizir û hozanên Nûxazîyên xwe têda belav kirîne.[211]Ev kovar bûye dergehek jibo belavkirina berhemên edebî yên cur bi cur.[212] Nûxazî wek pêdiviyek derket û gazîyek bû

---

[205] Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 30/12/2016.
[206] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, gulxana dana, Dihok, 23/1/2016.
[207] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 79.
[208] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, gulxana dana, Dihok, 23/1/2016.
[209] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 77.
[210]Hîto, Erşed, Dadayizm dhozana Nîxaza kurdîda, r.112.
[211] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 79.
[212] Ebdulkerîm, Ebdulqadir Nurî, yaxîbûn dnav hozana Nîxaza kurdîda,L37.

bonivîsevanêt nîştimanperwer ên di kawdanêt nexweşiyê û bertengiyê da bo gelê xwe nivîsî û êş û janêt wî hilgirtîn û kirine nîvişkê berhemê xwe.[213] Di ser gotara hejmara yek ya kovara Nûxazî da Nûxaz dibêjin: "serhildana gelê me û derketina bi milyonan xelkê me mezintirîn rûdan bû dijiyana wîda ku ewberev qonaxeka nû bir. Lewma em jiyanek nû dixazîn, lew em pêdivî hizir û bîrên nû ne, pêdivî bi edebekî nû ne."[214]Desteka nivîserên kovara Nûxazî şiyan tenha sê jimara ji vê kovarê derbêxîn ku jimara yek li sala 1991ê, dûmahîk jimare li sala 1992yan derkeft û hate rawestiyan û ragirtin, jiberku di wî serdemî da serûberê aborî yê Kurdistanê yê aloz bû û xerciya kovarê jî li ser milên desteka nivîserên kovarê bû û barûdoxê wan yê aloz bû, hîç layenekî jî harîkariya wan ya madidî nedikir, lewma neşiyan berdewamiyê bidenê û kovar hate ragirtin.[215]

Li dor ragirtina kovara *Nûxazî*, Hizirvan Ebdulla dibêjît: "ji ber barê aboriya tengya hevalan em naçar bûn harîkariyê ji partiyên kurdî bixazîn, ew parê partiyên kurdî terxankirîn bogrûbî wek harîkarî paşî hatine birîn û harîkarî nema, me jî kovar ji ber barê abrî rawestand.[216]Desteka nivîserên kovarê ji van nivîseran pêk hatibû Selman Kovlî, Şukirî Şehbaz, Hizirvan Ebdulla, Celal Mistefa, Muhsin Qoçan, Muhsin Osman, İsmaîl Badî, Seîd Dêreşî, İsmaîl Mistefa, Hekîm Ebdulla, Necîb Salih Baleteyî."[217]

Piştî rawestana kovara Nûxazî li devera Behdînan li sala 1992yan her nivîsîn û xwendin û hizrên Nûxazîyê diberdewam bûn, çunkî berdewam guherîn bi ser  warên jiyanê da dihatin, nexasma piştî serhildanê jiyan ji keviljankê xwe yê kevin derket û berev nûbûnê çû.Lewra berdewam nûkirin peydadibûn ji encamê wan guherînan hozanvan û nivîser û rewşenbîrên devera Behdînan hatibûne azrandin.Ji bo gihandin û hizrên Nûxazîyê ranewestiyan û berdewamî dan ji bo hizrên nû û berdewamîdana xebata wan bûne hêvên û binyatek ji bo projekê nûtir ew jî grûpaNûkirin Her û Her jidayik bû.

### 2.1.Grûpa Nûkirin Her û Her

GrûpaNûkirin Her û Hergrûpeke Nûxaze, li sala 1994an li bajêrê Dihokê peydabû.[218]Serhildana GrûpaNûkirin Her û Herji encamê kar û xebata berdewam ya hozanvanên

[213]Badî, İsmaîl, govara Nîxazî merem ji derkeftina wê çi bû, govara Peyv, jmare (7), bhara (1998), r.67.
[214] Govara Nixazî, jmare (1), Dihok, 1991, r.5.
[215] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 80.
[216] Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, baregayê govara Metîn, 18/1/2016.
[217] Ridênî, Wesfî Hesen, rojnamegerîya devera behdînan 1950 – 2005, çapa yekê, Dezgehê Spîrêz yê çap û weşanê, çapxana hacî haşm – hewlêr, 2006, r.51.
[218] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor: ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin  Her û Her), r.139.

devera Behdînan li ser Nûxaziyê û ew kar û çalakiyên berî serhildanê encamdayîn û zêdebarî ew azadîya ji verêja serhildanê berpa bûyî.[219]Piştî ku berfrehiya rewşenbîriyê li herêma Kurdistanê, piştî raperînê hejmareka zor ya kovaran û rojname û pirtûk û namêlke û dîwanênşiîri û çendîn senterên nû li bajêrkên biçûk dirust bûn û azadîya derbirîna bîr û boçûn û reyên rewşenbîran[220]bûne hêvênê jidayikbûna grûpa Nûkirin Her û Herê.

Li sala 1994an piraniya wan hewildanên di navbera salên 1984 – 1988 ji layê hindek hozanvananve hatîne kirinji bo nûjenkirina hozanê. Ji layê ruxsarî û naverokê ve ew hatine guherandin û rêkxistinagrûpekê bi navê Nûkirin Her û Her li devera Behdînan alayê vê guherînê hilgirt[221], Hizirvan Ebdulla dibêjît: " ew hevalên grûpaNûkirin Her û Her pêk înayn, her ew heval bûn ewên, ku berî serhildanê û piştî serhildanê, berî gİropî karên wan berdewam bûn Di nûkirinê da, lewma me li sala 1994an ala vê guherînê hilgirt lewma jî em dibêjîn grûp ne ji valatiyê hat û tmamkirina bizavên berî xwe bû"[222].

Danan yan peydabûna her grûpekî yan bizavekê diwarê rewşenbîrî da mebest û armancên xwe yên hene, anku hindek hizrên nû û cuda ji yên kevin yan jî perdekirina wane yan jî retkirina yên kevin û binaxkirina wî yan jî nûjenkirina tiştê kevin û hilbjartina yê çak û nîşandana wî bi selîqek û şêwazekê nû ku liûv nerît û hizrên nû biguncin hene.Li vêre jî pêdivî ye ji bîr nekeynku barên civakî û siyasî û aborî û hizrî kartêkirineka mirov divî warî da diken. Ev guherîne di warê hozanê da jî sîmayên xweyên heyn, ku karî li layenê roxsar û naverokê diken bi rêka belavkirina hizrên nû û dahênana formekê cuda û dariştina wan babetên hozanê, grûpa Nûkirin Her û Her yek jiwan grûpane ku erkê vê guherînê bi stûyê xwe ve girtî. ev Grûpe jiMihsin Qoçan, Fadil Omer, Şukirî Şehbaz, Arif Hîto, Selman Kovlî, Hizirvan Ebdulla pêk dihat.[223] Ebdulrehman Ebdulxefur dibêjît: "livînî Nûkirin Her û Herweku livînêkî edebî behêz peydabû, be curêk welamî pirsyarekanî serdemî xwey bidatewe û çetirêkî nûwêxwazi bêt, ke bitwanêt gorankarîyekan le xwe bi girêt û bîr kirdinewey taze legel xwey bênête arawe, Nûkirin Her û Herşileqanêkî mirov bû lenaw dunyay çeqbestûy edebî behdînî da."[224]

---

[219] Hîto, Erşed: Dadayizm dhozana Nîxaza kurdîda, r.139.

[220] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 83.

[221] Hîto, Arif, xwandnek (zmanê sêyem kanê ya Her û Her nuykirnê) da, govara byav, jmare(7), payza 2001, r.153.

[222] Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 27/12/2015.

[223] Ebdulkerîm, Ebdulqadir Nurî: yaxîbûn dnav hozana Nîxaza kurdîda, r.37.

[224] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor: ezmunî Nîxazî, la ay şa'îranî li vînî (Nûkirin Her û Her), r.18.

### 2.1.1. Navkirina grûpa Nûkirin Her ûHer

Derbareyê navê Nûkirin Her û Herê Hizirvan Ebdulla dibêjît: "Nûkirin Her û Her di ramana xweda, anku nûkirin berdewame dijiyanê da û bê rawestiyan nûkirin peyda dibît, lewma berî me jî berdewam guherîn hebû her wekî me gotî,grûpa me ne ji valatiyê peydabû û Nûkirin Her û Her ne ji valatiyê hat, çunkî ew hevalên grûpaNûkirin Her û Her hemîyan bawerî hebû ji çinehiyê çi peyda nabît û em temamkerên berî xwene, eger em edebiyata kurdî behs bikin her ji Baba Tahirê Uryan (Hemedanî) heta Cizîrî û Xanî û qonaxa em têda bûn hemî paşxana me bûn.Eger em edebiyata cîhanî bigirîn, her ji dastana Gilgamêş heta roja em têda bûn, hemî paşxana mebû ji ber vê egerê jî me çi navên dî wekî Nûkirin Her û Her) baş nedît bo bizava xwe, lewra me navê bizava xwe kire Nûkirin Her û Her.[225] Hozanvanên devera Behdînan mefa û serbor û serhatî jiedebiyata meya kurdî ya klasîk û edebiyata cîhanî wergirtîne, lewma navê Nûkirin Her û Her li xwe kirin. Mihsin Qoçan dibêjît: "berdewam di jiyanê da tişt çê dibin, diborîna demî da digel pêşkeftinê dihêne xwarinan guherîn û jiyan pêdivî bi nûkirinê dibin û her tiştek dibîte nûkirin bo nûkirineka dî û bawerîya me bi nûkirinê heye, lewma jî her tiştê nehête guherîn bo nûkirineka dî, dê bîte veman. Em dibêjin rawestiyan mirin û paşveman e, lewma me nav kire Nûkirin Her û Her, anku berdewam nûkirin."[226]Nûkirin Her û Her anku bê rawestiyan nûkirin di zikê kevinda jidayik dibît, Fazil Omer dibêjît: "navê grûpê ji baweriya endaman peyda bûku prosesa jiyanê guherîneka berdewame û heger guherîn nebît, jiyan dê rawestît, ewa hey jî dê mendibît paşî dê genî bît. Her û Hernûkirin yan Nûkirin Her û Her, anku jiyan, çunkî prosesa jiyanê guherîn û nûkirineka berdewame û hemereng û seranseriye li ser saman û berhemê hemîyê, nerawestîn nejî parçekê deqî digirt. Bivê dîtinê çavlêkirina prosesa çînên jiyanê bixweye, hem liser kulturê ve avabît, hem di pêvajoya xwe da didet û distînît, anku di karlêkeka berdewam daye, di nav xweda û gel dormandorî, lewra me Nûkirin Her û Her bi nav kir"[227] endamên desteka grûpê bawerî bi nûkirinê hebû lewma ev nav li xwe kirin.

### 2.1.2. Hizra Danan û Pêkanîna Grûpa(Nûkirin Her û Her

Sebaret kesayetiyê serekî di hizra danan û pêkanîn grûpaNûxazî Nûkirin Her û Her bîr û boçûnên ciyawaz hene lidef kesayetiyên beşdar di vê grûpê daku bi tenê Mihsin Qoçan xwe bi kesê serekî di hizra danan û pêkanîna vêgrûpa dadinît, lê yêt dî dizivirîne ve bo encamê pêkve rûniştin, danûstandina û akamê wê hizreka komî ye.HerwekîMihsin Qoçan jî dibêjît: "destpêka

[225]Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, bingehê govara Metîn, Dihok, 29/12/2015.

[226] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, bingehê govara Metîn, 30/1/2016

[227] Omer, Fadil, hev Peyvîn: li baregayê kenalê Waar, 15/2/2016.

hizra danana vê grûpê ji min bûye û ez serkêşê serekî yê vê grûpa Nûxazî me, çunkî min daxaz ji hevalan kiriyeku pêkve kom bin û grûpeka Nûxazî diwarê hozanê da pêk bînîn û her wesa pitir ji hemîyan min kurs û semînar li ser hewl û bizavên meyên nivîsîna hozana Nûxazî dane xuyakirin."[228]

Her wesa navbirî dibêjît: "li sala 1994an min semînerek li ser hozanê xwend, elmintû teknîkên Nûxazîyê min behs kirin. Grûpê wek danûstandin û nivîsîna xalên giringên hevpişk destpêkir."[229] Li dor şêwazê dirustbûna grûpê Arif Hîto dibêjît: "hizra grûpê ji layê hemî hevalên damezrêner ve dihate azrandin û gengeşekirin. Kesek destpêşxerê serekî nebû, lê rolê Mihsin Qoçanî digrûpêda berçavtir û gerimtirbû."[230] Mihsin Qoçan dibêjît: "li sala 1994an min semînerek li Peymangeha Hunerên Ciwan li Dihokê pêşkêşkirî, me hevalan biryar da ku rûniştinan bikeyn û grûpeka Nûxazî diwarê hozanê da pêkbinîn. Em rojane rûdiniştine xwarê û danûstandin dikirin li ser dirustbûna grûpê û me grûp çêkir.[231]Endamên desteka grûpê pêkve kar dikirin û pêkve hizir li wê çendê kirin ku giropekê dirust biken. Arif Hîto dibêjît: "destpêka hizra vê grûpê li zivistana sala 1994an bû, dema em pêkve li jûra yeketiya nivîserên kurd tayê Dihokê rûniştî bûyîn û me danûstandin li ser rewşa rewşenbîrî û hozana deverê dikir."[232]Wate hizra danana grûpê hizreka giştî bû ji layê endamên desteka grûpaNûkirin Her û Her, Hizirvan Ebdulla derbarê vê yekê de dibêjît: "karê me yê grûpaNûkirin Her û Her karekî komî bû, anku pitir giştî bûye, çunkî ew pêngavên me havêtîn berî damezrandina grûpê giştî bûn, her wesa ew hevalên grûpaNûkirin Her û Her ew heval bûn ku berî serhildanê û piştî serhildanê karên wan giştî bûn û ji encamî rûniştinên me û danûstandinên me pêkve bûn, ji bo damezrandina grûpê, lewra diyar nabît kakî xwedanê hizra danana vê grûpê ye."[233]Ji berku karên wan giştî bûn, ji ber vê yekê Hizirvan Ebdulla dibêjît: "em neşên kesê bi danerê grûpê danîn, çunkî karê me yê giştî bû, hizra danana grûpê zêdetir karekê giştî bû ne takekesî."[234] Herwesa navbirî dibêjît: "libihara sala 1994an êvarekê ez û Qoçan û Şukirî û Selman li ser doşekê bilindê baxçeyê yeketiya nivîseran rûnişitîbûn, D.Arif û D.Fazil jî hatin digel me, wê êvarê hizir li çêkirina grûpê hate kirin. Da rûniştinên me pitir dirêkxistî bin, peyva Her û Her Nûkirin jî ji aliyê Fazil Omerî ve hate

---

[228] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 83.
[229] Nehêlî, Nimetulla Hamid, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn), çapa yekê, çapxana Hawar, Dihok, (2013), r.14.
[230]Heman jêder, r.14.
[231] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, bingehê govara Metîn, 30/1/2016
[232] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 83 - 84.
[233]Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, baregayê yeketiya nvêseran, Dihok, 18/1/2016.
[234]Hîto, Erşed, Dadayizm di hozana Nîxaza kurdîda, r.139.

gotin.Kes bi tenê xwedanê hizrê nebû. Ev encamê wan bizavên pêştir û wî serûberê berî hîngê bû."[235] Şukirî Şehbaz dibêjît: " kesxwedanê hizra serekî nebûye, karê me hemîyan bû pêkve, li bîra min nîne heke yekî berî hemîyan behsê vê çendê kirbît."[236]

Şukirî Şehbaz şêweyê bi hevgehiştina endamên grûpê û navên wan bi vî rengî diyar diket: "Ev grûpe ji hindek kesa pêkhat, ku şêweyê hizirkirina wan nêzîkî yekbû, di wê qonaxê da, lidestpêkê Selman Kovilî, Şukirî Şehbaz, Mihsin Qoçan, Hizirvan Ebdulla digrûpê dabûn, piştî demekî ji nû Arif Hîto û Fazil Omer hatine digrûpê da.[237] Her wesa lidor hizra danana grûpê, Arif Hîto dibêjît: " her şeş endamên damezrêner bi hevra kar dikir û pêkve gehştibûne vê pirsyarê."[238]

### 2.1.3. Egerên Pêkînana Grûpa Nûkirin Her û Her

Serhildan û pêkînana her grûpekê, ji encamê rûdanan peyda dibît û kar û çalakî dibine hokar bo serhildana her grûpeke edebî û hizrî, nexasme piştî herêma Kurdistanê bayê azadiyê hilkêşay, rewşa herêmê hate guhertin û delîva azadiyê berfirhetir lêhat ji berî serhildanê. Ev bûne rêxweşker da hizir li wê çendê bihête kirin ku grûpekê pêkbînin ji bo vedîtina hizir û şêwazên nûtir di derbirînê da bihêne darêştin. Li devera Behdînan çendîn hokar hebûn bo serhildana vê grûpê, ew jî di van xalên li xwarê da xuya dibin:

1. Li sala 1992yan û piştî rewşa edebiyata kurdî li devera Behdînan di cihda mayî, çi nûkirin bi xwe ve nedîtîn, ji encamên barê ên siyasî û aborî hwd. bûcihê nerazîbûna hozanvanên devera Behdînan, çunkîjiyan guherîne û her tiştekê nehête guherînpitir nêzîkî mirinê ye ji saxyê. Lewra pêdivîye edebiyata mejî nû bibîteve û ji ya cîhanê paşve nemînît.[239]Piştî kar û çalakiyên hozanvanên devera Behdînan di cih da mayîn, edebiyata me beref nemanê çû. Hizirvan Ebdulla dibêjît: "ev rawestiyane bo cihê dilgranî û nerazîbûna me, nexasma piştî rawestiyana kovara me kovara Nûxazî li sala 1992yan qada edebiyata kurdî wekî gomeka avê rawestiyaye û herdema gomdirawestît pîs û genî dibît, mejî şilqek li wê gomê da, daku jiyaneka nû bihête demarên edebiyata kurdî."[240]Hemi endamên desteka grûpê di vê baweriyê da bûn. Mihsin Qoçan dibêjît: "Her rawestiyanek dibîte veman û berev mirinê

[235]Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, baregayê yeketiya nivêseran, Dihok, 18/1/2016.
[236] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.32.
[237] Nehêlî,Nimetulla Hamid, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn, r.15.
[238] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.32.
[239] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 84.
[240]Ebdulla, Hizirvan, hevPeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 3/2/2016.

diçît, lewma em pêdivî hejandinekê bûn ku li wê goma rawestiyay biden û wê ji mirinê berev zîndîbûnê biben."[241]Ev goma dicihda mayî hate şilqandin, çunkî berdewam guherîn bi ser jiyanêda dihên. Fazil Omer dibêjît: "Ji yan guherîneka berdewame, egerguherîn nebît jiyan dê rawestît, ewa hey jî dê mend bît û paşî dê genîbît, Her û Her Nûkirin yan Nûkirin Her û Her, anku jiyan çunkî prosesa jiyanê guherîn û nûkirineka berdewame, me weku grûp felsefeya xwe jivê binemaya sade wergirtbû."[242]

2. Piştî serhildana sala 1991ê jiyan hate guherîn, bayê azadiyê hate hilkêşan û jiyan berev astekê baştir çû.Serhildana 1991ê bû rêxweşker ji bo pêşvebirina kar û çalakiyên edebî, Fazil Omer dibêjît: "serhildan û pêşdaçûna civaka Kurdistanê û damezrandina saziyên neteweyî palderên bihêz bûn ku em tiştekî beramber û guncav li warê edebî pêşkêş biken."[243]Herwesa navbirî dibêjît: "grûpa me ji encamê prosêsekê bû ewproses jî grêdayî serhildanê û encamên wê bûn, me û gelekên dî bawerî hebû ku nabît serdemê berî serhildanê û piştî serhildanê weku yek bin, pêdivî ye armancên şoreşê piştî serhildanê bibine kar û berhem û em di navda bîn û pê bijîn."[244] Bi vê lerziya serhildanê, nemanayeketiya Soviyetê, azadbûna gel û axa me, bisanahî bidestxistina zanyariyan bi vebûna tuxîban û hatina pirtûkên berê yên qedexekirî bû.[245]Jiyan hate guherîn"bûnî çendîn hewl û diyardeyên em maweye ke hemûyan taybet bûn be damezrandinî şepolêkê nû, û Nûxaz lew dunyay edebî Behdînî da emane hemûyan wayan kird ke grûpêNûkirin Her û Her dirust bît.[246]
3. Dirustibûna grûpaNûkirin Her û Her ji encamê wan kar û çalakyên berî serhildanê û piştî serhildanê bûn, Hizirvan Ebdulla dibêjît: "re û rîşalên vê grûpê ji bo wan grûpên berî xwe diizivrin."[247] Fazil Omer dibêjît: "ew bizavên berî serhildanê hatîne kirin, endamên heman grûpê sê bizavên berî hîngê kiribûn, wekî lijneya berwext ya yekîtiya nivîserên kurd, Kovara ûxazî, rûniştinên yekîtiya nivîseran, ev bûne egerên pêkînana grûpa me."[248]
4. Şerenîxa berdewam hebûye li navbera mejiyê "Nûxaz" û mejiyê "kevneperest" destekên kevin xwe bi kevnatiyê ve girêdayîne û berevanî bi dijwarî jê kirîne û destekên Nûxaz

[241] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, bingehê govara Metîn, 3/2/2016
[242]Omer, Fazil, hev Peyvîn, li baregayê kenalê Waar, Dihok, 8/2/2016.
[243] Hisen, Ebdulrahman EbdulxaforM ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.18.
[244]Omer, Fazil, hev Peyvîn, li baregayê kenalê Waar, Dihok, 8/2/2016.
[245]Hîto, Erşed, Dadayizm di hozana Nîxaza kurdîda, r.140.
[246] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.19.
[247] Nehêlî, Nimetulla Hamid, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne wvekolîn), r.13.
[248]Omer, Fazil, hev Peyvîn, li baregayê kenalê Waar, Dihok, 8/2/2016.

berevanî ji nûyatiyê kirîne ûjiyar berev pêş ve paldaye.[249] Hizirvan Ebdulla dibêjît: “me xwe cuda dît ji wan kesên şoparêz (kevnepersit), anku kesên çavlêker û ji nûkirinê ditirisin, em di cuda bûn ji wan kesa ji ber hindê me berdewamî da hizrên xweyên Nûxaziyê û me grûpaNûkirin Her û Her pêkîna.”[250]

5. Endamên desteka grûpaGuherîn û Nûkirin weku binyatek û nasnamek bikarînaye bo darêştin û belavkirina berhem û hizrên xwe, lidor vê çendê Fazil Omer dibêjît: “bêyî nûkirin û havêtina pêngava bo pêşve nagehîne astê civakî yê civakên dî yên cîhanî.”[251]Hemû civakan pêdivî bi nûkirin û nûyatiyê heye, nemaze civakeke mîna civaka meya kurdî.[252]Arif Hîto dibêjît: “piştî her guherîneka bi ser civakî da dihêtin, têhizirîn û şêwaza jiyana wî jî dihête guherîn, bo nimûne li sala 1975anguherîneka berçav digotara sava ya rewşenbîrîya kurdîda, nemaze di hozanê da hatekirin. Herwesa piştî serhildana pîroza ya sala 1991an jî guherîneka yekcar nayab peyda bûku rehên guherîneka edebî di nav da şîn bûn. Ew li zivistana sala 1994angrûpaNûkirin Her û Her weku pêdiviyeka girîng hate diedebiyata kurdîda.[253]Ji vê yekê desteka hozana hevçerx, bi hizreka saxlem û hest bi berpirsatiyahizir û rêkxistinekê da kirku Nûkirin Her û Herbi bû yek ji erkên wê yên bingehê ta ku dawiyê grûpaNûkirin Her û Her hat pêkînan.[254]

### 2.1.4. Armancên Grûpa Nûkirin Her û Her

Endamên desteka damezrênerên grûpê dijî çavlêkirin û lasaykirinê bûn, Hizirvan Ebdulla dibêjît: “me lasaykirin û çavlêkirin û çavlêkirina hîç grûpekê nekiriye, ne grûpên Ewropî ne yên Erebî, belkîev paşmawê berhemê me yê xwemalî bû, ewê li salên 1970, 1980 û 1992yan hatiye encamdan. Her gava me çavlêkirin kir û lasaykirina kesekê kir ew nabîte nûkirin û dahênan, dahênan di vêt tiştekê nû bît,[255]“em dibêjne xelkê û nivîserî edebiyat ne bitinê edeba em dizanîn û hûn dizanin û erkê nivîserî ne ewe dubarekerê berî xwe bît, ji berku erkê wî dahênane û dahênanê biket û hindî em pêşda biçîn ne dûmahîke û pêngav hene hêşta biçîn.”[256] Herwesanavbirî dibêjît: “ne her tenê karê çavlêkirina biyanî em ret dikin, belê karê ji çavlêkirina xweyanî jî bigire heta karê çavlêkirina kesê xwe bi xwe jî ret dikin, çunkî armanc ew nebûye ku em mêjûya dibistaneka

[249]desteka hozana hevçerx: Nûkirin Her û Her, govara Peyman, jmare(7), r.4.

[250] Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 27/12/2015.

[251] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L 84.

[252] Ebdal, Ebdal Nurî, Nûkirin Her û Her, govara Peyv, jmare (23), Dihok, bhara 2001, r.16.

[253] Hîto, Erşed, Dadayizm di hozana Nîxaza kurdîda, r.14 .

[254] Ebdal, Ebdal Nurî, Nûkirin Her û Her, govara Peyv, jmare (23), Dihok, bhara 2001, r.16.

[255] Ebdulla, Hizirvan: hev Peyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 27/2/2016.

[256] Ebdulla, Hizirvan: hev Peyvîn, li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 18/1/2016.

Ewropî dubare bikinn, me diviya ji edebê kurdî serhildeyn."[257] Her lidor vê çendê Mihsin Qoçan dibêjît: "berhemên Erebî me yên xwandîn û me Nûxwazîya wan jî ya xwandî û me mefa ji wan wergirtiye, lê em çavlêkerên wan nebûn, Nûxwazîya me ji ya wan cudaye."[258] Herwesa Hizirvan dibêjît: "heke her ez hatim û min çavlêkirin kir û lasaykirina kesekî kir, li wî demî ew nabîte dahênan û afrandineka nû, lewma em di jî çavlêkirinê bûn."[259]

Hozanvanê nû anku Nûxaz xwe bixwendingeheka taybet ve girêneda, belkî mifa ji hemî xwendingehên edebî û honerî û nûtirîn zansit û pêzanînên cîhanî û keltorî û filklurê xwe û miletên cîhanê kir[260], Mihsin Qoçan dibêjît: "me Nûxwazîya Ewropî û Erebî ya xwandî û me mifa jê wergirtiye, lê çav li wan nekiriye,[261]lidor vê çendê rewşenbîriya me ya devera Behdînan, anku başûrê Kurdistanê bi giştî ketbû li bin karîgeriya zimanê Erebî, ji ber vê çendê xandin û nivîsîna me li wî serdemî pitir Erebî bûye, Ji ber hindê rewşenbîr û nivîserên me berhemên edebî yên Erebî xwendîne û mifa jê wergirtîne û pêzanîn ji hemî layan ve lidorxwe kom kirîne û mifa jê wergirtîne. Her wesa Hizirvan Ebdulla dibêjît: "kultura mirovayetiyê hemû yek e û dinya bi tenê ev bajêre nîne û kulturê mirovayetiyê gelekê mezine û em ji taybetmendî yê berev giştîbûnê bi çîn, em nawçeger nebîn û berhemê me di nawçegerî ya meda ne mirît û diruşmê mirovayetî biçespînîn[262]. Eve jî yek ji armancên grûpaNûkirin Her û Herku kultur û rewşenbîriya cîhanî bixînin û mifayê jê wergirin.

Armanca Endamên grupê Nûkirin Her û Herya herî girîng ew bû ku livîn û guherînekê bêxne li ser aqlê takekesê kurd, ji encamê wan nexweşiyan û zordarî û bindestîyê û reva milyonî û kîmyabarankirinê, aqlê takê kurd hatibû dagîrkirin û sûrdarkirin.Piştî raperîna bihara sala 1991ê herêma Kurdistanê bayê azadiyê hilkêşa, Mihsin Qoçan dibêjît: "van rûdanan mirovî ji naxê xwe serûbin diketin, lêdigerît, hizra xwe diket, ez kî bûm, li kîrê bûm û min çi di vêtin, ez li çi digeriyam, hemî pirsyarên kevin hilweşiyan û pirsyarên nû peydabûn.[263]Wate di aqlê her takekesekê kurd da binecihê pirsyar û bersivan heye çunkî piştî raperînê guherîn peydabûn, ev grûp hate damezrandin, ev grûp wek amîrekî bû ji bo livandina aqlê takê kurd, evçax ji bo havêtina pêngava yekê berev nûkirina civaka me, pêdivî ye jixwedî zat û kesî dest pê biket û

[257] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî liv înî (Nûkirin  Her û Her), r.29.
[258]Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 21/1/2016.
[259] Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 18/1/2016.
[260] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor: ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin  Her û Her), r.26.
[261] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 27/2/2016.
[262] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin  Her û Her), r.26.
[263] Heman jêder: r.13.

qurtalbûna mirovî ji qeyd û zincîrên tîtal û rewşit û reftarên efsaneyî xilas biket, zemîne xweş ketin ji bol dahênan û nûkirinê.[264]

Kar, xebat, hêvî û umîdên endamên desteka grûpêew bû ku edebî ji siyasetê cuda biken, Fazil Omer dibêjît: “me diviya edeb weku xewn û hîvîyeka hizrî li pêş komelê, weku çirayî biçin. Me diviya edebê kurdî ji xizmetkarekê syasetê, bikeyne bonewerekê serbxwe û azad[265], grûpaNûkirin Her û Herdi wi serdemî da, divî wextî da ya girîng bû damezrandina wê, çunkîedebiyata me heta sala 1991ê bibû koleyê hesta bindestiyê û keftibûye dibin çingilê siyasetê da.”[266]

Endamên desteka grûpê li dijî beyannameyê bûn, ewdi wê baweriyê dabûn ku beyanname dê hez û hizrên wan sinordar biken û çarçove biken, ji ber vê çendê dijî beyannamê bûn. Ewbi şilqandineka pozîtîv pêdivî bûn daku berhemên baştir peyda bibin.Girîngîdan bi avakirina wêneyî, daku wêne li şûna şirovekirinê ramanê bigehînît.Deq bi giştî deqek vekirî bît, û bikarît hemû curên xwendinan vegrît.[267]

Endamên grûpê bizavên mirovîkirine boguherîna rûxsar û qalibê hozanê ku armanca wan di sê xalan da berçav dibît:

1. Şkandin û avakirina qalibên xwemalî
2. Afrandina qalibên taze
3. Xwestina qalibên biyanî çi yekser çi bi guncandinê

Afirandina qalibên taze yan şikandina qalibên xwemalî û afrandina wan, bi gotineke dî bi werarxistin û livandina qalibên xwemalî û avakirina qalibên dî yên xwemalî li ser yên kevin û sibehî avakirina qalibek dî li ser îro, eve ye Her û Her Nûkirin.[268]

Arif Hîto dibêjît: “hindek guherîn di biyavê derbirîna hestên fîrhayî yên şiîr û wezîfeya wê jî bihête kirin, me diviya nameka û bideyne şiîrêku rewneqa xwe ya caran ji dest nedet, eger nebû xwendevanê nike jî bît, ji bo paşeroja şiîrê û ciwanîya wêjeyî ye.Me ew wezîfeya şiîrî dest pêkir û paş rûxsar û naverok jî destvedan. Li şûna şiîrê nîşanderbît, me hewilda bikeyne alavekê

---

[264] Hîto, Arif: berev nukirna cvakê me, rojnama Peyman, edeb û huner, jmare(149), 25/2/1998, r.2.

[265] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor: ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.28.

[266] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L84.

[267] Nehêlî, Nimetulla Hamid, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn), r.180.

[268]Omer,Fadil, zimanê sêyem, kanî ya Her û Her nuykirnê, r.55.

azrandinê, li şûna xwendevan tenê wergirbît, me hewilda wî neçarkeyn ligel şaîrî da hizrê di naverok û rûxsarê derbirînê da biket.”[269]

### 2.1.5. Kar û Çalakiyên Grûpê

1. Berifrehbûna rexneyê.
2. Gêrana kurs û semîneran liDihok û dewrûberên Dihokê.
3. Dîdar.
4. Rûniştinên edebî.
5. Karkirin dikovara Peyv da.
6. Guherîna hozanê ji layê rûxsar û naverokê ve.
7. Derkirina pirtûkekê li dor hizrên endamên grûpaNûkirin Her û Herji layê Fazil Omerî ve hate duristkirin.
8. Derkirin û belavkirina komeka berheman.
9. Pişkdarîkirin di çendîn festîvalên edebî.

Piştî derkirina grûpaNûkirin Her û Her li sala 1994an û encamdana çendîn kar û çalakiyan babetê rexneyê hate azirandin û geşekir. Lidor vê çendê Arif Hîto dibêjît: “rexne bi hebûna kiriyara dahênanêve ya hevbende, çend kiryara dahênanê xurttir û geştir bît dê rexne jî geştirbît.”[270]Wate piştî derkirina grûpê û endamên desteka grûpê çendîn kar di kiriyarên nû di qada edebî da encamdan bû cihê milmilanê û danûstandin û rexnegirtinê li gel endamên grûpê. Ji encamê vê çendê babetê rexnê berfireh bû.“Herwesa vê grûpê şiyan biyavekê rexneya avaker bi rêka danûstandinê di navbera hozan û wergirê wêda peyda biket”[271]GrûpaNûkirin Her û Herpalderekê serekî bû di ber firehkirina warê rexneyê, bi taybetî rexneya edebî da her ji sala damezrandina wê heta salên 1998-1999an.”[272]

Herçendvê grûpê çi sazî yan organên fermî nebûnku bi rêka wan bizav û çalakiyên xwe tomar biken yan jî boçûnên xwe bigehînine layenên dîtir.Lê bi hevkarî li gel yekîtiya nivîserên kurd leqê Dihokê û saziyên dîtir yên rewşenbîrî, çendîn semîner û danûstandinên rexneyî bo vê grûpê hatine rêkxistin. Arif Hîtodibêjît: “me semîner û kursên şiîrî li seranserî parêzgeha Dihokê

[269] Nehêlî, Nimetulla Hamid, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn), r.17.
[270] Hîto, Arif, govara Karwan, jmare (42).
[271]Hîto, Erşed, Dadayizm di hozana Nîxaza kurdîda, r.144.
[272] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Nîxazî li devera behdînan, r.89.

gêran[273] li bajêr û şaroçkên devera Behdînan (Dihok, Zaxo, Akrê, Amêdiyê, Sêmêl, Sersink) gêrane."[274]

Wate endamên desteka grûpî hevalînî û peywendiyên edebî digel dewrûberên xwe hebûn, Hizirvan Ebdulla dibêjît: "kurs û semîner û berhem berdewam me belavkirin liDihokê û dewrûberên Dihokê"[275], derbarey kar û çalakiyên grûpêFazil Omer dibêjît: "endamên grûpê komeka berheman belavkirîne (dîwanên helbestan, komên kurteçîrokan, rexne û teorîzekirin). Kurs û semîner gêrane, çavpêkeftin digel dezgehên medyayê kirîne, gotar belavkirîne, hevdîtin digel mamostayên Zankoya Dihokê û grûpan dî kirîne."[276]Arif Hîto dibêjît: "belavkirina hizr û boçûnên grûpê bi rêka kurs û semîner û mêzgerdên danûstandinê, herwesa belavkirina berhemên rexneyî û deqên wêjeyî di rojnamegerîya Kurdistanîda, hindek caran û li goreyî firsetan berhemên me ber bi belavokên kurdî li dervey welatî da difirîn."[277] Divan kurs û semîneranda û tekstên edebîda gelek dijayetiya grûpê dihate kirin bo bersivdana van tekstên edebî Mihsin Qoçan dibêjît: "me şiîri û tekstên şiîrî dixwendin, me bersiva nivîsînan dida, kurs ûsemîner li sertanserê Behdînan digêran"[278] ji bo bersivdana hêrişên li dijî grûpê hatîne kirin. Hizirvan Ebdulla dibêjît: "endamên grûpê bi rêka nivîsîna gotar û berheman weku bersivdanên rexneyî bonivîserên dijî grûpêdirojname û kovarên deverêda pişkdarî dikir."[279]Her wesa li dorrûniştinên edebî li gel grûpên dî yên edebî Mihsin Qoçan dibêjît: "borûniştin li gel grûpa wêran me seferkire Hewlêrê û me danûstandinên dirêj li gel gelekan kirin."[280]Hizirvan Ebdulla dibêjît: "me çendîn caran dîdar û rûniştin li gel wan grûpên piştî me peydabûn kirin. Li Hewlêrê grûpa Wêran, li Şeqlawe, Akrê."[281]Herwesa Arif Hîto li dor rûniştinên grûpê dibêjît: "bi berdewamî rûniştinên edebî li yeketiya nivîseran dihatine gêran, zêdebarî ku mêzgerdeka dû celseyên li gel mamostayên akademîyê yên Zanîngeha Dihokê jî hate sazkirin û ev mêzgerde dikovara Metîn da hatiye

[273]Nehêlî, Nimettulla Hamid, praktîzekna rexna nuya englu emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn), r.23.

[274] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Nîxazî li devera behdînan, r.89.

[275]Ebdulla, Hizirvan, hevpeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 14/2/2016.

[276]

[277] Hisen, EbdulrehmanEbdulxefur, ezmunî Nîxazî lay şa'îranî livînî Nûkirin Her û Her, r.46.

[278]Qoçan, Mihsin, hevpeyvîn, gulxana Dana, Dihok, 23/1/2016.

[279]Nehêlî, Nimetulla Hamd, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn), r.23.

[280] Heman jêder ,L23.

[281]Ebdulla, Hizirvan, hevpeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 14/2/2016.

belavkirin."[282]Her wesa kitêbek hate dirustikirin ji layê Fazil Omerî ve. Fazil Omer kesekê rexnevan bû, kitêbeka wî yahilsengandinê li ser hizr û bîrûboçûnên grûpê hate çapkirin.Li dor vî babetî Fazil Omer dibêjît: "min pirtûkeka biçûk li ser nûkirinê û berhemê biraderên min hîngê weşand, bi navê "Zimanê Sêyem-Kanîya Her û Her Nûkirinê"[283]

Her wesa hozan ji layê ruxsar û naverokê ve guherîn, ku hozana kurdî ji layê roxsar û naverokêve berev guherînên bineretî bir, ku bûyne hêvênê peydabûna xwendinên nûtir, ku bi vê çendê jî hozanvanên nû di karîger bivê grûpê peydabûn, dîsa ev curê hozanê xwandevanê asayî ji tiştê asan û rastewxwe duyr kir, belkî beruvajî, dergehek bo têhizrîn û lêgeriyanê li hevber xweandevanî vekir, eve jî mukomkirina wê peywendiya sê guşeya (tekst, hozanvan, wergir) bihêz dêxît[284],

Herwesa karkirina endamên grûpê dikovarê da, lidor vê babetî Arif Hîto didibêjît "zorbey endamên beşdar di vê grûpê da endamên desteka nivîserên kovara Peyvin û gelek caran berhemên Nûxazî- hozan û gotarên hizrî – yên endamên beşdar di vê grûpa têda dihêne xwarê û herwesa hozanvan Mihsin Qoçan bo maweyekê ser nivîskarê wê bûye."[285]Jiber vê çendê gelek caran xelkê digot kovara Peyvkovareka taybet e bi GrûpaNûkirin Her û Her ve, lê endamên desteka grûpê vê çendê red diken, çunkî çikovar û rojnamên taybet nebûn bigrûpê ve.Ew jî ji ber ku di wî serdemî da barê aborî yê endamên grûpê lawaz bû, dişiyanên wan da nebû ku kovareka taybet bigrûpê ve der biken.Her wesa endamên beşdar di vê grûpê da çendîn namîlkên hozana Nûxaz ên cuda û serbixwe û çendîn hozan û vekolînên ku derbirînê jihizir û meremên wan, ji pêkînana grûpê û karên wergêran û gotarên rexneyî bişêweyekî berbelav dikovar û rojnameyên kurdî da belav kirîne.[286]Hizirvan Ebdulla dibêjît: "me berhemên xwe dikovar û rojnama da belavkirin."[287]Fazil Omer dibêjît: "li wî wextî berhemê edebî û yê rexneyî û teorîzekirin, weku semîner yan weku gotar li rojname û kovaran belav dibûn."[288]

---

[282]Nehêlî, Nimetulla Hamd, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne wvekolîn), r.23.
[283] Omer, Fazil, hevpeyvîn, li baregayê Waar tv, Dihok,15/2/2016.
[284]Hîto, Erşed, Dadayizm d hozana Nîxaza kurdîda, r.44.
[285] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, hozana Nîxazî li devera behdînan, r.88.
[286]Heman Jêder, r.89.
[287]Ebdulla, Hizirvan, hevpeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 14/2/2016.
[288] Omer, Fazil, hevpeyvîn, li baregayê Waar tv, Dihok, 15/2/2016.

### 2.1.6. Nebûna Beyannameyê

Ji encamadirustbûna her grûpekê pêdivî bi beyannameyekê heye ji bohizr, hez, kar, çalakî, armanc û berhemên xwe têda belav biken, radestê xwendevanî yan xelkê xwe biken.Pêdivî bi beyannamê heyeçunkîdestpêka ragehandina her grûpekê yan karekî dûmahîkek bo heye, lewra beyanname dibîte erşîf bo her karekî, grûpa Nûxaziyên Erebî û cîhanî her grûpekê beyannameyeka taybet heye bigrûpê ve, lê xala girîng li def grûpa Nûxazîyên devera Behdînan, anku Grûpa Nûkirin Her û Her çi beyannameyên taybet bi giropî ve dernekir. Ev jî xaleka erînî bû li defgrûpê û bûye xaleka girîng li def rexnegiran. Ji encamê derinekirina beyannameyê çendîn reyî û boçûnên endamên desteka GrûpaNûkirin Her û Her wergirîn.

Li dor dernekirina beyannameyeka taybet bigrûpê ve, Hizirvan Ebdulla dibêjît: “beyanname bi dîtina me xwe girêdan bû di çarçovekê da û em dijî çarçovan bûyîn.Li dor navê gropa me Nûkirin Her û Her, wate karê me ne bitinê diwarê helbestê dabû, anku karê me di nav gişt edebiyata kurdî da bû, mîna çîrok, şano, hozan, roman hwd.lewrakarê me bi giştî di huner û edebiyata kurdî da bû, jiber hindê me ne diviya xwe sinordar biken bitinê li bin çemkê hozanê ve.[289]

Herwesa navbirî dibêjît: “me ne diviya xwe sînordar bikeyn bi derxistina beyannamekê ve, paş sibehî ev beyanname me çarçove biket û xelkek bêjît di vêt hûn di sînorên vê beyanê da we bivêt û nevêt dê kraken.Nexêr me diviya bê sînor û çarçove kar bikenku çi caran afirandin bi beyanname û grûpa nahêtekirin, belkî afirandin bi takekesa dihête kirin.[290]Endamên desteka grûpêdestpêka karê wan nûkirin di hozanê da bû, guherîn û nûkirin ji hozanê dest pê kirin, çunkî endamên desteka GrûpaNûkirin Her û Her hozanvan bûn lê armancawan nûkirin bi tinê dihozanê da nebû,belkîprojeyekê temam bû û armanca wan ew bu ku guherîn û nûkirinê dihemî janrên edebî da biken.Ev grûphate nasîn wek girûpa hozanvanan, lê endamên desteka grûpî vê çendê red diken. Selman Kovlî ku yek ji endamên grûpê bû wesa dibêjît: “nexêr ne, çunkî em bara pitir şaîrbûyn, li def her kesekî cara yekê şiîri dihête hizra wî, mesele ne şiîri bû, dibît me jişiîrê destpêkiribe wek têwirkirin, lê sedased da wêvetir çîn, belê ev grûp bigrûpa hozanê ber niyase.[291]

---

[289]Ebdulla, Hizirvan, hev Peyvîn, li baregayê govara Peyv, Dihok, 14/2/2016.
[290] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor: ezmunî Nîxazî, lay şa'iranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.42.
[291]Heman Jêder,L24.

Ev grûpe bigrûpa hozanê hatiye nasîn jiberku ev grûpe ji şeş kesan pêk hat bûû pênc ji wan hozanvan bûn, yek ji wan, Fazil Omer, çîroknivîs û zimanzan bû, ji ber hindê grûp yê ber niyas bû bigrûpa hozanê.

Her derbareyî vê babetê Şukirî Şehbaz dibêjît: “me pitir kar li ser şiîrê dikir, çunkî ji bilî D.Fazilî em hemî şaîr bûyîn, lê di bernameya meda bû ku em biçîne di navhemî  warên dî yên edebî da.Her wesa Arif Hîto dibêjît: “praniya damezrînerên grûpê şaîrbûn, lewma hemî bizav û çalakiyên grûpê di çaarçovê şiîr û hevbendiyên şiîrî dabûn. Lê çunkîşiîr hunerekî ciwane û serederiyê digel hevbendiyên berhemhênan û serederiyên civakî diket, lewma siruştî bû ku babetê grûpê jî nûkirina şiîrê bît û şiîrî ber bi têhizirîn û nêrînên giştî yên derbareyê civakê û wêjeyê ve biben kuxwe li piraniya babetên civakî bidet.[292]

Wate lidestpêkê kar û armanca vêgrûpênûkirin di hozanê da bû, lê endamên desteka grûpê diviyan nûkirinê di hemî janrên edebî da biken, ji ber hindê çi beyanname dernekirin, her lidor derekirina beyannamêArif Hîto dibêjît: “hizra me jigrûpê ewbû ku projeyeke parvekirî bît û bi azadî li asmanê qada rewşenbîrîya deverê bifirît. Hercihekê dadetê hindek avê jê vexwet, evca nivîsîn û belavkirina beyanameyan dê asoyên dadetê çarçove ket.”[293]Nûkirin Her û Her û beyaname du navên jêk cudane,nûkirin îşareteke ji bo berdewamîdan û nûkirin li ser hemî bûyerên jiyanê, beyanname îşareteke bitinê li bin bûyerekê jiyanê, anku xwe girêdan. Ji ber vê çendê çi beyanname dernekirin, Mihsin Qoçan dibêjît: “navkirina grûpa me bi Nûkirin Her û Her, ku eve diruşmê grûpa meye, ya diyare ku me ne viyaye hîç belgenameyekê bideyne dest rexnegran ku bêy têgehiştin hêriş bikene ser me û derkirina beyannamê dê palder û belgenameka baş bît bo rexnegiran ku hêriş bikene ser me, lewra me beyanname derinekir.”[294]Çunkî di warê edebiyat û afirandin û dahênananda hîç beyannameyek pê nevêt, û nabît bihête sînordarkirin daku bi şêweyekî azad û berbelav bît, Fazil Omer dibêjît: “jiyan û afirandina edebî du prosêsên berdewamin, her wextê rawestîya yan xwe çarçovekir, dê mirît yan yê mirî, me peyam û rêbazeka aşkira hebû. Lê me nediviya xwe diçarçovekê hizrî yan rêbazeka edebîda zîndan bikeyn.Me beyan weku xwe zîndankirinê yan xwe liqalibdanê dizanî.[295]

Endamên desteka grûpêdibêjin: “Eger me beyanname derkiriba em da hatibana sînordarkirin, û pêdivî bû li ser me ku em li bin çemkekê bitinê kar bikeyn, anku ew azadîya wan di edebiyatê da

[292] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor: ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin  Her û Her), r.24.
[293]heman jêder, r.41.
[294]heman jêder, r.88.
[295]heman jêder, r.41.

nediman û nedişiyan bi şêwekî azad û berbelav karê xwe biken.Lewma em li dijî vê çendê rawestiyan, Mihsin Qoçan dibêjît: “beyan wate tîwreka berwext bo berhemekê ne derkeftî, wate veguhastina azadiyê li wî berhemî da, te çarçove bo dana wate êdî di vêt wî çarçoveyî tijî ket, te azadî bu nehêla”[296] Her wesa navbirî di dîdarekadî da dibêjît: “me çibeyanname dernexistin, çunkî ew şerê li gel me dihate kirin, yê bilez û dijwar bû û hebûna beyannamê, anku çarçovekirineka berwext a wî berhemê hêşta neyî li dijî boçûnên me bûye.[297]


Herwesa xaleka dî ya girîng derbareyê nebûna beyannameyeka taybet bigrûpê ve babeteke siyasî bû.Lidor vê çendê hozanvan Şukirî Şehbaz dibêjît: “dernexistina beyannameyê ji ber rewşa siyasî û barûdoxê Kurdistanê û şerê birakûjiyê bû, herwesa hevalên grûpê di wêrek nebûn, çunkî piraniya wan endamên siyasî bûn û da bêhna hizbayetiyê jê nehêt, rewşenbîrên li deverê piştevanî li me nekir, belkî gef ji gelek layena li me dihate kirin.[298]Wate endamên desteka grûpêşeş kes bûn û her yek li bin çengê partiyeka siyasetê bûn, jiberhindê hîç beyannameyek dernekirin da ku nekevine libin çengê siyasetê ve, mebest karkirina wan dûr ji siyasetê bû, herwekî Mihsin Qoçan dibêjît: “zêdebarîya me neçêkirina menhecekê yan hizbekê bû, yan xelkekê lidorxwe kom bikeyn.”[299]

Wate nebûna beyannameyeka taybet bigrûpaNûkirin Her û Herve biryara hemî endamên desteka grûpê bû, hemî li ser vê biriyarê bûn ku çi çarçove û qaliban bo xwe nedanin daku bi şêweyekî azad û serbest nûkirin û guherînê dihemî janrên edebî da biken, ne tenê di hozanê.HerwekîArif Hîto dibêjît: “em li wê hizrê bûn ku Nûkirin Her û Her balindeyekê şaper vekiriye û roj bo rojê dê nûkirinên nûtir bînîn û pêdivî bibeyannamên erşîfkirinê naket.”[300]Belê nebûna beyannameyeka taybet bigrûpê ve toşî hêrişên rexnegirtinê bûn ji layê kesanên akademî, rexnegir û mamostayên zankoyê ve.Ji encamê nebûna beyannamê mil milanê û dan û standinên dijwar digel wan hatine kirin.

---

[296] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.43.
[297] Nehêlî, Nimetulla Hamid, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne wvekolîn), r.20.
[298] Hîto, Erşed, Dadayizm d hozana Nîxaza kurdîda, r.142 .
[299] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.43.
[300] Nehêlî, Nimetulla Hamid, praktîzekna rexna nuya englu emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn), r.19.

Hizir û armanca endamên grûpaNûkirin Her û Her divî xişteyda diyardibît




### 2.1.7. Ciyawazya GrûpaNûkirin Her û Herdi gel Grupên Nûxazî yên Cîhanî

Hizir, bîr û boçûnên Grûpa Nûkirin Her û Herjigrûpên dî yên cîhanî ciyawaz bûn, evciyawazî di naverok û babetên wan da bivî şêwê li xwarê diyar dibin:

1. Nûxaziyên cîhanî daxwaza dabirîn û hilweşiyan ji folklor û hizrên kevin û berî xwe diken, lê em refza wan nakeyn – bo nimûne di hozanên meda pendên mirovan, mamik hene çunkî em dibêjîn avakirina şaristaniyeta rewşenbîrî bi rêka heremeka serbixwe biserkefît û geşe diket, wate çend tu bi serdikevî, pêdivî ye binkê wê berifrehtir û berîntir lê bihêt, lewra eger pêngav û binaxê me yê mikum û kûr nebît di nav rewşenbîrî ya folklorî û klasîkî da em neşên berdewam yê pê bideyn.
2. Nûxaziyên cîhanî refza qudsiyatiyên (pîroziyêt) civakî û babetên ayînî kirîne, çunkî ew dibêjin, ev pîrozî astengin di rêka pêşkeftina civakê serdemî da, belê hizra me xwelêdan û nehêlana van pîrozîyan di civakekê sawîlke û sakarê wekî civakê me bi wateya xwe

kûştin û nehêlana xwe ye.Lewra boçûna me ew bûyeku bi temamî refza pîroziya nekeyn û yekser hêriş nekeyne ser bi rexneyeka negativî,belkî pêdivî ye warekîguman û pirsyarkirinê li serwan pîroziyan berfireh bikeyn da ku bişêyn eqlê xwe û xwînerê xwe dirust û nedirustî ya wanda bideyne şolî, da bigehine rastiya wan, ka ew hizir ya pîroze yan jî ne.

3. Nûxaziyên cîhanî bo hizir û edebiyata xwesînor û çarçove û beyanname danayîne, lê me çi qalib bo dahênanê nedanayîne, û em wesa hizir dikeyn ku ev hewleka xelete û dê tuşî arêşa bîn, lewra me hîç çarçove û beyanname bo grûpaxwe nedanayîne, belkî em berdewam dê di nûkirinê dabîn, çunkî jiyan di guherîneke berdewam daye, ku dem bo demî dihête guherîn û berev pêşve diçîtin, lewra di vêt em xwe digel wî serdemî bi guncînîn.[301]
4. Em li vîne le dayik bûn û nemanêkî diyarî kirawî niye, wate rojîkî diyarî kirawî niye bu damezirandin û aşkirabûnî, herweha katêkî diyarîş niye bo nemanî.[302]

Ji ber van çar xalan Nûxwazîya grûpa Nûkirin Her û Her ya cuda û ciyawazbû digel Grûpan Nûxazî yên cîhanî.

Derbarey sal, heyv û roja destpêbûna grûpa Nûkirin Her û Hernediyare, Şukirî Şehbaz dibêjît: “Roj û heyv û sal li bîra me nîne, destpêka rûniştinên me li zivistanê bûn li dûmahîka sala 1993yan, lê bê nav, lidestpêka sala 1994anli heyva yek û du em wekî nav û wekî grûp diyarbûyîn.” Herwesa Mihsin Qoçan dibêjît: “destpêka me li sala 1994an bû, heyv û roj li bîra min nînin, çunkî me hizir nedikir dê partiyekê yan grûpekê damezrînîn, belkî me tenha tenzîr û teorî bo karên xwe dikirin û binema û yadigarên xwe me şirove dikirin.” Herwesa derbarey diyarinekirina roj û heyva grûp lê dirust bûyî Arif Hîto dibêjît: “grûpaNûkirin Her û Her li sala 1994an hate damezrandin”, herwesa lidor vî babetî Fazil Omer dibêjît: “roj û sal jî hind diyar nînin, kanê kengî grûp peydabû, çunkî encamê prosesekê bû, her wesa Şukirî Şehbaz dibêjît: “grûp li sala 1994an ji encamê rûniştinên me yên berdewam li Yekîtiya Nivîserên Kurd liDihokê peydabû.[303] Lidor wan dîdarên di gel endamên desteka damezrênerên grûpê hatîne encamdan bo me diyarkirin ku roj û heyv û sala damezrandina grûpaNûkirin Her û Her neya diyare, bitinê

[301] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,L86.
[302] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.39 - 40.
[303] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.25.

amajedana wan bi salekê ye, ewjî li sala 1994an da hate damezrandin weku grûpeke edebî li devera Behdînan.

### 2.1.8. Egerên Lawazî û Nemana Grûpê

#### 2.1.8.1.Lawazîya grûpê

Her jidestpêka peydabûna grûpaNûkirin Her û Her li sala 1994an heta ji navçûna grûpê, ew tûşî rexnegirtin û hêrişên tund û dijwar bûn ji layê kesanên siyasî, aynî, akademîk,mamoste û rewşenbîran ve, her wesa mişextibûn û nebûna piştevaniyê û şerê navxweyî û û birakûjiyê jî bûne egerên lawazîya grûpê.

**a. Layenên Siyasî**

Li sala 1994an di vî serdemî da Başûrê Kurdistanê di serdemekê nalên û hestiyar dabû, rewşa siyasî di vî serdemî da di rewşeka aloz û sext da bû, ji ber vê çendê desthilata siyasî divî serdemî da li devera Behdînan dijayetiya grûpa Nûkirin Her û Her dikir.

Ebdulrehman Ebdilxefur dibêjît: “desthilatî siyasî ew serdeme le deverî Behdînanda, dijayetiyekî zorî em livîney dekird û tawanbarî dekird ke emane xerêkî dirustkirdinî partêkî tirin û destî derekî legel da heye û ezmûnî hikûmranî Behdînan lenaw deben.”[304]Ji encama rûiniştinên berdewam yên endamên grûpê, desthilatê wesa hizirkir ku ev hindek kes in dê partiyekê dirust ken û li dijî hikûmetê rabin, lewra desthilata siyasî dijayetiya wan dikir, Ebu Ebeyd Ebdulla dibêjît: “kesayetiyên wî serdemî, hewla nivîsîna gotarên rexneyî li dijî şepolê didan bo pûçkirin û nehêlana grûpê, çunkî wan wesa hizir dikirin ku destê layenekê dî yê siyasî ji derve didanan û pêkînana vê grûpê da heye û ev grûp dê rêxweşker bît bo pûçkirin û nehêlana tevaya wan hizrên pîroz yên aynî û civakî û neteweyî û ramyarî yên berî sala 1994an.”[305]Ev grûpe bi damezrandina hizbeka siyasî hate gunehbarkirin. Şukirî Şehbaz dibêjît: “em hatîne gunehbarkirin bi çêkirina hizbekê û destê derveyî digel me û dê xelk li dor me kombît û dê kartêkirinê li hizra wan keyn û dê endaman wergirîn, evca dijayetiya bihêz lime hatkirin jilayê siyasî ve.”[306]Her lidor vê çendê li dîdarekê Selman Kovlî dibêjît: “wesa diyare kudesthilat bi xelet têgehiştibû, jiber hindê dijayetiyeka dijwar bo hate kirin ji aliyê desthilatê ve, her wesa nehizbek bû, ne aliyekî paldabû,

---

[304]Heman Jêder, r.48.

[305] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.48.

[306] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan , r.90.

çunkî hindekan got hizbe, yên dî got eve layeneke destên biyanyan yên di nav da û bi hemî rengan dijayetiya wan hate kirin."[307]Dîsan dîtina hindek ji siyasiyên deverê ew bûku destekê siyasî li pişt vê grûpê heye, çunkî diruşmê wan "şkandin û avanrkirinaqalibên xwemalî, afrandina qalibên taze, xwestina qalibên biyanî çi yekser yan jî bi guncandinê bû".[308]Her wesa Hizirvan Ebdulla dibêjît: "eve xaleka şaş têgehiştinê bû li def kesanên siyasî, wan wesa hizirdikirin ku em li dijî hemî pîroziyên miletê xwene, lê vê çendê red dikem û me çi tiştên li dijî pîroziyên neteweyêxwe nekirine her digel pîrozîya bûyîn.[309]

Her wesa şerê birakûjiyê (sere navxweyî) milmilana siyasî bû, ne egerê lawazîya grûpa Nûkirin Her û Her. Derbareyê vê yekê da Mihsin Qoçan dibêjît: "layenê siyasî jî dijî me bû, lê ew di heq bûn, çunkî şerê navxweyî bû di navbera Pkk, Puk û Pdik de. Her kombûneka bivî rengî dahêne refizkirin û neya qebîl bû."[310] Herwesa lidor şerê navxweyî Hizirvan Ebdulla dibêjît: "peydabûna cenga birakûjiyê û bertengbûna kawdanan eger bûn kugrûp berev lawaziyê biçin, jiber ku endamên grûpê terawberabûn, bijalebûn."[311] Sere navxweyî karîgerîyeka mirov li ser grûpê hebû bo egerê jinavçûna endamên grûpê, çunkî her endamek li bin çengê partiyeka siyasî ve bûn, ev şere bi lawazîya grûpê hate li qelemdan.

**b. Layenê Aynî**

GrûpaNûkirin Her û Her tüşî rexnegirtin û hêrış û dijayetiyeka dijwarbûn ji layê kesên aynî û mela û selefıya ve,çunkî endamên grûpê daxwaza nûbûnê dikirin, lê kesanên aynî li dijî nûbûnê bûn. Jiber vê ayeta pîroz (وشر الأمور محدثاتها وكل محدثة بدعة وكل بدعة ضلالة وكل ضلالة في النار)[312], lê ev ji encamê eqiliyeta wan ya kevin bû û wan dijayetiya her tiştekê nû dikirin lewra endamên grûpê ketine ber hêrişên wan, Mihsin Qoçan dibêjît: "mela li mizgefta û li ser mînberê hêriş dikirine li ser me û li dijî me radiwestiyan û bi hemî qeweta xweve hêriş dînane ser me û digotin miletê kurd mihtacî hindê nîne hîn (نظريا) biyaniya bînine nav miletê meda û wan rojane axivtin digotine me."[313]

---

307 Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.48.
308Hîto, Erşed, Dadayizm di hozana Nîxazya kurdîda, r.143.
309Ebdulla, Hizirvan, hevpeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 14/2/2016.
310 Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.49.
311Ebdulla, Hizirvan, hevPeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 14/2/2016.
312Al – Boxarî, Sehîh Al- Boxarî, (2697).
313 Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, bingehê govara Metîn, 30/1/2016.

Mirovên oldarku bi dîtina wan ew yê bangewaziyê bo hizrên Ewropî biken û jinavbirina tev pîroziyênolî kardiken[314], herwesa melayên mizgeftan hêrişên tund kirine ser hizrên endamên vê grûpê, çunkî bi pêngaveka ji ayîn derkeftinê li qelem didan û digotin: "ev bangewaza hizrên Ewropî di nav civakê meda diken û hewil diden tevaya pîroziyêt aynî binbir biken."[315]Kesanên ayînî wesa hizirdikirin ku ev grûp li dijî bîr û bawerî û pîroziyêt aynî ne, lê endamên grûpê vê çendê red diken, her wesa dirojnama peyman (j.5-7) da rexnegirtin û hêrişên tund û dijwar kirîne ser endamên grûpê ji layê Tehsîn Doskî ve, di rojnama Peyman (j.7) dibêjît: "ne em bîn û necîhana me ya nû ew cîhana berê me didete bin pêlava biçûkekê sawêlke."[316]

Her wesa di rojnama Peyman (j.5) da (5/9/1994) nivîsînek bi xamê Tehsîn Doskî babetek belavkir li jêr navê "Ji deftera hizrûbîran"ku têda hêrişeka mezin kiriye ser vê grûpê û dibêjît: "ew destên nepîroz nabît gulan bikeyne têda, çavên ber li dûvelankiyê nabît bibine zêrevan, ew qelemên dijminkariyê şirîn diken, di vêt hibr jê bête birîn ... Eger ne bêjîn, di vêt bêne şkandin, ew rewşenbîrî di vêt li dijî wan denga rawestît yên neyaretiya pêla rast diket."[317]

Her wesa Tehsîn Doskî dinivîsîneka xwe ya dî da dibêjît: "Piştî sohbeta nûxwazîyê li nik xelkê sarbûyî, ji nû li nik me gerim bû."[318]Piştî hêrişên tund û dijwar ji layê kesên oldarî ve hatine ser grûpê, endamên grûpê dibêjin: "Muhamed Pêxember (s) piştî rîsala xwe ya pîroz belav dikir hemî agirên jiyara kevin lê bûne dijmin heta nêzîktirîn kes ku mamê wî bû, lê bûye dijmin.Herçixwedanê nûkirinekê bît hatîne azardan, Galîleo dahête sotin çunkî tiştekî nû pêşkêşî mirovan kir... Lewra em jî bi tiştekê seyr nabînîn û em daxwaza nûkirinê di qada tore û honerê Kurdî da bi giştî dikeyn."[319]

Hizirvan Ebdulla dibêjît: "ewaqlê şoparêzên çavlêker bûn ku lidijî her nûkirinekê bûn, ewli dijî me rabûn, her wesa ew biraderên dijî me derkeftîn yan ew grûpên dijî me derkeftîn xwe mandî nedikirku em çi dibêjîn û ew di me nedigehiştin, lewma dijayetiya me dikirin bêyî bizanin ka armanca me çiye û me di vêt çibikeyn."[320]

**c. Layenên Akademîk**

[314] Hîto, Erşed, Dadayizm di hozana Nîxazya kurdîda , r.143.

[315] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan , r.90.

[316] Duski, Tehsin,govara peyman: jmare(7), 2/11/1994, Dihok, r.9.

[317] Duski, Tehsin, ji deftera hizrubîran, rujnama peyman, jmare (5), 5/9/1994, Dihok, r.4.

[318] Duski, Tehsin, di terazya Nîxazyê da, govara vejîn, jmare (11), beharî 1998, r.4.

[319]desteka hzana hevçerx, rujnama peyman, jmare(9) , 2/11/1992, r.4.

[320]Ebdulla, Hizirvan, hevpeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 14/2/2016.

Mamosta û rewşenbîran hêrişên tund dikirine ser grûpê, çi bi rêka gotina wanên xwe yan jî bi dan û standinan digel vê grûpê.[321]Hizirvan Ebdulla dibêjît: "mamostayên zankoyê di wanêt xweda hêriş dikirine ser me, hindeka em bi têkderên edebiyata kurdî navkirîn û hindeka navên kirêt li mekirin, û gengeşe di navbera me û zankoyê da peydabûn."[322]

Fazil Omer dibêjît: "kes û civakêtir pitir rêgir û asteng bûye ji harîkariyê û gelek caran em bi tiştên dî, tiştên ne edebî dihatîne gunehbarkirin.Bonimûne ev grûpe hate gunehbarkirin bi siyasîkirina edebî, her wesa bihilweşandina biha û binemayên civakî û dînî û siyasî."[323]

Ev grûpe kefte li bin hêrişên tund ji layê kesên akademîk, rexnegir û mamostayên zankoyê vr, bi taybetî li Zankoya Dihokê.Divî serdemî da hindek rûniştinên hatine encamdan digel mamostayên Zankoya Dihokê yên mîna Azad Ebdulwahid, Adil Germiyanî, Fuad Reşîd, li baregayê kovara Metîn li sala 1997an[324], lidor vî babetî Fazil Omer dibêjît: "danûstandinên germ digel kes û şehrezayan hatinekirin, ji wan ustazên Zankoya Dihokê bûn... Bi dîtina me, wan bi çavekî berteng li babetê dinêrî û digotin pêdivî ye hewe beyannameya damezrandinê hebît, nexwe hûn ne grûpin."[325]

Herwesa hindek ji hozanvanên klasîkî û xwendevanên hozana klasîkîku bi dîtina wan ev grûpe mirina şehiswarên hozana klasîkya kurdî radigehînît[326], û gelek ji xwendevanên hozanê bi taybetî layengirên hozana klasîkî û ew kesên zû bi zû di hizir û hozanên wan nedigehiştin û hîç xweşî û çêjek jixwendina hozana wan ne didît, çendîn gotarên rexneyî li dijî hozan û hizrên endamên beşdar digrûpa Nûkirin Her û Her belavdikirin."[327]Hindek ji rewşenbîr û rojnamenivîsên deverê hêrişên tund li dezgehên ragehandinê, bo nimûne lirojnama Peyman, kovara Gazî, kovara Vejen, kovara Metîn, radyoya Dihok, televîzyona Xebat û zêdebarî kurs ûsemînerên rewşenbîrî û edebî hêriş kirine ser grûpê.[328]

Egerê serekî yê hêrişkirina ser vê grûpê ji layê kesanên akademîk ve, bo van du xalên li xwarê dizivrît:

---

[321] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,r. 90.

[322]Ebdulla, Hizirvan, hevpeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 14/2/2016.

[323] Omer, Fazil, hevpeyvîn, li baregayê war tv, Dihok,15/2/2016.

[324] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.50.

[325] Omer, Fazil, hevpeyvîn, li baregayê war tv, Dihok,15/2/2016.

[326]Hîto, Erşed, Dadayizm di hozana nuxaza kurdîda, r.143.

[327] Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla, Hozana Nîxazî li Devera Behdînan ,r.91.

[328] Hîto, Erşed: Dadayizm di hozana nuxazya kurdîda, r.143.

1. Di hizr û hozanên wan nedigehiştin.
2. Ji ber nebûna beyannameyeka taybet bigrûpê ve, çunkî sinor û kar û meremên xwe diyarinekirin, sala damezrandina grûpê diyar û aşkira nîne.Ji ber van egeran her yekî ji layê xweve hêrişkire ser vê grûpê.

**d. Barê Aboriya Kurdistanê**

Barê aboriya Kurdistanê jî karîgerîyek li ser grûpê hebû, di vî serdemî da barê aboriyê madî yê xelkê gelek lawazbû,nivîsîn û xwendina pirtûkan bi taybetî hozanê geleka kêm bû, çunkî her yek mijûlî karê rojane bû ji bo dabînkirina pêdiviyatiyêt xwarinê. Ji berku barê aborî gelekî xirab û lawaz bû, di herêma Kurdistanê bi şêweyekê giştî û devera Behdînan bi şêweyekê taybet di demê germegerma grûpê da tuşî çendîn aloziyên siyasî, civakî, aborî hwd.bibû. Sê şerên birakûjiyê rûdan, abluqa aborî xelkê me mandîkir û hemû demê wî jê dizî û hizra wî bi pariyê nanîve mijûl kir û girêda. Şaîr û nivîser û rexnegirên mejî dîsan ketine li bin fişara van barûdoxan, lewra mêşkê wan bi van diyardanve westiyan, wan neşiyan bidirust hizrê mandîbûnê, dûvçûnê, bo berhemê nûxwazan biken."[329]

**2.1.8.2.Nemana Grûpê**

Piştî hêrişên dijwar ji hemî layenanve hatîne ser grûpê, jiber nebûna planeka yekgirtî û diyar û aşkira, evgrûpe berev lawaziyê çû, kar û çalakiyên wan kêmtir lêhatin û endamên wê jî jiber yek çûn û bijale bûn.Jiber nemana grûpêMihsin Qoçan dibêjît: "grûp nemiriye û nejî rêkxweşike ku dewamiyê biket, ew armanca grûp jê çêbûyî bicih hat, ne siyasî û ne civak êdî dişên bêjin nûkirin xirabe. Jixwezankodi vekolînên xweda di wanên xweda nûkirinê peyrew diken, mela li ser mizgeftan du'a bonûkirinê diken, tev berhemê edebî, hunerî, rewşenbîrî yê hember kirî, evca mana grûpêbo çi ye?"[330]Herwesa navbirî dibêjît: "Hêvî û armanca me ewbû ku ew goma rawestiyay bi şilqînîn û me şilqand evca girop hebît nebît me armanca xwe bicih îna"[331]. Hêvî û armanca wan ew bû ku ew goma rawestiyay diedebiyatêda bihête şilqandin, Hizirvan Ebdulla dibêjît: "Armanc bi cih hatin, me diviya şilqek bi goma genî bikevît û vêket, me diviya guhertinê bikeyn û mekir, têgehiştinên kevin biherfînîn, me herfandin, êdî pêdivî bigrûpê

---

[329] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.54.

[330] Nehêlî, Nimettulla Hamd, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn) ,L25.

[331] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, bingehê govara Metîn, 30/1/2016.

nema."[332]Herwesa navbirî dibêjît: "Me hest pê kir ku me armanca xwe hingaft û ew goma rawestiyay me şilqand, raste Nûkirin Her û Her weku grûp nemaye, belê her em di berdewamîn li ser nûkirinê."[333]Her lidor nemana grûpê Fazil Omer dibêjît: "Grûp nemaye lê berhem û bandor berdewamin, kî heye xwe berdewam nû neket? Kî heye bawerî binûkirina berdewam nebit?Kî heye weku dûhî binivîst? Em weku grûp û kombûn nemayne, lê canê Her û Her Nûkirinê û vêragehiştinê û pêşdaçûnêdi leşê her nivîserekî da heye, me diviya wê rastiya biçûk liber çavên her kesê ragirîn, jiyan nûkirineka her û here, pêdivî ye mirov di berhemê wî de digel jiyanê guncav bit, nexwe em najîn. Em jêk cûdanebûn, em ji ber yekçûn, yan jiber yek hatîne birin, van egeran grûp lawaz kir û paşî hebûna wî xiste nav tariyê.Egerên siyasî, şerê navxweyî, mişextibûn, dijayetîkirin, nebûna piştevaniyên li gel wextî, baweriyek peydabû ku hebûna berhemê nûxwaz girîngitire ji hebûna grûpekê nûxwaz."[334]Herwekî me lidestpêkê amaje pê day roj û heyv û sala damezrandina grûpê û nemana grûpê nehatiye dest nîşankirin, lidor vê çendê, Fazil Omer dibêjît: "Ez bawer nakem kesê roj û meh yan sal jî hebin! Grûp prosêseka dûr û dirêj bû, bome beyan jî nebû, bibîte destpêk, heman tişt bo nemanê jî dihête gotin! Ew jî me neragehand, çunkî em jêk cuda nebûyn, em jiber yek hilweşiyayn yan ji ber yek hatîne hilweşandin."[335] Li dor sala nemana grûpê Hizirvan Ebdulla dibêjît: " Bi min were dumahîkhatina grûpê bû dawîya sala 1999an û destpêka 2000î dizivrît, çunkî dûmahîk rûniştinên me li wê zivistanê bûn."[336] Ev gotine wê rastiyê diselmîninku grûpa Nûkirin Her û Her ta destpêka salên 2000ê jî ya diyarbû, lê piştî hîngê lawazbûye û berev hilweşanê ve çûye.[337] Hizirvan çû dervey welatî, Selman Kovlî xwe vekêşa, Fazil Omer û Şukirî Şehbaz Ji Yekêtî bûn, Mihsin Qoçan ji Partî Gel bû, Arif Hîto Partî bû, bi vî rengî grûpa wan ji nav çû.[338]

### 2.1.9. Jiyannameya Endamên Grûpa Nûkirin Her û Her

❖ **Hizirvan Ebdulla**

Hizirvan Ebdullali sala 1962ya li gundê Bircînî ya ser bi parêzgeha Dihokê ve ji dayik bûye.Wî li sala 1979an dest bi vehandina hozanê kiriyeû li sala 1989an yekem dîwana xwe bi nave "Ez û

[332] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her),L55.
[333] Ebdulla, Hizirvan, hevpeyvîn, li baregayê govara Metîn, Dihok, 14/2/2016.
[334] Omer, Fazil, hevpeyvîn, li baregayê war tv, Dihok,15/2/2016.
[335] Omer, Fazil, hevpeyvîn, li baregayê war tv, Dihok,15/2/2016.
[336] Nehêlî, Nimettulla Hamd, praktîzekna rexna nuya Englu Emrîkî li ser textên grupa Nûkirin Her û Her (rexne û vekolîn) ,L 25.
[337]heman jêder, r.26.
[338]Hîto, Erşed, Dadayizm di hozana Nîxazya kurdîda, r.144.

Agir" li Bexda weşandiye.[339] Hozanvanî beşdarî bi çendîn çalakiyên rewşenbîrî kiriye. Bo nimûne li sala 1980yan bûye endamê yekîtiya nivîserên genc; damezrandina yana helbestê li bajêrê Dihokê li sala 1987an. Her wesa her li vê salê bûye endamê yeketiya nivîserên Kurd li Dihokê; damezrandina grûpê nûxazîû endametî li desteya kovara Nûxazi ya Dihokê li sala 1991ê; endamê grûpê Nûkirin Her û Her li sala 1994an. Her wesa pişkdarî di weşandina çendîn rojname ûkovaranda kiriye, wekukovara Dengê Me (1984), rojnama El Etîsam, bi zimanê Erebî li Dihokê li sala 1993, kovara Havîbûn li Elmanya, kovara Peyv, kovara Metîn."[340]

Hizirvanî komeleka berheman hene ku ji çendîn vekolîn û babetên wergêranê pêk dihên dikovar û rojnameyên deverê da belavkirîne û zêdebarî çendîn berhemên dî yên ciyawaz hene ku hindek ji wan çap bûyîne û hindek heta nike destinivîs in û nehatîne çapkirin.

Ji berhemên çapkirî:

**a. Edebî**

- Ez û Agir, 1989, Bexda- Helbest.
- Mirin Di Kavlanê Xencerê Da Dihête Ji Bîrkirin, 1996, Dihok- Helbest.
- Narîna Gulbarin, 2002, Dihok- Efsane.
- Hêlên Sor, 2004, Dihok- Roman.
- Pirtiştên Berzebûy, 2005, (4 berg) Dihok- Helbest.
- Zînê û Leşkerê Nikilzeran, 2005, Dihok- Amadekirin bo zarokan.
- Azrandina Bendemanê, 2008, Dihok- Helbest.
- Firîn Di Pencerê da, 2010, Dihok- Helbest.
- Şupên Rondikan, 2011, Dihok- Roman.
- Stranên Emerê Evdê, 2011, Dihok- Folklor, Civandin.

**b. Vekolîn**

- Zarokên Cîhana Rastî û Aşopê, 2005, Dihok.
- Sîseban, 2009, Dihok .

**c. Wergêran**

- Pînokîyo, 2006, Dihok.

[339] Nehêlî, Nimettulla Hamd, praktîzekirna rexna nû ya Englu Emrîkî r.ser textên grupa nûkrin Her û Her(rexne û vekolîn), r.30.

[340]Ebdulla, Hizirvan, hevdîtin, Dihok/baregayê (govara Metîn), 21/1/2016.

- Xêzana Robinson ya Swêsrî, 2007, Dihok.

- Siyaseta Pîla Sêyê, 2010, Dihok.

- Heft Tîtalên Ektîfkirina Mirovî, 2001, Dihok.

Her wesa ji bilî van berheman jî bi dehan berhem û lêkolîn dikovar û rojnamên kurdî da belafkirîne, mîna Hawkarî, Beyan, Rewşenbîrî Nwê, Karwan, Nûserî Nwê, Dengê Me, Nûxwazî, Peyv, Gazî, Serhildan, Evro, War, Raman, Gulan, Biyav, Peyman, Havîbûn, Xebat.[341]

Ew berhemên li xwarê jî nehatîne çapkirin û li benda cape ne.

**a. Edebî**

- Dîwana Nehê.
- Dîwana Çarînên Hizirvanî.
- Dîwana Kurte Çaman (Haîko).
- Camîcem, Roman.
- Kinar Jovanî yê, Roman.
- Befrîna Beravî, Roman.

**b.** Vekolîn

- Dastana DimDim – Şaxek Nebelavkirî.
- Dîroka Êlê Şikakan.
- Vekolînên li dor Çamê (Helbestê), jişeş vekolînan pêk dihêt.
- Vekolînên Mîtolojî, ji çend vekolînan bêk hatiye.

**c. Wergêran**

- Nefreta Petrolê, jinivîsîna D.Gurdun Jonson.
- Pîter Pan, ji nivîsîna G.M.Gary.
- Kurd û Avakirina Neteweyî, jinivîsîna Martin Van Bruinessen.
- Dê Çawa jibo Zarokan Nivîsî, jinivîsîna John Aykin.[342]

### ❖ Fazil Omer

Li sala 1962an li gundê Girreş yêli ser bajarkê Zaxweve hatiye ser dinyayê. Ji ber rewşa şoreşê li Kurdistanê, seretayî li gundê Bastikê û Girreşî xwendiye û amadeyî li Zaxwe û Sêmêlê û Duhokê

---

[341] Ebdulla, Hizirvan, hevdîtin, Dihok/baregayê (govara Metîn), 28/1/2016.

[342] Ebdulla, Hizirvan, Hevdîtin, Dihok/baregayê yeketiya nvêserên kurd, 6/3/2016.

xwendiye û li sala 1986na koleja Nûjdarî li zankoya Musil xilas kiriye.Yekemîn berhema wî "Kurteçîrok" li sala 1983yna li kovara Karwan belav kiriye.Ew endamê yekîtiya Nivîserên Kurde û ji sala 1992yan ta ku 2007an endamê desteka rêveber bû û du salan serokê tayê Duhokê bû. Du salan endamê akademiyaKurdistanê bû. Ji desteka nivîsera van kovar û rojnameyan bû; Dengê me, Tîroj, Nûxazî, Serhildan, Metîn(sekretêrê nivêsînê bû), serinivîserê Başkoyê Edeb û Huner (13jimare) û demekî sernivîserê kovara Sivore ya zarokan bû, salekê serinivîserê kovara Peyv bû, endamê grûpê Her û Her Nûkirin bû. Pişkdarî di pranîya bizav û karên rewşenbîrî da kiriye û bi dehan kurs u semînarli nêzîkî çarêk sedê borî de pêşkêşkirîne.[343]

Li piraniya warên edebî û rewşinbîrî dinivîsît: kurteçîrok, ziman, helbest, lêkolîn, hizir, wergêran, şanoname, ferheng hwd. Ew serokê Yekemîn Gera Encumenê Parêzgeha Dihokê bû (2005 – 2014), herwesa endamê sendîka Nojdarên Kurdistanê ye, û herwesa endamê Sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye.[344]

Berhemên Fazil Omerî:

**1. Berhemên Çapkirî**:

**a. Çîrok**

– Kalê Pêşîman.

– Werguhêzkên Memoyî.

– Sê Çîrok.

– Peqoşka Balefir(çîrokek dirêj bo zarokan).

**b. Saxlemî (Wergeran ji Inglîzî):**

– Rewşenbîrî bo Saxlemiyê.

– Çareseriya Balgehê li Bingehên Saxlemiyê û Tîmarxaneyan.

– Çavdêriya Dayikê û Zarokî li Bingehên Saxlemiyê, Rêberê Karî.

**c. Ziman**

– Awirek li Zimanê Kurdî.

– Gîrekên Zimanê Kurdî.

– Hilkolana Zimanî.

– Gencîna Peyvên Avêstayê.

[343] Omer, Fadil, hev Peyvîn: li baregayê kenalê Waar, 15/2/2016.
[344] Omer, Fadil, hev Peyvîn: li baregayê kenalê Waar, 15/2/2016.

– Ferhenga Zimanê Partiyan.

– Wexerek li Nav Pêrbestên Zimanê Kurdî.

**d. Lêkolîn**

– Nivêjek Mestane li dor Gunbeda Cizîrî.

– Zimanê Sêyem, Kanîya Her û Her Nûkirinê.

– Mirov di Gêjevanka Jiyanê da.

– Mêmêtîkis, ji Hizirkirinê taku Îdeolojiyê

– Nijiyargerî, Derazînkek Destpêkî.

– Hilweşandin.

– Mêtra û Mêtraperêsî.

– Sêhrebendî ya Berdewam (Zimanê Çameyê).

– Demokirasî li Rojhilata Navîn – Astenga Jêrxanî.

– Şoreşên Cemawerê Ereb.

**e. Wergeran ( jiİngilîzî):**

– Kevne Dîtinên İranî û Kurdî di Enisklopîdiya Brîtanîka da.

– Gotinên Navdaran.

– Çîvanokên Îsopî.

– Gencîna Jîrokan (bo zarokan).

**2. Berhemên li ber çapê amade:**

– Berperên Hinda.

– Zad û Vîtamîn.

– Gotinên İngilîzan.

– Awirên Gomandaran (gotar).

– Gundê Saxlem (wergêran).

– Dema Hizir Şerrenîxê Diken.[345]

### ❖ Mihsin Qoçan

Mihsin Muhemed Xidir, li sala 1954ê ji binemaleka cotyar li gundê Bamernê jidayik bûye.Jiber şoreşa eylulê û şer û şoran li sala 1961 mala wan hatiye veguhastin bobajêrê Musilê.

[345] Omer, Fadil, hev Peyvîn: li baregayê kenalê Waar, 15/2/2016.

Wî xwendina xwe ya seretayî û navincî û amadeyî li bajêrê Musil bi dûmahî înaye.Li sala 1976an xwendina xwe ya zankoyê li Musil beşa Çandinî bi dûmahî înaye.Li sala 1970yan dest bi vehandina hozanê kiriye.Li navbera salên 1972 – 1973yan dest ji helbesta stûnî berdeye û berev helbesta azad çûye[346].

Muhsin Qoçan jilayê rejîma Be'si ve hatiye zîndankirin û eşkencedan.Jiber hozan û berhemên wî, bo maweyê 10 salan ji karê xwe hatiye dûrxistin.Divî maweyê 10 salanda jiber lawaziya barê aborî û kirêdariyê,Muhsin Qoçan paletiyê diket jibo ku bidestveînana nanê rojane blo zarukên xwe. Muhsin Qoçanî piştî ku li sala 1976an zankoya xwe bi dûmahîk îna, li sala 1980 dibîte pêşmerge, li çol û çiya bo maweyê 5 salan pêşmergatiyê diket, li sala 1985an careka dî vedigerîte ve bo bajêrê Duhokê, li wê derê komeka lêkolînên wêjeyî hebû. Wî li wêrê Komeka gotaran û lêkolînên rewşenbîrî û komeka çîrokan jî belav kirîne.[347]

Mihsin Qoçanî du kitêb ji zimanê Erebî wergêrane ser zimanê kurdî
1 – Hingaftina paşerojê, Arvîn Tuvwar

2 – Kîne em, Smayil Henogîn.

Mihsin Qoçan serokê Yeketiya Nivîserên Kurd/Dihok bû bo mawê heft salan. Herwesa endamêYeketiya Nivîserên Kurd e û bo maweyekî rêveberê televîzyona Kurdistanê bû. Dîsa endamê desteka nivîsîna rojnama Botan bûye, endamê desteka kovara Nûxazî bûye, sernivîserê kovara Peyv bûye. Endamê Sendîka Rojnamevanên Kurde, endamê desteka grûpaNûkirin Her û Herbû, serokê Senterê Ronakbîr yê Roje, ji damezrênerên Rêkixrawa Mafên Medenî ye.[348]

Mihsin Qoçanî du dîwanên çapkirî hene. Berhemên wî bi giştî ev in:

– Befra Li Vêrê, 1986.

– Wêneyek ji Filmekê Pirçyay, 1994.

– Çavên Ewê Kiça Henê, 1995.

– Ew Rêbarê ji Xwarina Leşê Xwe Têr Nebît, 1996.

– Layê Germ Ji Bajêrî, 1998.

– Ew Xewna li ser Fîstanê Wê Bûyme Zava, 2001.

[346] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 27/2/2016.
[347] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 27/2/2016.
[348] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 27/2/2016.

– Direwek li Çepa Serî ya Qasonî, 2005.

– Xidiro, 2007.

– Stran, 2009.

– Berî Befr Bibarît, 2010.[349]

❖ **Şukirî Şehbaz**

Şukirî Îsmaîl Şehbaz li sala 1962an li Duhokê ji dayik bûye, xwendina wî ya seretayî û navincî û amadeyî li Duhokê bûye, li sala 1982an peymangeha gihandin li Bexda timamkiriye. Li sala 1971an jibo yekemîn car hozan li yana torevanên genc li Bexda bi hilkefta bestina kongireya yekê ya yanê xwendiye.Her ew hozan hate wergêran û bi zimanê Erebî li Bexda belav bûye. Her ji sala 1982yan û pêş ve endamê Yeketiya Nivîseran e. Li sala 1981an hozaneka xwe bi zimanê Kurdî dikovara Karwan da belavkiriye.Wî pişkdarî di zorbey festivalên edebî û korên şi'rî da kiriye li Hewlêr, Silêmanî û Duhokê. Ew li sala 2004an berpirsê ragihandina sendîkaya rojnamenivîsan bû, her ji sala 2004an heta niha rêveberê radyoya Behdînane li Duhokê.Her ji sala 2011an ta niha serinivîserê kovara Peyv e. Dîwaneke çapkirî heye bi navê *Kevalekê Rwis*ku li sala 2005an hatiye çapkirin.Ev berhema wî hilbjardeyeke hozanên wî bûye, wî zor hozanên dîtir ên nebelavkirî jî hene[350].

❖ **Selman Kovilî**

Selman Mihemed Selîm Silêman, li sala 1953yan li gundê Rustînka devera Doskiya hatiye ser dinyayê.Ew bixwe xelkê gundê Kovlê ye, lewra nasnavê Kovlîboxwehilbjartiye. Hêşta ew li jiyê pênc saliyê bû, babê wî wexer kiriye.Selman berî biçîte qutabxanê li ser destê babê xwe Mela Muhemed Selîmî fêrî xwendinê bûye.Li sala 1961an çûye xwendingehê û li sala 1971an xwendina navincî bi dawî înaye.Li sala 1973yan dest bi vehandina hozana kiriye.Li sala 1975an weku karmend li serokatiya saxlemiya Duhokê hate damezrandin û bo demekê dirêj li wêrê maye, paşî hatiye veguhastin bo bingehê saxlemyê li taxê gelî û berdewamî da karê xwe ta sala 1993an dihête xanenişînkirin.Li rêkeftî 20.12.2003yan çûye ber dilovanya xwedê ûli goristana

[349] Qoçan, Mihsin, hev Peyvîn, li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok, 27/2/2016.

[350] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.36.

şaxkê li Duhokê hatiye veşartin.Dibiyavê rewşenbîrî da yê çalak bû, desteka nivîserên Kurd, kovara Nûxazî , Metîn bû, endamê grûpa NûkirinHer û Her bû, çendîn dîwanên şi'rî yên çapkirî hene, weko: Werine Evînê (1988), Cîhana Guha (1996) Demê Çar Goşe (1998), Tîr ji Kevana Daweşiyên û Ber Têne Min (2006), her wesa çendîn gotarên rexneyî û edebî û rewşenbîrî giştî jî belavkirîne[351].

❖ **Arif Hîto Ebdulrehman**

Li sala 1968ê li gundê Balete yê li ser Duhokê ji dayikbûye.Xwendina xwe ya seretayî, navincî û amadeyî li Duhokê temam kirîye û paşî çûye zanîngeha Mûsil û Koleja Pizîşkiyê li sala 1992yan bi dûmahî înaye.Li sala 2001an dîploma bilind bi çareserkarîya derûnî wergirtîye ji zanîngeha Umyo ya Swêdî, bi rêka rêkxwerawa Diaconya. Li sala 2004an bawernama master bi nexweşiyên derûnî yên zarok û sinêleyan ji zanîngeha Duhokê wergirtîye. Li sala 1992yan heta sala 2000an weku nojdar û paşî nojdarê zarokan li nexweşxaneyaDuhokê kar kirîye.Paşî li sala 2001an bûye berpirsê senterê çareserîya nexweşîyên derûnî li Duhokê.Ji sala 2006an heta nihe berdewame weku rêveberekê giştî li wezareta kar û karûbarên civakî li Hewlêrê.Her ji salên heştêyan dest bi nivîsera helbestê û komkirina folkloraKurdî kirîye û yekemîn berhem li rojnama Hawkarî li sala 1987an belavbûye. Li sala 1994anbû yekji damezirênerên grûpa "NûkirinHer û Her". Li sala 1993yna komeka helbestan bi navê Dil û Deriya Çadir belav kirîye û li sala 1995an yekemîn komele şi'ri bi navêNan û Birîn û Bişkorîn belav kirîye. Piştî Kongireyê Raperîn li sala 1991an bûye endamê Yekitiya Nivîserên Kurd û li sala 1999an bûye endamê desteka rêveber ya yeketiyê liqê Duhokê û paşî bûye rêveberê nivîsera kovara Peyv û paşî bûye sekretêrê kovara Peyvê.Bo maweyê dû salan sernivîserê kovara "Peyv" bû (2005- 2007).Di navbera salên 2004 û 2006anserinivîserê kovara "Saykulojya" bû li Duhokê.Ji sala 2003an heta 2007an sernivîserê zincîreya "Evînî" bû ji bo çîrokên zarokan bû. Li sala 2007 serinivîserê kovara "Geşe" bû li Hewlêrê ku yek jimare jê derkeft û paşî rawesta.Pişkdarî di gelek festîval û bîrewerîyên rewşenbîrî û edebî da kirîye li derveyîKurdistanê û dinav Kurdistanêda.Her wesa li gelek festîvalên şi'rî yên Kurdistana Başur û Bakur şi'îr xwendîne.[352]

Ji bilî nivîsîna şiîrê, gelek kitêb û namîlkeyên wêjeyî û nojdarî û derûnzaniyê ji zimanên ingilîzî û erebî wergêrane ser zimanê kurdî.Herwesa komeka gotarên rewşenbîrîya giştî û rexneya wêjeyî û

---

[351] Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor, ezmunî Nîxazî, lay şa'îranî livînî (Nûkirin Her û Her), r.38 - 39.

[352]Hîto, Arif:hev Peyvîn, , li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok 1/4/2016.

babetên derûnî li rojname û kovarên Kurdistanê belavkirîne.Di demên cudacuda da hindek berinamên rewşenbîrî û nojdarî li têlevizyona Xebat/ Dihok û kenalê asmanî yê Ktv û radyoya Dihok û radyo ya navxweyî ya Zaxopêşkêşkirîne.Zêdebarî endamê Yeketîya Nivîserên Kurd, endamê Sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye û endamê Sendîka Pizîşkên Kurdistanê ye.Herwesa endamê damezrînerê rêkixrawa KONKURD e û rêkxrawa Mafên Medenî li Kurdistanê bû ku jibo civakê sivîl kar dikirin.[353]

Heta nike 43 kitêb û namîlke jişiîr, çîrok,folklore, rexne û rewşenbîrîya giştî û civakî û zansitî û wergêranên edebî û zanistî çapkirîne. Li xwarê nav û salên çapbûna her kitêbekê yan namîlkeyekê heye:

**Berhemên çapkirî yên D. Arif Hîto**

**a. Berhemên Nivîsayî**

- Dil û Deriya û Çadir, şiîr, Dihok1993.
- Nan û Birîn û Bişkurîn,şiîr, Dihok 1995.
- Awazên Simfonyeka Girçin, şiîr, Dihok1997.
- Merheba,şiîri ,Dihok 1998.
- Rustemê Zalê,Folklor,Dihok 1999.
- Şîzofrînya. Lêkolîneka derûnî ye, Dihok 1999.
- Pestên Bazineyî, şiîr, Dihok 2001.
- Sema,şiîr, Dihok 2002.
- Payîza Çiyay,şiîr, Dihok2004.
- Hizir û Dîtin. Rewşenbîrîya giştî, Dihok 2004.
- Dalehîyên Kesekê Bitinê, çîrok, Dihok2007.
- Hilweseyên Zînê,şiîr, Dihok 2009.
- Hepareyên Baranê,şiîr, Dihok2010.
- Despêkek Derbarey Madideyên Bêhoşker, Lêkolîn, Hewlêr 2010.
- Mirov û Civak di Guherîneka Berdewamda ne, Komelegotarên Derûnî û Civakî, Hewlêr 2011.
- Roman Xwedîka Jiyanê ye, Rexneya Wêjeyî, Hewlêr 2011.
- Give Bayekê Kanûnî, Dihok 2011.

[353]Hîto, Arif:hev Peyvîn, , li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok 1/4/2016.

- Stranên Pela,şiîr/ komberhem, Hewlêr 2012.
- Nameyên Bay, şiîr, Hewlêr 2016.

**Di warê Edebê Zarokanda:**

- Dirîk, Çîrok ji bo zarokan, Dihok 2004.
- Sitranên Hevnid û Vînê, şiîri ji bo zarokan, Dihok 2005.
- Sîpan, Çîrok ji bozarokan, Dihok 2005.
- Şemdîn, Çîrok ji bo zarokan, Dihok 2006.

**- Berhemên wergêrayî ji zmanên îngilîzî û erebî:**

- Qurtalbûyên ji Eşkencedanê, Curekê nesaxane. Lêkolîneka derûnî – civakî ye, ji zimanê îngilîzî hatiye berhevkirin, Dihok 1997.
- Boçî Şêrvîn yê Xemgîne. Novilêt ji îngilîzî hatiye wergêran, Dihok 1997.
- Çend Pêzanînek Derbarey Xwarinê, Rewşenbîrîya xwarinê. Nojdarî/ Wergêran ji îngilîzî. Dihok 2000 – 2001.
- Çareseriya Melariyayê. Nojdarî/ wergêran ji îngilîzî, Hewlêr 2002.
- Zarok dijiyê yek saliyêda. Derûnî-civakî/ wergêran ji erebî, Dihok2002.
- Zarok dijiyê 2-3 saliyêda. Derûnî-civakî/ wergêran ji erebî, Dihok 2002.
- Rênûmaya Kontirolkirina Kolêrayê. Nojdarî/ wergêran ji îngilîz Hewlêr 2003.
- Barkirin Berev Deryayê. Hilbijardeyek ji çîrokên Zekeriya Tamir/ wergêran ji erebî, Hewlêr 2004.
- Xizîne. Çîrok jibo gencan/ wergêran ji erebî, Dihok 2005.
- Hevderê me, Çîrok jibo gencan/ wergêran ji erebî, Dihok 2006.
- Dizên Deryayê. Çîrok jibo gencan/ wergêran ji erebî, Dihok 2006.
- Ji Aşopa Zanisitî. Çîrok jibo gencan/ wergêran ji erebî, Dihok 2006.
- Zarokîniya Me Biparêzin, Lêkolîneka Derûnî – civakî ye/ wergêran ji erebî, Dihok 2006.
- Zarokên Tromadar û Pêşêlbûnên Pesta piştî Tromayê, Lêkolîneka akademîk e derbarey nexweşîyên derûnî yên zarok û sinêleyan/ wergêran ji îngilîzî, Dihok 2007.
- Teorîya Wêjeyê / jinivîsîna Austin Warin, Rene Wellek wergêran ji erebî/ Dihok 2008.
- Rêgirî û Xweparastin le Xwekuştin, Wergêran ji zimanê îngilîzî, rênûmayîyên rêkixrawa saxlemî ya cîhanî, Hewlêr 2012.
- Mercekanî Tendirustî û Selametî Pîşeyî, Wergêran ji zimanê erebî, rênûmayîyên bingehê nîştmanyê tendirustî û selametî pîşeyî li Bexdad- Îraq, Hewlêr 2013.

**Berhemên wergêrayî ji zimanên îngilîzî û erebî di warê edebê zarokanda**:

- Sêndirîlla, Ji weşanên rêkixrawa mafên medenî li Kurdistanê / wergêran ji erebî, Dihok 2003.
- Beçke Şêrên Daristanê. Ji weşanên rêkixrawa mafên medenî li Kurdistanê/ wergêran ji Erebî.Dihok 2003.
- Herkol û Ejdîha, Ji weşanên rêkixrawa mafên medenî li Kurdistanê/ wergêran ji erebî.Dihok 2003.
- Terzan Şahê Daristanê, ji weşanên rêkixrawa mafên medenî li Kurdistanê/ wergêran ji erebî, Dihok 2003.
- Alîs li Warekê Seyr, ji weşanên rêkixrawa mafên medenî li Kurdistanê/ wergêran ji îngilîzî.Dihok 2004.
- Kerê Jîr, ji weşanên bingehê çareseriya derûnî liDihokê/ wergêran ji erebî.Dihok 2005.
- Dindika Sîhrî, ji weşanên bingehê çareseriya derûnî liDihokê/wergêran ji erebî, Dihok 2005.
- Horîya Deriyayê ji weşanên bingehê çareseriya derûnî liDihokê/ wergêran ji erebî, Dihok 2005.
- Berîkanê, ji weşanên bingehê çareseriya derûnî liDihokê/ wergêran ji erebî, Dihok 2005.
- Pişîka Fêlbaz, ji weşanên bingehê çareseriya derûnî liDihokê/ wergêran ji erebî, Dihok 2005.
- Befra Spî û Gula Sor, ji weşanên bingehê çareseriya derûnî liDihokê/ wergêran ji îngilîzî, Dihok 2006.
- Extobarî, ji weşanên bingehê çareseriya derûnî liDihokê/ wergêran ji erebî, Dihok 2006.
- Geliyê Heyva Şîn,  du çîrokên wergêrayî ji bo zarokan, ji weşanên kovara Svore/ wergêran ji îngilîzî, Dihok2008.[354]

[354]Hîto, Arif:hev Peyvîn, , li baregayê yeketiya nivîserên kurd, Dihok 1/4/2016.

# BEŞA SÊYEM

## PIRAKTÎZEKIRIN

### 3.1.Diyarkirin û Şirovekirina Efsaneyê di hozanên Hizirvan Ebdullayî da

Hizirvan Ebdulla weku helbestvanekê diyar li devera Behdînan xwedan şêwazeke taybet ya afirandinê ye di grûba hozana Nûxazda.Ji berku berî niha me behs li jiyan û berhemên hozanvan Hizirvan Ebdulla kirîye, nihe em dê hewil deyn ku behs li hozanên hozanvanê navbirî bikeyn ji layê rûxsar û naverokê ve.Helbet hozanên Hizirvan Ebdullayî bi darêtineka ciwan û teknîk û formên hemerengên nivîsîna hozanê hatine nivîsîn, anku bi nêrîn li vexwendina hozanên

Hizirvan Ebdullayî herwesa vekolînkirin li ser dê ser û sîmayên hozana Nûxwaza kurdî li devera Behdînan têda diyar bibin.

Ev vekolîn ji bo praktîzekirinê dîwana hozanvan Hizirvan Ebdullayî ya bi nave “Hindek ji We û Hemû ji Min” kiriye armanc û dîwana ku ji du bergan pêk dihêt û hemî berhemê hozanê yê Hizirvan Ebdullayî bi xweve digrît, her ji yekem hozan bi navê “Werîs” ku li havîna sala 1979 nivîsaye û heta derçûna berhemê wî li sala 2009, anku berhemê30 salan têda heye. Girîngîya vî berhemî bo vekolîneke bi vî şêweyî  di wî mawê dirêjê nivîsîna hozanê da diyardibît ku bidirêjîya demî guherînên berçav dihizir û şêwaz û teknîkên nivîsîna hozanê li def hozanvanî peydabûyîne, dê efayekê zor jêhîte wergirtin di vekolîna me da jib o diyarkirin û şîrovekirina berhemî.

Helbet bixwendina me ya yekê bo dîwana Hizirvan Ebdullayî gelek şêwe û formên hozana Nûxwaz yên ku li Ewrûpa serhilday têda diyarbûn, bi pêdiviya vekolînê dubare çendîn caran vekolerî xwendina vî berhemî kiriye, ji bo wê yekê pitir layenên edebî yên vê dîwanê diyarbiket û bi hişyarî û şarezayî reftar digelda kirîye.Ji encama vê xwendinê bo me diyarbû ku hozanvanî form û teknîkên hozana nûxaz a Ewrupî bikar anîne ku jiyaneka dî daye hozana kurdî û nûkirin û guherîneka yekcar zor têda encam daye.

Helbet dixwendina hozanên hozanvanê navbirî xwandevan tûşî hindek ladanên zimanî û şkandinên lojîkî û siyaqî dibît, anku xwandevan neçardibît dubare û sêbare hozanê biwîneve û bi şêwekê hûr û hişyar di hozanê da biçîte xwarê heta dihelbestê bigehît, evejî wî mewdayê berfireh yê hizirkirinê û firehendê vî berhemî diyardiket.

Hozanvanî di nav hozanên  xweda çendîn diyardên civakî yên nesaxlem dayîne diyarkin, ku merema wî pê helbestên xwe amajê bidete van diyardan ji bo nehêlana wan yan guherîna wan bidiyardên saxlem û pêşkeftî. Herwesa bixwendina hozanên Hizirvan Ebdullayî mirov dibînît ku hozanvan weku kesekê normal di nav civakê da diyardiket ku beşdarî xweşî û nexweşîyên civakê dibît û helbestên peyamdar arasteyî wergirî diket, evejî li dûv diruşmê “edebiyat di xizmeta civakî, siyasî, aynî hwd.” dihêt. Belê hindek caran hozanvan berev arastê dahênanê çûye û bi tenê bomerema ciwanîya hozanê û layenê estetîkê hozan nivîsiye.

Dişiyandaye ku vekolîn ji gelek layanve li berhemê hozanvanî bihêtekirin ku binemayên cuda cuda di hozanên wîda diyardibin; weku binemayên rêbazên klasîzm, romansîzm, realîzm, sûrealîzm, formalîzm, perinasîzm, hwd. Herwesa dişiyandaye bi rêka metodên ku giringiyê

didene layenê derve yê tekstî vekolîn li ser bihête kirin, herwesa metodên ku girîngiyê didene layenê tekstî bixwe ku girîngiyê bi layenê darêtin û avakirina tekstî diken.

Sebaret babetê vekolîna me ku diyarkirin û şîrovekirina babetê efsaneyê ye di hozanên Hizirvan Ebdullayî da, bixwendina me bo hozanên hozanvanê navbirî diyarbûye ku bi rêjeyeka baş efsane hatiye bikarînan di hozanên wî da, hêja ye bêjîn ku di bergê duyê da anku berhemê wî yê panzde salên dawuyê da rêja bikarînana efsaneyê bi şêweyekê berçav zortir bûye ji rêja bikarînana wê di berhemê 15 salên destpêkê de.Ev jî wê çendê didete diyarkirin ku ewguherîn û pêşgeftinên di nav civaka kurdîda hatîne kirin ku kartêkirineka yekser li ser edebiyata kurdî bi giştî û hozanê bi taybetî kirî, kartêkirineka berçav li ser hizir û babet û teknîkên hozana Hizirvan Ebdullayî jî kirîye.

Hozanvanî di hindek hozanên xwe da efsane weku babetê serekî bikar anîye û mebestên ciyawaz pê hebûyne, ji wanan diyarkirina êş û azarên miletê kurd û arîşe û diyardên civakî herwesa di hindek caran jî weku babetê evîndarî bikar anîye û caranjî babetên efsaneyî yên kurdî bo dubare saxkirina kulturê kurdî û mefa jê wergirtin ku kulturê kurdî rengvedana sîma û saxletên civakê kurdî diket.

Vekolerî di vê vekolînê da hewl daye ku nimûnên jêgirtî di nav berhemê hozanvanî hilbijartîne bo babetê vekolînê di pişka praktîzekirinêda û herwesa bixwendin û komvekirina rêjeyeka zor ya efsaneyên kurdî û efsaneyên miletên der û ber û cîhanî, vekoler şiyaye bi hûrî û hişyarî serederiyê digel berhemê hozanvanî biket, ji bo wê çendê ku bigehîne hindek encamên rast û dirust û mefa jidiyarkirin û bikarînana efsaneyê di gişt berhemên edebî bihête diyarkirin, ka çewa di her serdemekî da mefa ji mêjûya gelên kevnar hatiye kirin, wesa mefa jiefsaneyên miletên kevin û bi taybetî efsaneyên kurdî bihête wergirtin di vekolînên edebiyata kurdî da.

Weku berî niha me gotî ku di vê beşêda ku beşa praktîzekirinêye di vekolîna meda, em dê rabîn bidiyarkirin û şîrovekirina efsaneyê di hozanên Hizirvan Ebdullayî da bigerîn.

Di hozana “Wêneyên Berûvaj” da ku li sala 1981 hatiye nivîsîn, wesa hatîye bi kar anîn.

" Belê yarê, bilinde li bejna spîndarê, çend germe toz
Sîngê wê biken pawan û koz, bên bazvîrk, bibin bahoz
Dê hermînît şenge roja min peristî welê pîroz

Tiblên yara min manî ne/ diraçînin pîroztirîn nexş û tevin
Pîroztirîn reng û tevin/ ciwanî li hevin."[355]

Di vê hozanê da hozanvanî bo mebesta diyarkirina radda hez jêkirinê beramber hezjêkirîya xwe, efsane bikar înaye, ewjî ku hezjêkirina xwe hevberkiriye bi "peristina rojê" ku ji aynên kevnên destpêkî yên mirovî bûn, ku ew ayin bûn ewên li ser efsaneyê ava bûyîn, lewra di vê parçe şiîrêda hozanvanî hezjêkiriya xwe bi rojê wesifkiriye ku li def wî rada pîrozîya rojê heye di aynên rojperêsanda.

Di hozana “Dîkil” da ku li sala 1982an da hatiye nivîsîn wesa hatiye gotin:

"Spêdeye
Ew elinda me digot dêhêt,
Hemû kenî û bişkorîne
Digel tîrojkên hetavê Ehrîmen dê bimirîtin
Xelkê gotin: Ehrîmen mir ...
Belê xwedê rojê çi kir?
Dixwest, wê umêda didilê meda jê derbîne
Havê vê gavê jî, cotyar û pilên gundê me
Karkerinbo pariyek nanî
Li ber dîwarên mizgeftan tijî hejar û birsîne"[356]

Di vê hozanê da babetê efsaneyê bi peyva “Ehrîmen” ku xwadewendê xirabîyê ye di aynê Zerdeştî da bikarînaye, ev çendejî bo wesifkirina dijminên miletê kurd bi taybetî liherêma Kurdistana Îraqê ku miletê kurd tûşî zilm û zordarîyeka mezin bû ji layê desthilata diktatora Îraqê ku Sedam Husên bi Ehrîmen wesif kiriye di vê hozanê da.Ji xwe demê nivîsîna vê hozanê vedigerîte sala 1982an ku di vê sale da hewla kuştina Sedam Husênî hate kirin li qeza Dicêl ya bi ser parêzgeha Selaheddîn ve ji layê şoreşgerên Şî'e mezheb yên ser bi parta De'we encamp da. Lê belê di dawiyê da hewla kuştinê ser negirt, lewra di hozanê da hozanvan li ser zarê xelkêdibêjît: “xelkê gotin: Ehrîmen mir ...”anku bi bihîstina vê hewlê keyifxweşî li def xelkê Kurdistanê peydabû ku dê ji Ehrîmenî rizgarbin.

355 Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min, komberhemê helbestê, b1, çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2013, r.28.
356 Ebdulla, Hizirvan, hindek ji we û hemû ji min, b1, r.61.

Herwesa hozanvanî peyva “Xwedê rojê”bikar înaye ku ew jî xwedawendê herî mezin bû di aynên kevin ên miletên Kurd û herwesa miltên rojhilat da. Mebesta hozanvanî jî bikarînana vê peyvê ew e ku qedera Kurdan di wî demî da her jêrdestî bû mana Ehrîmenî, anku li jêr zilm û zordariyê bimînin ku rexne li qederê digirt ka bo çî Ehrîmen nemir? Herwesa dihozanê da îşaret bi berdewamîya xebat û têkoşana miletê kurd daye ku dê diberdewam bin li ser bizava rizgarîxwaza gelê kurd.Li dûmahiyê rexne li "mizgeftan" kiriye anku aynê Îslamê ku li jêr desthilata vî aynê ku li ser miletê kurd û miletên rojhilat hatîye sepandin, zilmeka zor li miletê kurd hatîye kirin.

Di hozana “Birrîna Darê” da ku li sala 1982an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Ez çûme bin dareka ter û min gotê: dê te birim
Darekê baş jitehilgirim, bo dest bivrî
Lê wê darê kire girî û got: nekey tu min bibirrî
Ez nabime deste bivir, min di vêt ev jîna zivirr
Ger te birrîm min bike darê bêjîngê li ser bêderan
Her çûne bît harîkarim di gel cotîyar û rêncberan."[357]

Di vê hozanê da hozanvanî hizra wî jiefsaneya “Pêxember 'Uzêyrî” wergirtiye ku liwê demê diçît ku dê dara birît, dar digel diaxivin û hêviya jê diken ku bo sotinê bikar neînît, lewra hozanvanî ev babetê efsaneyêbikarînaye bo diyarkirina gotina folklorî ya kurdî yaku dibêjît “dar bi darê dihête birînê” anku “destikê bivrî her ji darê ye”. Herwesa mebesta hozanvanî ji azrandina vî babetî ewe ku çimilet neşên zordariyê limiletekê dî biken eger kurên wî miletî harîkarîya wî neken, anku nameyeke bo miletî daku takên wî harîkarîya dijminê miletê xwe neken.

Di hozana “Qamçî û Bersiva Wan” da ku li sala 1982 hatiye nivîsîn, wesa dihête gotin:

"Li vê kolanê...
Dengê şîrrêna qamçiyan, dengê girîna bêçiyan
Roj berzebû, heyv direng zer bû
Esmanî rondik barandin, evran da bertilîlîyan
Kînek peqî!!

[357] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.74.

Çaxê ez çûn, du dirrinde yê di xwîna xwe digevzin
Zitiro kenîn, qamçî ketin û û pijîkîn
Zarokan got: bimirît zordarî û dilreqî
Her bijît rastî û her bijît heqî."[358]

Di evê hozanê da çend wêne û bikarînanên efsaneyî têda diyardibin, weku “zû berzebûna rojê, û direnghatina heyvê, û girîna asmanî, tilîlyên ewran” ku derbirînê ji xem û êşana û azaran diket, anku bi peydabûna nexweşyan siruşt xema mirovî hildigrît, evejî derbrîne jimezinî û sextiya nexweşiyan, herwesa hozanvanî peyva “dirrinde” bikarînaye ku di wesfa wîda hatiye yên ku di xwîna xweda digevizin, anku ev hozane hatiye nivîsîn li ser demê şerê di navbera dewleta Îraq û Îranêda ku herdu dewlet li jêr hukmê dîktatoran bûn,  lewra ji encamê şerî herdudirunde (diktator) tûşî şikestinên mezin bûn kumiletê kurd di vê delîvêda hêviya wê çendê dixwast ev sîstemên dîktatorî ji nav biçin, lê pêdivî ye diyarbiken ku li demê peydabûna şeran bi tenê milet bacê diden ewjî bi xwîna xwe û diberamberda serkirde pitir bihêz dikevin û xirûr dibin.

Di hozana “Tewafkirin” da ku li sala 1983an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

" ...
Deriya çavên te ya pirr meyî ez yê têda
Ji tirsa bayên şevsahî yê ne nivîne
Lêgerên min kesîre bûn
Windayên min yên ketîne nav royekî
Tiblên min evro masîne
(Ahora) yê ji min sile
Lê bûna wan min ji dile
Ez gerokê sîngê teme
Wekî goynê nav şevan
Sewda serê şev reşa pirça teme."[359]

Di vê parça hozanê da ku behs li babetê evîndariyê kiriye û viyanê derbarey xweştivîyaxwe, peyva “Ahora”bikarînaye ku peyveka efsaneyî ye ew jî navê xwedawendê tak û

[358]Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.85.
[359]Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.103.

mezin yê aynê Zerdeştiyan “Ahoramezda” ye.Li vêrê hozanvanî mebest jidiyarkirinê ku Ahora mezda yê jê sile, ewe ku di navcivaka me ya kurdîda û li jêr karîgerîya ayînê bi çavekê nebaş û nerênî temaşey evînî û 'eşqê dihête kirin, evejî dibîte rexneyek licivakê û aynî.

Di hozana “Dilê min” da ku li sala 1983an hatiye nivîsîn, wesahatiye gotin:

"Renda minê, dilê min baxek nîv rût e
Bê pêjane, yê bê çîte
Terg diqutîtin, germ disojîtin
Hemû rojan, hemû şevan, her dêwekî dijî bêhnê
Ji xwera gulek min dibirê."[360]

Di vê hozanê da hozanvanî her weku hozana berî niha behs li babetê evîniyê kiriye, lê bi şêwazekê dî behs kiriye ku behs li xerîbî û hezlêkirina zêde diket, herwesa bikarînana peyva (dêw) yê efsaneyî ku di efsaneyên kurdî yên folklorî da hene bikarînaye û di wesifkirina wî da ku gulê bo xwe dibirît anku li beramber dêwî ew penayê dibete ber bêhna gulê.

Di hozana “Ji Cegerxwîn bo Gîvaray” da ku li sala 1983 hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Min dît ... Min dît
Pîrhevok ji kevlê dayika min hatin der
Cotê memka bibûn xencer
Çipkên şîrî bibûn jehir
Min dît ... Min dît milet hejar û qelender
Bûka me sed reng kirine ber
Zava di xwîna tezî wer bû
Govendî man bikul û keser
Min dît ... Min dît bêdera me hêj ne pîvay
Hizra şane di hatin ser
Ejdehar bûne sêzde ser
Roja esmanî wergerriya heyv kete ber
Min dît ... Min dît

[360]Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.105.

Hêj payîza, 'evrên dihatin bi deng û şerr
Terg û gijk jê dibarîn
Rez û miştax dêk dperçiqîn
Dibûne herrî kanî, ji qerrsê dibûne ber
Ji hîngê were milet her ma
Derazînkên xwe kirine gorr
Ji welatê xwe ne çûne der."[361]

Babetê vê hozanê babetê neteweyî û nîştîmanî ye, lewra hozanvan rabûye bi têkelkirina babetên efsaneyê di nav hozana xwe da û wesifkirina barûdox û êş û azarên miletê kurd û nexweşî û zordarîya lê dihête kirin bi babetên efsaneyî, ewjî li demê behs li "pîrhevukê"diket ku wesa wesf diket ku pîrhevok di efsaneyên kurdî yên folklorî da hene û karên xirab û ziyanê digehînine mirovî ku ji nav miletî hatîne der, anku behs li wan kesan diket ewên kurên miletî û diçine digel dijminê miletê xwe û bi dijî miletê xwe kardiken, herwesa li demê behs li "ejdeha"diket ku bûyîne sêzde ser, ewjî behs li wan axa û began diket yên ku li vî serdemî, anku li salên heştêyan gehişitîne hikumeta Be'sa dagîrker û komên leşkerî (Çete) pêk înan û bi dijî xebata miletê kurd şer kirî. Ew "musteşar" bûn ku ji beg û axa û serok 'eşîrên kurdan pêk dihatin û ji bo berjewendiyên xwe yên takekesî şer bi dijî xebata rizgarîxwaza kurdî dikir, lewra hozanvanî ew bi "ejdehayê sêzde ser"wesf kirîne, ku ejdeha diefsaneyên kurdîda xirabkerin û wêrankirinê diken.

Herwesa di hozana "Roj Negirî" daku li sala 1983 hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

" ...
Pirça şîrîn le'lîxanê
Wekî tevnê dapîra min dêk alizî
Tenîn ... Li bin keviyên befrê rizî
Hindirînê qêrre ... Qêrre, çiya gestin koremaran
Li şîrînê hat birîn kezîkî
:ey roj mar keviran nagezin
Tejî hilal û nêrgizin
Keziyên şirînê robarin pêve dihejn

[361]Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.108 - 109.

Ehrîmenên me evroke di bê serîne/ dibê mejî ne"[362]

Di vê hozanê da peyva efsaneyî “Koremar” hatiye bikarînan ku amajeye bodijminî dike.Herwesa dayediyarkirin ku “Mar” neşêt ziyanê bigehînîte keviran anku dijminê miletê kurd neşêt ziyanê bigehînê ji berku bi pêvedana marî na êşin û xweragrin.Herwesa peyva “Ehrîmen” ku xwedawendê xirabiyê ye di aynê Zeredeştî dabikarînaye wek amajer bodijminî ku wesa diyarkiriye ku dijminên miletê kurd dibê mejî ne anku nizanin ka îrada miletê kurd û hêza bergirî û têkoşana wî bo rizgarîxwaziyê çenda bihêze.

Dîsan di hozana “Rêvingê Elinda Welat” da ku li sala 1983 hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Tu rêvnigî... Ha rêvingo, revendî birêke, birêke
Tîrojka germa beharê rengê xwe best
Rêvingê elinda welat
Siwarê bezê tîr û xame û xencer bi dest
Agir geş bûn, rêlistanên me roxweş bûn
Ehrîmen û tarî revîn, zivistanê pişt lê şkest
Koçer hatin, qumrîne, qaz in, qulingin
Rojeka nû... Ne Kaweye li vêrê dengday
Ne çekoçe li vêrê rengday
Biharê bo serê salê kire kenî
Bo kuştina zivistanê û Ehrîmenî
Berbûkîyên me rengînin, hizar rengin
Kale mêran sing vekirin ber hetavê
Xwîna pala germ bû, bo karî û bizavê
Deng çi dengin? Tevrim/ bêrin, bêrin, kolingin
Pale çak û çelengin."[363]

Di vê hozanê da peyvên “Ehrîmen, Kawe” yên efsaneyî hatîne bikarînan, ku Ehrîmen ji bo nîşandana dijminî hatiye bikarînan û Kawe ku hêmayê Kurdayetiyê û berxwedanê ye, li vêrê hozanvanî viyaye bidete diyarkirin ku miletê kurd berdewam di berxwedanêdaye, ne bi tenê bi

---

[362]Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.111.
[363]Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.112.

hebûna Kaweyî,belkî her kurdek her gencek û zarok û kal wek Kaweyî bergiriyê jimiletê xwe diken û ji bo azadiyê û rizgarbûnê ji bin destiyê kardiken.

Dîsan di hozana “Rêya Kaniyê” ku li 1985 hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Rêya kaniyê bi sengebere
Tev nihale, tenge dere
Ditirsim kanî bite daûrît
Çunkî çavên te kanîne ... Neçe, were
Qet min nevêt ji nik min biçî
Nijde dipirin di rêya te da
Di vên royê te bi herîmînin
Ji mêj were wan li bere
Siwarên Ehrîmenê zordar
Bi şevê digerin ... Ginawerin
Xelkêdikûjin, zeriyan didizin, seran dibirin
Ger te bivêt xwe bê rengkey hema herre"[364]

Di vê hozanê da hozanvanî behsê babetê xebatkirinê ji bo azadiyê kiriye ku gehiştin bo kaniyê bi gehiştin bo azadiyê wesifkiriye û rêka kaniyê ku rêka azadiyê û pir bi astengin.Li vêrî didete diyarkirin ku her miletekê bizava rizgariyê biket dê tûşî zehmet û nexweşiyan bît, lewra azadî bê qurbanîdan peydanabît, herwesa hozanvanî di vê hozanê da peyva “Ehrîmen” bi kar înaye ku  xwedawendê xirabiyê û nebaşiyê ye di ayînê Zeredeştî daku diyarkiriye ku siwarên Ehrîmenî zordariyê diken, anku amaje bizordariya ku ji layê dijminên miletê kurd ve dihête kirin daye.Ewjî li demê leşkerê hikûmeta Be'si ya 'İraqê zordarî limiletê kurd dikir ku xelk bi komî dikûjit û gund kavildikirin û bajêr wêran dikirin.

Herwesa di heman hozanê da wesa hatiye gotin:

"Rêya kanîyê li ber çiyayî, li nav gira
Xezalê got, ew nijdeyên
Lievan şevan rêkê digrin
Hemû dêw in, hemû gurgin, di vêt bimirin

[364]Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.158.

Jiyan di vêt bes ji xwera
Lewra laow; di vêt her yek ji vî gundî
Karê xwe biket agirkirin
Çunkî jikevin û ji dîrokê em agir hevdigrin
Hîngê xwedên rojhilatinê
Li ser berên rojê dê hên, dev li kenî
Ger dêw neman li van dirt"[365]

Di vê parça hozanê da hozanvanî behs li babetê peywendîya "Agrî" û pîrozîya wî li defmiletê kurd dike ku her di kevinda bipîrozî temaşey agirî kiriye, ku ewjî hêmayeke ji hêmayên aynê Zeredeştî, herwesa peyva "dêw" bi kar anîye ku peyveka efsaneyî ye ku diefsaneyên kurdî yên kevin da heye.Hozanvanî nave bo wesifkirina dijminên miletê kurd bikarînaye, herwesa diyarkiriye ku li demê ev dêwe nemînin anku gelê kurd jizordarîya wan rizgarbît, dê roj hilêt û gel bi azadî jît.

Herwesa di hozana "Yarê ... Ji ber teye" da ku li sala 1985an hatîye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Yarê çavên te bizotin, sîngê te kanî û sîpel in
Gomên reşebayê dijwar xwe di pirça te alandin
Ji lew evro gul û sitrî di nav yekhilin
Şaxên şevê, dêwên heft ser
Di mêrgan da xîvet vedan
"Mîrza" û "herza" dinivstîne
Du pismamên ne desthilin
Lê ji bîr neke li navbera min û şevê
Dirinde mirin û mexelin"[366]

Di vê hozanê da hozanvanî peyva "Dêwên heft ser" ku di "Roya Yûhana" da dipirtûka pîroz da "Serdemê Nû" hatîye gotin. Ew jî ku dêweke heft ser yên pêve di Încîlêda ramana wê zulm û zordariyê didet ku Kenîsa Xirîstiyan tûşî bûyê. Di vê hozanê da hozanvanî "dêwên heft ser" ku hêmayekê efsaneyî ye bikarînaye bo derbirînkirin ji zulm û zordarîya miletê kurd tûşbûyê

[365] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b1, r.160 - 161.
[366] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 1, r.213.

li Kurdistanê, bi taybetî li herêma Kurdistana Îraqê ku li demê nivîsîna vê hozanê desthilata diktatora Îraqî her curekê te'dayî beramber gelê kurd encam dida.

Herwesa herdu peyvên "Mîrza" û "Herza" ku du birane, qehremanên çîrokên efsaneyî yên kulturê kurdî ne, ku harîkarîya xelkê hejar û belengaz diken û ji tengavîyan xilas diken.Lê di hozanê da ku bi vî şêwey hatîye: "Mîrza" û "Herza" dinivsitîne, hozanvanî ev peyve bo herdu serkirdên şoreşên kurdî bikarînayne ku yek Mesud Barzanî ye û yê dî Celal Talabanî ye ku di vî maweyî da anku li salên heştêyan bi taybet 1985an agirê şoreşê liKurdistanê ta radeyekî kêm bibû û rejêma Îraqê bi hêzeka yekcar zor şoreş sînordarkiribû, lewra gazîya hozanvanî bo herduqehremanan ew bû ku hişyarbibin û careka dî rabin xelkêxilas bikenku li wî demî bi wesfa hozanvanî "dixew in".

Herwesa peyveka dî bikarînaye, ew jî peyva “Dirinde” ye ku di piranîya efsaneyên kulturî yên kurdî de bikarhatîye weku hêmayê xirabiiyê ku dibêjît: dirinde mirin û mexel in, anku amaje bi wê çendê kirîye ku li vî demî rejêma diktatora Îraqê di şerekê sext dabû digel Îranê, vê çendêjî rejêma Îraqê lawazkir, lewra gazîya hozanvanî ewbû ku dubare şoreş hilbîteve di vî derfetêda.

Di hozana “Şêr û Şepal”da ku li sala 1989 hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Du aşiqin yek çiyaye dêw ewrekî tengijî ye
Roj bînerek entîkeye
Çend derdikevît/ bi halê wan evîndara girnijî ye.
Befre ... Befre!!
Ji befrê spî bûye kêrî
Pêda were hêdî ... Hêdî hemû befre, heta binî
Pê xwe dane befr dihilyêt/ pêlava te dibîte bêrî
Li wê lata henê binêr, hemû rojan li ji vana du dildaraye
Li hîviya şenge şepalê ye/ şepal jî ya li hêviya şêrî."[367]

Di vê hozanê da hozanvanî efsaneyeka kevin ya kultura kurdî bikarînaye,  ewjî herdu giyandarên efsaneyî  “Şêr û Şepal” in ku Mîrza diçît şîrê şepalê di înît û birîna wê derman diket, ewjî şîrê xwe pêşkêşî wî diket.Hozanvanî ev babetê efsaneyî bo diyarkirina babetê 'eşq û evîniyê bikarînaye ku bipîrozî hejmartiye.Di wêneyekê hozanîda diyardiket ku roj çend derdikevît û temaşey aşqan diket, digrinjît anku hebûna eşqê yan peywendîya evîndarî di navbera kur û

[367] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 1,  r.226.

kiçanda tiştekê pîroze lewra sirûşt roj, befr, çiya, hemî bi hebûna eşqê şad û keyfxweş in, li vêrê hozanvan wesa didete diyarkirin ku bi hebûna eşqê jiyan pir omîd û hîvî dibît û bi şêweyekê nimûneyî bi rêve diçît.

Her di heman hozanê de wesa berdewam kiriye;

" ‘Şêr, ev e ezım şepal’ derecekê di geliya da were xwar"

Serê dêwê reş bibire û biramûse vê gerdena spî, wek keviyan.

Hêlek ya bûy

Bila çu ca hêlên mezin li vî welatê me ranebin

Hêlek ya bûy/ kevirên bi xwînê bûyîne gul

Berên şariyayin/ serên tîr û riman, tejî kirin paxil"[368]

Di vê parçehozanê da hozanvan peyamekê arasteyî şoreşgerên kurd diket ku pêdiviye li ser wan serê dêwê reş bibirin. Li vêrê dêw hêma ye bo wan serok 'eşîrên bûyîne “caş” û digel rejîma be'si rabûn bi encamdana enfalan, ku ev çende bûye egerê peydabûna hêlekê di navbera miletekî da hindek azadîxwaz yên din jî bi dijî miletê xwe şerî diken, lewra dibêjît hêlek ya peyda bûy, nabît çi hêlên dî peyda bibin.

Di hozana “Şivan Giyanê Şevê Dikûjin” da ku li sala 1986an hatîye nivîsîn, wesa hatiye:

" Memişvanê rewşendarê

Nav sebeqên Olê Yezî

Roj perêse

Şev ziravkir mîna derzî

Ew şvanê cilk diriyay

Bi dilek ji xweşîya ariyay

Ji xerîbîya bejna ciwanê

Bêrîvanê û kiras şorrê

Ya pivkirî ye bilorê, jibo pezî"[369]

[368] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min, b.1, rr.428-429.

Di vê hozanê da behsê peristina rojê hatîye kirin, ku di kevneayînên miletê kurd da hebû, bi taybetî aynê Zeredeştî de. Di hozanê da amaje biolê Êzdî hatîye kirin ku dirêjepêdane bo ayinên kevin yên miletê kurd, herwesa behsê “Bilûra” efsaneyî hatîye kirin ku gelek çîrokên efsaneyî li ser hebûne;dibêjin bi wê bilûrê pez diçerandin û diz û gurg dûr dikirin, di vê wesifkirinêda amaje bi zivirîn bo aynê resenê miletê kurd hatîye kirin ku bi tenê ew dê nasnameya miletê kurd vegerînite ve û “Memişvan” ku kesayetîyeka olî ya Êzdîye ji kesên çak kirîye hêmayek bo diyarkirina rolê aynê Êzdî û girêdana wî bimiletîve.

Herwesa di hozana “Hindek ji Dilovaniya Enahîta” ku li sala 1993yan hatiye nivîsîn wesa hatiye gotin:

" ...
O zînê / ji ber  hevjiyê evînê
Silavên spî, bi rêkirin ji bo "Bekoyî" û
Kulavek reş jibo "Mîrî" û ji bo "Memoy" xewneka mor
Jibo "Xanî", pênivîsê "Şerefxanî"
Ji bo "Çekoy", bo "Aloy" ji bo "Tacdîn"
Sê xencerên "Salih Begî"/ jibo "Sitiyê" guleka sor
Dijware tarî/ çunkî tarî ye, li nav jora min/ çirayek vemirî di xewe, li
ser jêrîneka vala.
Xewnên nebûnê dibîne, li behişta aramê
Ez radihêjim çirakê geş dihilgrim/ çunkî tarî ye
Hindek gaz/ çend rondikê, li ser roya bûyîne gelwaz
Mistek ji mergê xwe ez di demê
Hindek ji xweha hindek salan / û hemû bîranînên şamê
Petrol ji ferhenga Xanî werdigrim
Ne ez fêrî tariyê me / mirine tiris
Lew sed saleka ji dilovanîya "Enahîta" dikeme bixwer
Bi honerên "vehumenî" zarokên çavzerên rojê
Digel çirayên min yên nemir ...
Pîqanê diken li vê qamê ... Û li wê qamê

---

[369] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min, b.1,  r.249.

Arezoya min ev şeve
Ez bi yariyeka zarokînî xwe ji bîrvekem
"Avêstayî" bi keme deriya û çirayî li ser bikem papor
Ji ber sotina dost, hogiran "[370]

Di vê parçe şiîrê da hozanvanî peyva "Enahîta" bi karînaye ku di aynê Zerdeştîda xwedawendadayik û xwedawenda jiyan û ciwanîyê ye.Hozanvanî ev peyva efsaneyî bikarînaye dihozana xweda ku di demê aynê Zerdeştî bawerî bi hebûna vê xwedawendê hebû ku xwedawenda dilovaniyê bû.Wesifkirina wêbo barê civakî yê miletê kurd bi taybet û mesela "Bekoy" dicivakê kurdîda ku ew kese ewê radibît biînan û birina axivtinan û peydakirina arîşên civakî mijûl dibît.Herwesa hozanvan rexnê li sîstemê 'eşîretgeriyê civakê kurdewarî digrît, li demê kesanên mezin wekî axa û beg û serokê 'eşîretê û serokê binemalê maytêkirinê dijiyana endamê dibin xweda diket, yan çarenivîsê wan diyardiket bi taybetî di layenê pêkînana xêzanê ku dijayetîkirineka zor diken beramber evîndariyê û rêgirîkirina di navbera du evîndaranda bi hêcetên şeref, şerm, heram, … hwd.Lewra hozanvan daxazê jicivakî diket ku nimûnê ji dilovanuya "Enahîta"yê wergurinku hindek kar û kêşeyên civakî hene bi rêkên hêzê û nexweşî çareser nabin, belkî pêdivî bi dilovaniyê heye.

Dîsan di hozana “Ewên Nehêne Jibîrkirin” da ku li sala 1994 hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin.

"Di efsaneyada  ezdibûm "Mîrzo" û
Dapîr "xez" dibû pîrhevî û bor rêlistanek dirinde
Heku ez li avê digeriyam, cîhan tev da dibû biyaban
Li çaxê sirê ez dibirim, dibû zivistan"[371]

Di vê parçehozanê da hozanvanî qehremanê efsaneyî “Mîrzo”bikarînaye ku qehremanekê efsaneyî ye di efsaneyên kurdî da ku harîkariya xelkê hejar û feqîran diket.Hozanvanî di hozanê da xwe bi “Mîrzo” wesif kiriye, herwesa peyva “dapîr xez” û pîrhevî yên efsaneyî bikar înane.

Her dîsan di heman hozanê da wesa hatiye berdewamkirin:

" ‘Pîrhestanê’ avirek da çiyayê "şengal"
Hejîrên wan tev da xirş bûn

---

[370] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.11 - 12.
[371] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.21.

...
"Pîrbestanê" avirek da çiyayê "şêrîn"
Kew û kovîyên "Barzanî" tev bitirs bûn
...
"Pîrmestanê" lewendî ya xwe havête ser perên 'ewran
Çiyayê "Cudî" gemiya "Hemşîd"
Tiriyên "Silopî" û "Doskî"yan tevda tirş bûn"[372]

Di vê parça hozanê da hozanvanî peyvên "Pîrhestan, Pîrbestan, Pîrmestan" bikar înane ku hersêk xwîşkên yekin û pîrhevî ne ku di çîrokên efsaneyî yên kurdîda peyda dibin. Hozanvanî ev hersê peyve bikarînane bo derbirînkirinê ji doxê siyasî yê Herêma Kurdistanê piştî raperîna sala 1991an ku navça Herêma Kurdistanê azadî bixweve dîtibû, belê di wesifkirina hozanvanî di vê hozanê da demê behsdiket ku "hejîr tiriş bûn, kew û kovî bitirs bûn, û tirî tirş bûn" mebesta wî ji egerê kiriyarên van pîrheviyan dirustibûyî ew barûdoxê Herêma Kurdistanê bû ku piştî raperînê li dûv wê dîtin û xewn û umêdên xelkê nebûn, anku xelkê deverê hizir dikir ku piştî raperînê dê azadiyên temam hebin û barûdoxên siyasî baştir bin, belê bi wî astê nebû kuhizir jê dihate kirin.Lewra merema hozanvanî li vêrê rexnegirtina siyasî ye li serkirdên kurd piştî serhildanê. Ev jî biguherîneka binyatî dihête hejmartin di babetên hozanên hozanvan Hizirvan Ebdullayî da.

Hozanva di hozana "Rondikên 'Dudikvan'yê" da ku li sala 1994an hatîye nivîsîn wesa dibêje:

" ...
Ev ezmanê di devê meda çend bihostan ji destê me dirêjtire
Li bendemanên bê dûmahî tivenga me ji pêyên me bi hêztire
O "Enkîdo" di parzînkên bûyijnan da
Ji reng û dengên daristanê direvît
...
Li bin pesarê bêdeng û bitiris, bêhna baranê dihêtin
"Enkîdo" tibla xwe dimêjît
Bakekê nerm, pîrek hevî digirnijînît
...

[372] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2, r.22.

Car lûleper rometa wî maçî diken, car gulsosin jê dihêne der
"Gilgamiş" kevoke û "Enkîdo" pîrhevok
Bi lingên xwe yên kelişî, şîlmaqên mirinê li kevran diden
Xewnên min, li berberojkên êvaran germin
Di nav kîskên tûtinê da di gemarîne û
"Ximbaba" sêwî yekî bê xwedane
...
Li ser kevirên zêrîn hetavê
Hogirên te du pêjokên ji bîrve çûyî ne
"Exnox" ji "Orê" der dikevît ji ber avê.
..." [373]

Di vê hozanê da hozanvanî çend peyvek yan navên efsaneyî bikar inane, ew jî "Enkîdo, Gilgamêş, Ximbaba, Exnox" in. Hozanvanî di hozana xwe da babetên jiyan û xebat û nemirî û çakî ... hwd. Dayîne diyarkirin, ew jî bi rêka bikarînana qehremanên efsaneya Gilgamêş ya Sumeriyan in. Gilgamiş qehremanê vê efsaneyê bû ku piştî mirina hevalê wî Enkîdoyî li dûv ava jiyanê yan ya nemiriyê gerîya. Enkîdo jî ku nîv hove nîv mirov, piştî şerekî mezin di navbera wî û Gilgamşîda kehî bû û bû hevalê Gilgamêşî, lewra Gilgamiş qesta Exnoxî diket ku babê Etrahasîsê ye, jibo harîkarîkirina wî bo vedîtina ava jiyanê.

Herwesa bikarînana peyva efsaneyî "Pîrhevok" ku diyardeyeka dî ya efsaneyî ye di kelepûrê kurdî da.Ev pîre ya sêrkerew e û xelkê sakar dixapînît, anku wesa xweya diket ku kesekê hez ji başiyê diket hewil didet karên baş digel xelkêbiket, lê dirastî da ne wesa ye, belkî pêçewaney vê rastiyê ye û herdem li dor kirina kiriyarên xirab digerît, hewil didet heval û dostan ji hev veket, şer û duberekiyê di navbera wan da dirust biket.

Di hozanê da merem ji bikarînana efsaneyê ew bûye ku hozanvan mesela felsefî ya mirinê diyarbiket û wê hevrikîya mirov digel mirinê diket bîne ser zimanî. Hozanvanî ji bo vê meremê efsaneya Gilgamêş kiriye di nav babetê hozana xweda ku di ser hewlên Gilgamêşîda bo xwe rizgarkirin ji mirinê, li dûmahiyê bo wî diyardibît ku mirin dê hebît belê navê mirovî her dimînîte sax û bi encamdana karên baş û çakiyê mirov nemir dimînît.

Hozanvan di hozana bi nave "Bi Kevirên Aramê li Sîtafka Min Dixin" da ku li sala 1995an hatiye nivîsîn wesa dibêjît:

---

[373] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2, r.34 - 36.

" ...
Ez û tu li ber kujî yê sermayê, li gorepana tarîyê, bi çavên westîyay, peykerê mirinê avadikeyn
Dê çavên xwe ne westîne, çîrokek dê dest pê diketin/ ew xewna min spêdê dîtî/ li nav çengên "Sîmerxê" 'evrek siware li baranê"[374]

Di vê hozanê da hozanvanî peyva “Sîmerx” ku firîşteyeka efsaneyê ye diefsaneyên kurdî da bi kar anîye ya ku harîkariya “Mîrzayî” diket di karên baş da.Bikarînana vê peyvê bi mebesta diyarkirina rolê serkirdayetiya kurdan li Herêma Kurdistanê di destveînana mafên miletê kurdida wesifkiriye ku piştî raperîna sala 1991ê xelkê Kurdistanê ji bindestiya dijminî azad bû û ev çende bû derfetek ku hemî mafên xwe bidestve bînin. Belê jibo vê çendê pêdivî bi serkirdeyekê zîrek û wêrek heye ku hozanvan wesfa wî bi “Sîmerxê”diket.

Hozanvan di hozaneka dîda ku bi navê “Esman Rêya Kadiza ye” li sala 1996 hatiye nivîsîn wesa dibêje:

" Pîremêre û li kujiyê kolanê dirûnît
Daloztirîn çavgêrkê ra, minare dibîte gêjevank
Lêvên mijdarên mirovan bê dergevank
Ev kolane benderê mergê şevê ye
Berzebûnê dikete romanek zansitî û
Diefsaneya "Enahîta" û
Sêzde segên "Exnatonî" dihilkêşît
Şev zengile û befr nahêt
Pişîkek, li ser tenekek glêşî
Dibîte pêşuy/ mezin dibît wek gamêşî
Pirtên rewanên hilweriyayî dalîsît
Ev teneke maknatîze û
Ji çavên te, deng û behsên birsê dikêşît ... "[375]

"Enahîta" ku xwedawenda dayik û dilovanî û ciwanyê ye, hozanvanî bikarînaye di hozana xwe da ku di berawirdikirina wî demê dilovanî û viyan dibelav û serdemê aram û xweşiyêdigel barûdoxên ku jiyana civakî ya hevçerxa hozanvanî da kiriye. Anku di vî demi da pêdivî bi

[374] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2, r.67 - 68.
[375] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min, b.2, rr.100 - 101.

"Enahîta"yê heye jibo rastvekirina barê jiyanê, herwesa ev hozane behsê vî serdemî diket ku mirovayetî tûşî guherînên mezin bûyîne, belê digel hindê da ruha xwe ya mirovayetî û saloxetên xwe ji dest dayîne heta wî radeyî ku kartêkirin li sirûştê cîhanê bû ye.

Di hozana “Pirtên Janeserê”ku li sala 1997an hatîye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

" ...
Xeber da min berî tu bêy
Min hejtekir pêş min tu bivêy
Bombên Valyom dişanênxwînê da dipeqin
Bîrhatinên biçûk ... Biçûk dibin "Elyom"
Di nav tevnê koloxey da peşkê, "Etom"
Gotin ji dûhî nivistî bûy
Valyom di perdên serê teda mest di leyîzî û
Bi mestî di perêsgehên zeredeştîyan ve
Di nav belgên "Hewmê" zer da belave dibûn
Xewneka te cilkên "Vehomenî" li ber bûn
Te "mezda" bo "Ehrîmenî" kiribû benî
Tu nehatî, gotin "nîştîman" ya nexweşe
Di jorek heriftî da, li şoqên taxê girêbehsê
Bihayê dibît, ji hayçûnê di bît spîndar
Ger ji xew rabû/ jane sera wê tenabû
Dê peykerê "Enahîta" di şeva şarî da bît ala
Tu dê biye "Keliya şeda" ez jî ew kelya beramber
Tu Zînî û bejnate bûye
Li ser banê "Şikefta Çar Sitûn"
Ez dê lêvên te ramûsim, tu helbesta min maçî ke ... " [376]

Di vê hozanê da babetê xerîbiyê hatiye azrandin û bikarînana navê "Enahîta" ku hozanvanî di gelek hozanên xweda bikarînaye.Ev çendejî layenê hest û sozên hozanvanî û karîgerbûna wî bi kesayetîya Enahîta ya dilovan heye.Belê di vê hozanê da bo merema xerîbîyê û hewla gehiştin bi yekku girêday babetê evîndariyê ye jî heye.Herwesa hozanvanî peyva

[376] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b.2, rr.124 - 125.

"Ehrîmen" bikarînaye di hozanê da ku xwedawendê xirabîyê ye diefsaneyên kurdîda ku wesfa dûrkeftinê diket weku xirabî û zulm wekî karên Ehrîmenî ye, lewra dibinîn ku hozanvanî pitiriya caran bo diyarkirina felsefa xwe pena biriye ber efsaneyê û babetê xwe bi babetê efsaneyêve grêdaye.

Di hozana “Pirtên Jinkekê” da ku li sala 1989an hatîye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Revî destpêkir, min zanî!!
Şevê destpêkir, min zanî!!
Hêşta ez yê bi lêkdana pirtên te ve û ...
Welê tu ya bûye "Dolfîn"
Hosa ez yê bûyîme "Neptûn"
Min simt Bîstûn veşart gerdûn
Lê ez gelek bi te ve westiyam
Li bin dara he, tu bûyî Mamiz
Li ber kevirê he, tu buyî perî
Li ber derê şkeftina henê te rengê pîrheviya dida
Xir rengên te li min berze bûn
Sosin ji peyvên min zer bûn
Bihar ji çavên min der bûn"[377]

Di vê hozanê da hozanvanî çend peyvên efsaneyî bi kar înane ew jî “Dolfîn, Neptûn, Bîstûn, perî, pîrhevî” ne. Di vê hozanê da ku bi nave “Pirtên Jinkekê” ye babetê wan karesatên ku miletê kurd tûşî bûyê, bi taybetî jina kurd di mawê enfalan da û koçberî û derbederîya xelkê kurd û îş û azarên jina kurd e. Birîn ji egerê van nexweşiyan weku diyar, hozanvanî jina kurd bi "Dolfîn" wesif kiriye ku xwedawenda daristanê ye di efsanên grekî da. Herwesa qehreman anku ew kesê ku dê miletî ji nexweşiyan derbas ket û berev azadiyê bet bi "Neptûn" wesif kiriye ku xwedawendê deryayî ye di efsanên grekî da. Di efsanê da Dolfîn li deryayî li Neptûnî digerît û Nebtûn diçîte daristanê li Dolfînê digerît û li yek û du berze dibin û nagehine yek. Hozanvanî bi şêweyekî îstatîkî ev babete wênekiriye ka çewa miletê kurd bi nexweşî û derbederî li azadîya xwe digerît û nagehîtê. Herwesa Bîstûn ku ew çiyayê ku Ferhadî hewla simtina wî dikir daku bigehîte Şirînê, di wesifkirina hozanvanî da hatiye ku ev çiyaye simtiye lê azadî zor ya bi zehmet e.

377 Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b.1, rr.381-382.

Herwesa hozanvanî peyva perî bi karî înaye ku di efsanên kurdî da hebûye, ew jî ku derbirînê ji ciwaniyê diket, herwesa peyva pîrhevî ku di efsanên kurdî da jinên bitris bûn.

Herwesa di hozana “Nêrîneka Zerdeştî” da ku li sala 1989an hatîye nivîsîn hatiye:

"Nawiskeka di kevirî kolayî, der nijinî
Ber kit kite yê herifin
Çirayekî di nawsikê ve
Ji hêrsên tarî yê da xwe vedijenî
Bi sotina xwe ban reş dihonî
Pîremêrek riye wek befrê
Bi pirtûkeka zerpertî ve yî mûjîl bû
Min hizirkir "Boda" bi xwe ye
Yan Zerdeşt e, lê nêrandin qedexe ye
Pîremêrî, ku seh dikire banê şkeftê, dikre girî
Ku pêda dihat heta çirayî
Min dizanî di bin lêva ve dikire kenî"[378]

Di vê hozanê da peyva “Boda, Zerdeşt, pîremêrê riye spî” hatîne bikarînan ku pîremêrê riye spî xwedawendê baranê û teyra ye di efsanên kurdî da, herwesa xwedawendê derya û xudawendê mara ye. Di vê hozanê da hozanvanî pîremêrê rîye spî bi serkirdekê kurd wesif kiriye ku wek "Boda" ku xwedawendê Budîsta ye, yan wek Zerdeştî ku peyamberê kurda ne wesif kiriye. Ew kesekê aqilmend e û di wesifkirina wî bo şkeftê da ku banê wê hemî reş bûye bi dûkêla çiray li demê seh dikete banê şkeftê bixem dikevît. Ew jî ew qurbanîdana zor e ya ku hatiye dan ji bo azadîya gelê kurd û li demê temaşeyî çiray diket ku kêfxweş dibît ku çira berdewam yê hil e anku xebat û têkoşan ya berdewam e.

Di hozana “Maryana” da ku li sala 1987an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Ho Maryana, dûhî gotin hêvî gerim bû
Dûhî gotin evîn şerm bû
Dûhî gotin Valdîviya erdê xwar û
Mîrza li meydana dêwî
Keft û term bû"[379]

[378] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b.1, r.386.
[379] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min, b.1, r.300.

Di vê hozanê da hozanvanî peyva "Mîrza" ku qehremanê efsaneyî ye bi kar înaye û wesa wesif kiriye ku di beramber "Dêwî" kevtiye, anku li vêrê diyar diket ku başî beramber xirabiyê şkestin xwariye. Di vê hozanê da hozanvanî babetê sêdaredana jineka qehreman kiriye babetê hozana xwe ku di şoreşa îspanî da xebat û têkoşîn dikir  ji bo azadiyê. Vê jinê li herêma Katalonyayê xebat ji bo serxwebûnê dikir beramber rejîma îspanî û li dawiyê bi destê rejêma îspanî ya diktator hatiye sêdare dan. Li vêrê hozanvan şkestina azadîxwaziyê diyar diket beramber dagîrkirnê û zordaryê. Herwesa hozanvanî viyaye babetê herêma Katalonyayê ku weku miletê kurd yê bindest û li jêr zulm û zordaryê bînîte pêş û bidete diyarkrin ku gelek milet hene di vê cîhanê da, li jêrdest in û xebatê diken ji bo azadiyê.

Di  hozana “Peyama Aştiyê” da ku li sala 1993an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Ez sîmerx im, di gel geşbûna elindê
Nameya eşqê bi min ra ye, nûnera peyva Mezda ye
Ez melodira ûşyan im, digel geşbûna elindê
Parzînekê derda bi min ra ye
Guliyên genimî bo zarokan dicivînim
Peristgeha min welat e
Pêkevên min hemû aştîxwazên dinê
Xelatên min, tirarê ava tezî ne ji kaniyên jorî
Li serê sêriyana "aloka"
Li ser evîndarên perêsgeha xwe ya welat digêrînim"[380]

Di vê hozanê da ku bi navê “Peyama Aştiyê” ye, hozanvanî peyva "Sîmerx" û "Mezda" bi kar înane ku sîmerx ew balindê efsaneyî ye yê ku şiyay Mîrzayî bigehînîte def xwedawendê tariyê, û Mezda anku Ahoramezda xwedawendê tak û tenya û xwedawendê başiyê ye di ayinê Zerdeştiyan da, babetê vê hozanê herweku ji navê wê diyar e, peyama aştiyê ye, hozanvan bi rêka vê hozanê barûdoxê miletê kurd di vî serdemî da ku hozan têda hatiye nivîsîn, didete diyarkrin ku maweyekî piştî raperîna sala 1991ê bû û xelkê Herêma Kurdistanê tûşî qeyran û feqîryeka zor bibû û jiyareka bi zehmet diborand ji ber ku Kurdistan hatibû dorpêçkirin û hêjayî gotinê ye ku diyar bikeyn ku li wî demî xelkî nexweşiyên mezin dibirin ku bi serdemê komkirna guliyên genimî dihête nasîn.

---

[380] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min, b.1,  r.20.

Di hozana “Çaxê helbest dibine perî bêhna welatî jê dihêt” da ku li sala 1994an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Bê dilovanî ez bi evîna te sond dixwim / hest bi tiştek bi tirs dikem/
Min tu divêy her çewabît/ bazarê kiçk û helbesta yê dewlemend e
Tu ya perî ... Her tenê xewê ji çavên min direvînî?
Yan jî tiştek li te berze bûye, dikevî pey min/ di rêlistanên helbestên
Min yên tarî da, sêva nemirinê dixwazî/ helbesta min dihêlî tazî
Rewana min dixwey, vedixwey/ bi hemû sofiyên Ekbatan ra nêzîk Xudê
Şi'rê dibî/ li dûratî ya şev û roja li min dikey gazî"[381]

Di vê hozanê da hozanvanî pesna helbestên xwe kirîne, wesa diyar kiriye ku hozanên wî yên ji hemûyan bihêztir in. Ew hozan in yên ku bi welatê xwe nivîsîn, lewra ji navê hozanê diyar e Ç”axê helbest dibine perî bêhna welatî jê dihêt” anku ew hozanên wî yên ku dibine "perî" anku li astekê bilind yê ciwaniyê ku perî di efsanên kurdî da bi ciwaniya xwe ya ber niyas e, wesa diyar diket ku hozanên wî yên ji hemîyan ciwantir bêhna welatî jê dihêt anku hozanvan li vêrê diyar diket ku hozana wî xizmeta gel û welatî kiriye, herwesa li demê dibêjît "di rêlistanên helbestên min yên tarî da, sêva nemirinê dixwazî" wê wateyê digehînît ku sêva nemiriyê anku ew dara sêvê yaku li beheştê heyî û Adem û Hewayê jê xwarî lê heye, herwesa hozanên xwe weku bajêrê "Ekbatan" nîşan didet ku paytextê Mîdyan bû û bingehekê mezin yê sufîgeriyê û peristinê bû.

Di hozana “Tirs ji Dîwaran û ... Xweveşartin ji Hetavê” da ku li sala 1997an li Elmanya hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

" ...
Enahîta ji esmana dihête xwarê
Gulbarîn ji xewê radibît da bikenît digel beharê
Tomatîn heft davên derzî û heft derziyan
Bo wan dihavêjîte pişt kwarê/ dê boxçe hête vekirin û heta spêdê
Direfşa Kawey dinexşînin
...
Ferx û Stîyabo we kesk kirine diyarî

[381] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min, b.1, r.40.

Mizgînîya beharê bû
Siyabend û Xecê hatin sor dane we
Mizgînya xwîna ejdehayî û şkestina zordarî bû
Mem û Zîna destmaleka spî havêtin ser çûkên te
Çevengê aştîya vî warî bû
Paşî Xanî bi xwe hat û rojeka zer dadestê te
Ger ev rengne bigehin yek sal bibere
Eve alayê we kurdan û bo elinda we xawere
Slavên me li kawey biken, eger zordarê xwe dişkênin
Yekî dî li şûnê neçînin... "[382]

Di vê hozanê da efsane bi şêweyekê befireh hatiye bi kar înan ku peyvên "Enahîta, Gulbarîn, Tomatîn, Ferx û Sîna" bi kar inane.Hozanvanî di babetê hozanê da babetê dilovanî û eşq û evîniyê daye diyarkirin ku bikarînana navê "Gulbarîn, û Tomatîn" ku duxwîşkên yekin û qehremanên efsaneyên kurdî ne digel înana navê "Ferx û Stîya" ku du evîndarin diefsaneyên kurdîda.Di hozanê da peyama hozanvanî bo civaka kurdî ew e ku li dûv dab û nerîtên kevin yên paşkeftî neçin, bi taybetî ewên derbarey evîniyê ku zor dastan û efsane û çîrokên kurdî hene li ser zulm û zordarîya dab û nerîtan,ya dikevîte li ber sîngê evîndaran, pitiriya caran di vê hevrikiyê da kiç pitirî kurî bûye qurbana dab û nerîtan, lewra hozanvanî navên qehremanên kiç yên efsaneyî bikar înane.

Di hozana "Silbûna Şehrezadê" da ku li sala 1997anhatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

" Dihêt bîra te
Heko memkê te bûye çuying
Te nan ji hejaran veşartî û
Bûye meymûnk
Te şîrê "putana" vexwar
Tu mirî û rabûye ve mar
Lê kehî bûy
Di şevên sarêt deryayê da
Tu bûye mij
Li daristanê tu hatî xwar

[382] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2, r.147 - 148.

Da bi ciwaniya nêrgizekê serî heldey"[383]

Di vê hozanê da hozanvanî peyva “putana” ku xwedawenda dilovaniyê ye di efsanên hindî da bi kar îneya.Hozanvanî ev efsane bi karînaye daku merem û babetê hozana wî pê rohn bibît, ewjî babetê rexna siyasî ye ku rexnê arasteyî zulm û stemkariyê diket ku li wî serdemî xelkê Herêma Kurdistanê li jêr dorpêçeka aborî dabûn û di rojanên sextda diborîn, lewra li vêrê hozanvan peyama xwe arasteyî wî layenî diket yê ku qutê hejaran dixwet.Bi wesifkirna wî dihozanê da “te şîrê ‘putana’ vexwar” ku putana ew xwedawenda dilovaniyê yaku şîrê xwe daye Şîvay daku ji pêvedana marî rizgarbibît. Herwesa di wesifkirina wîda ku bûye "mar", li vêrê behs li desthilata Herêma Kurdistanê diket ku piştî serhildanê û rûdanên 1991ê, qutê xelkî dixwar û li şûna bibîte desthilateka dilovan bo xelkî, hozanvan ew bi "mar" wesifkiriye.

Di hozana “Rêpîvanek di Hezên Me da” da ku li sala 1999an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Tovana viyana min nebû, ko min hej te kir
Darên baweriyê bûne gemî, daku nemirim
Efsaneke,eger tu bi xwe bawerbikey
Bi tinê viyana Odessayî û mezinatîya okyanosî
Dişên afirandinek wesa çêken
Sûcê te ne bû, ko te ez hêlam
Bila dûratîya me yek bihost jî bît"[384]

Di vê hozanê da ku binavê “Rêpîvanek di Hezên Meda” hozanvanî viyaye babetê derûnî û hezên xwe bikete hêvênê vê hozanê ku derbirînê ji kesayetî û derûnê wî diket, sebaret bikarînana efsanê di vê hozanê da peyva “Odessa” hatiye bikarînin ku yek ji qehremanên efsaneyî yên grekîyan e, evca hozanvanî viyana xwe wesf biket bi viyana Odessayî ya efsaneyî.

Di hozana “Aşopên Mest” da ku li sala 2000î hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Di kevalî da ez kirime şop
Hebûna min careka dî kire aşop
Heta li çaxê ez yê tenha
Her tu digel min keske bîrhatin bûy

[383] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,, bi 2, 135.
[384] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,, bi 2, 232.

Heko Odessa berze bûy
Xewnên mişext hevalên min bûn”[385]

Di evê hozanê da hozanvanî peyva “Odessa” bi karînaye ku qehremanê efsana Odessa ya grekî ye. Hêjayî gotinê ye ku li demê ev hozane hatiye nivîsîn hozanvan li derveyî welatî bû, lewma ev hozane derbirînê ji xerîbiyê diket ku hebûna xwe li dûrî welat û heval û dost û biraderan weku aşop nîşandidet. Ewwesa diyardiket ku beramber xweştiviya xwe, ku ew Odessa ye li demê berzebûyî, anku dûrî xweştiviya xweye.Li vêrê herweku her nivîser yan hozanvanekî ku li dûrî welatê xwe bijît bo maweyekî çi dirêj yan kurt bît, hest bi xerîbiyê diket bo cihê jiyan û mezinbûna wî û hewildidet her tiştê wî û welatî girêbidet bi rêkek bo jibîrvebirin yan hedara xwe pê bînît û ev heste li def hemî hozanvanan hatiye veguhastin bo şêwê hozanê ku hozanvanî hewildaye hestên xwe derbibirît.

Di hozana “Lêgeriyana.... !! “ da ku li sala 2001anhatiye nivîsîn, wesahatiye gotin:

"Min efsaneyek ji lezê afirand
Di kûratîya okyanusê bê panî da
"Cindevan" bo gehandina pirtên dengvedanê
Wibiçûkkirina vê cîhanê avakir
Ey rencîbûna ‘Boda’î!!
Ey gencîbûna ‘Şîva’î!!
Ey qencîbûna ‘Îsa’î
Ey şiyan û bawerîbûna "Mistefa"î
Ez gaziya mirovanim li kernevala avakirina Cindevanê
Ey cindevana noqbûy!!
Te em pitir ji carekê bijikandîn
Hêşta pirtên dengê min li çerxên borî
Li kohên bilind, şoreşê diken"[386]

Di vê hozanê da peyvên “Cindevan, Boda, Şîva” hatine bikaranîn ku Cindevan navê wî kêşwerî ye ku di efsanên kevinda behs lê dihête kirin ku hemî kêşwer pêkve digirêdan belê di derya hêmin da yê niqo bûyî; û Boda jî xwedawendê hindîyane ku heta niha peristina wî dihête kirin; Şîva ew qehremane efsanên hindî yê ku şîrê “putana”ya xwedawendadilovaniyê vexwarî.Di

[385] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,, bi 2, 246.
[386] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,, bi 2, 291 - 292.

vê hozanê da hozanvan behs li parçekirna Kurdistanê diket ku dibêjît me pêdivî bi avakirina "Cindevanî" heye bo pêkvekirina parçên Kurdistanê, lewra daxwaz ji miletê kurd diket bi “rencîbûna Bodayî” û gencîbûna "Şîvayî”, û qencîbûna “Îsayî”, şiyan û bawerîbûna "Mistefayî” karbiken ji bo avakirina Cindevanî bo yekgirtina welatê xwe Kurdistanê.

Di hozana “Geryan” da ku li sala 2004an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Bi xamekê kesk... Li ser perek, ji nîvê pitir spî dinivîsim
Wê kesera hercar ji dilê xwe derdikim
Li ser perek hêşta maye keşk
Li kêlekên te, şûn tiblên xwe dinexşînim
Ji efsaneya hindabûnê û avisbûna (Fêronya)
Cîhan xwe, ji fantezî û entîkeya hemer dikim"[387]

Di vê hozanê da peyva “Fêronya” ya efsaneyî hatiye bikarînan ku ewjî yek ji xwedawendên jêrzemîn e û ji na xwedawendê rojê “Soranos”î ye, herwesa parêzvana berêkvanên hilkişyana çiya û zinara ye.Ji ber hezkirna wê ya dijwar bo hêz û şiyana gurgî, zarokên wê hemî bûne nijdevan û rêgir, hozanvanî "Fêronya" bikarînaye ji berku jiyana wê pirfantezî û entîkeyan bû. Lewra hozanvanê ku hilgirê keseraye dibêjît bi rêka avakirina cîhanek xeyalîdihizrên xweda ku sîmayên jiyana "Fêronya”yê, lê ne li şûna wî ketwarê pir nexweşî diafrînît ji bo revîn û xwe jiobîrvekirin ji nexweşiyan.

Di hozana “Çame Sîbera Wê” da ku li sala 2004an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Min sêv xwar, ez derkirim

Li çaxê ez gîwomert, tu bûyî

Jinek mişe şozanî û pîrozwer, te di ser da birim

Ku tu minîrva, bûm Promîtosê şevgora

Min peykerek ciwan avakir, nav Pandora

Ji ber afirîn û çêkirinê seza kirim

Her gava ko tu peykerbûyî

Bûme dizîker, ji agirê Zeosî

[387] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,, bi 2,  369.

Esman şkand min, agir vepoşî

Ku ez Enkîdo, ji mirovan kûvî

Tu her jinek bûy, ciwan û bedew bûy"[388]

Di vê hozanê da li demê dibêjît "min sêv xwar" ku behsê wê çendê diket demê Adem û Hewayê sêv li beheştê xwarî ji wê dara ku Xweday lê qedexekirî.Herwesa "minîrva" ku xwedawenda dilovan ya grekî ye yak u Promîtus bi nihênî biriye asmanî, di nav cîhana Zeosî da, û herwesa ba li wê çendê diket ku li demê Promîtus rabûy bi dizîna agirê Zeosî, herwesa "Enkîdo" bi karînaye bo diyarkirna heza dûrbûn ji mirovan.Di vê hozanê da hozanvanî efsane bi kar înaye bo derbirînê ji rada hezjêkirinê di navbera wî û xweştiviya wîdaku li demê xweştiviya xwe bi "minîrva" wesf diket xwe bi "Promîtus" li beramber didanît, herwesa li demê xweştiviya xwe bi ew peykerê Promîtus hewildidet dirust biket û bi merema ciwan dirustkirina wî diçît agirê Zeosî didizît.

Herwesa di hozana “Ku Mijilank Dihên Barkirin” da ku li sala 1998an hatiye nivîsîn,wesa hatiye gotin:

" ...

Narîna min, ew çûçka ji ser hêlîna xwe nefirî

Çuca bi tenha nahêt lîsî

Bendimana min, peyvin bo avakirina wêneyan

Semfonîya babê çiyayên bilinde

Di spêdeyên yeharî da bi xwe "mêtose"

Lê dîsanjî neşêm çaxêxwe pirr bikem

Li dûr vê bîroka entîke, xwe peyvên min yên alizîn

Ev bîjiya hizra min bû, jidayik nebûy

Her ma li ser pişta merîxê û bo "Argose"

Ruja min hêşta ya li vêre û

Dergehê min mizgefte û pencerka min dêre

Dîwarê min hizirkirina "Hilac"ye

Qeşek yê têve xaçkirî

Sofyek yê têda di xelwe çûy

Kevlê "manê" yê maye li ser devê kêra

'Emê Gozê herdu pên xwe yên bendikirîn

[388] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,, bi 2, 376 - 377.

Kesek neçît ser çeperî
Brîna wî  xwîn vavêre"[389]

Di vê hozanê da hozanvanî peyvên “Mîtose, Argose” bi kar inane.Mîtos anku efsane, Argosê giyandarekî efsaneyî yê Grêkî ye ku dibêjin sed çav hebûn, Hîra hevjîna Zeosî kiribû pasewan daku çavdêriya Aywabiket, hejêkiriyaZeosî belê Argose dihête kuştin û Hîra çavên wî diparêzît.

Helbet babetê hozanê bi rexna aynî ve girêdayî ye ku babetên aynî û ew hizir û îdeolojiyên olî ku kartêkirinê û desthilatê li ser hizra takekesî diken. Hozanvanî ewbi şêweyekê nerînî dayîne diyarkirin divî serdemê ku guherînên mezin bixweve dîtîn û serdemê cîhanî bûnê û nemana desthilata olî û îdeolojî û beref zanistîbûnê çûn û derkeftina hizrên Almanî û Lîbralî li seranserî cîhanê belav bûyîn. Lê belê dicivakên rojhilatî,heta niha hizrên paşvemayên kevin mayîne û desthilateka zor heye li ser jiyan û hizra civakan, lewra dane diyarkirina xirabî û katêkirinên nerênî li ser pêşkeftin û werara miletan her ev hizir û îdeolojî ne ku heta niha nehatîne retkirin ji layê civakê ve, yan hizir û şirovekirinên nû û serdemane bo nehatîne encamdan.

Di hozana “Çûn” da ku li sala 2001an hatiye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

" ...
Ji xwirhana berzebûnê dibîte kêvroşkeka kûvî
Û li nav didanên deriya "Êce" dibîte paporek penaber
Ey mirina yar! Ey ava şor! Ey jengîbûna zîvî
Ez bi çawa, "Odessa"yî ji berzebûnê bînime der"[390]

Di vê    parçehozanê da Hirzanvanî peyva “Odessa” ya efsaneyî bikarînaye ku qehremanê efsaneya Trûwa ye ku dirustkirina hespê darî ji hizra wî bû û bi vê pîlanê şiyan Trûwayê dagîrken.Di hozanê da hozanvan vî qehremanî bi kesekê berzebûy nîşandidet, ku amajê bi kesên kurd diket ewên derber bûyîn û awareyîwelatên biyanî bûyîn, ku nexweşî û xerîbiya wan didete diyarkirin û rexnê li wan barûdoxan diket ewên xelkê beref dûrkeftinê diben.

Herwesa di hozana “Hingaftina Mezîka Hilniftinê”da wesa hatiye gotin:

---

389 Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.202 – 203.
390 Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.276.

" ...
Hejêkirina min, bo dilê te kevokeka pîrosî ye
Xwezî ez bi xewnên xweve, hatibam hilawîstin û ...
Gorra min jî di hizrên min da, gehiştina ne mirinê ye
Mirina "Enkîdo"î û tirsa "Gilgamiş"î li bîra minin
Lê maçek eksîre û kopê min pir diket"[391]

Di vê hozanê da herdu peyvên efsaneyî "Enkîdo" û "Gilgamiş" hatîne vegotin, ewjî di wesifkirina hestên xwe derbareyî evîndara xwe ku di hozanê da wesa hatiye gotin. Herwesa bikarînana vê efsaneyê jibo diyarina mesela mirinê û jiyanê bûye ku hozanvan dûratiya di navbera xwe û evîndara xwe da di hozanê da bi mirina Enkîdoyî wesf diket ku Gilgamiş gelek bi wê rûdanê karîger bibû.Herwesa kurtiya jiyê mirovî anku jiyanê bi tirsa Gilgamêşî wesf diket ku Gilgamêşî ji tirsa mirinê jiyê xwe hemiyê liavajiyanê – nemiriyê digeriya daku sax bimînît û nemirît. Li vêrê hozanvanî amaje biwî mawê kurt yê ku di gel evîndara xwe kirîye.

Herwesa di hozana “Coltirîdal ‘Vegeriyan jiBiryara Xwe Kuştinê" dawesa  hatiye gotin:

"Eger Ademî sêv nexwariba, çi dibû?
Sêv, genim, berê darekê her xwarine û gune.
Eger şeytanî xwe neçemandiba, çi dibû?
Giyomert, Banko ne heriftiba, çidibû?
Eger dor jî pijikî ba,  tubêjî ...
Hebûna beheştê çu raman nediman û hevrikî da digel kê hête kirin?"[392]

Di vê hozanê da hozanvanî çend diyarde dayîne diyar kirin ku di efsaneyî ne weku diyarda xwarina Ademî ya sêvê ku bûye egerê derkirina wî ji beheştê, herwesa xwe neçemandina şeytanî bo Ademî demê  Xwedayî ferman li hemî firîşteyan kirî ku xwe biçemînin bo Ademî, lê şeytanî xwe neçemand û ev çende bûye egerê derkirina wî û barandina nefretan lê.Hozanvan di vê hozanê da mesela bîr û bawerên ayînê Îslamê diyar diket derbarey peydabûna mirovî ku li destpêkê li beheştê bûye û xwedan bihayekîzor bûye, lê li demê xeletî kirî û Ademî sêv xwarî,Xwedayî ew hinarte erdî û ji beheştê derêxist.Evbîr û bawerên ayînê Îslamê ne ku hozanvan bi çend pirsyarekan vî babetî di azirînît û guman li ser heye lewra di hozanê da

[391] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.313.
[392] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.352.

pirsyarên wî diyardibin. Herwesa di pirsyareka dî da ku gumanê lihebûna Xwedayî diket, li demê dibêjît "eger dor ne pijikî ba" hebûna vî bîr û bawerî di ayînê Êzdiyanda heye ku li demê peydabûna erd û asmanan da dibêjin direk hebû Xwedayî pêhnek lêda û peqî û erd û asman jê çêbûn. Lewra hozanvanî ev hizra efsaneyî ya olê Êzdîyan bikarînaye li beramber bikarînana dîtin û bîr û bawerên ayînê Îslamê ku dibêjît eger ev dore nepeqîba erd û asman nedibûn, wate pêdivî bi hevrikîya başî û xirabyê nedibû. Anku bi kurtî hozanvan gumanê li van bîr û bawerên olî yên efsaneyî diket û hewil didet bi şêwazê pirsyaran vî babetî bi azirînît.

Di hozana “Jiyana Me Çîrokeke û ... Viyana Me Çîrokek Din” da ku lisala 2004an da hatîye nivîsîn, wesa hatiye gotin:

"Çîrokeke
Her careka tev kanyên bîranîna li min der dibin.
Çîrokeke
Her careka hezên noke hildikolim
Pirzink zer dibin, pêkve derdibin.
Çîrokeke
Her careka li dahatî hizirdikim
Pirs û bersiv tevilîhev dibin.
Çîrokeke
Ger heza min ya afirande ket nav çamê
Raman û verêje peyv duser dibin.
Çîrokeke, her jikevin...
Derkirina min ji esmanî, ji komara Eflatunî.
Çîrokeke min ya afrandî û hilkêşyana çûne banî.
Çîrokeke, gele ji mêje
Min biryardayî te avakim...
Kevirek ji kevrên çiyayê me, min tiraşî
Dibît jieşqa xwedavendê, bûm hunermend
Min peykerek ji aşopa xwe çêkir, bi şaşî..."[393]

[393] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2, r.380 - 381.

Di vê parçe hozanê da çend babetekên efsaneyî hatîne bikarînan, hozanvanî rûdana derkirina Ademî û Hewayê ji beheştê bikarînaye ku li demê serdabirina wan ji layê şeytanî û xwarina wan ya sêvê ji wê dara lê hatiye qedexekirin.Herwesa hozanvan beheştê bi Komara Eflatunî wesf diket ya nimûneyî ku Eflatunî bi hizra xwe bajêrê nimûneyî afirandibû û hemî tişt têda di nimûneyî bûn.Dîsan efsaneya "Promîtos" bikar înaye ku efsaneka herîgirîng û bi nav û denga Yonanîye lidor bîr û bawerên  xwedawendan li dev Yonanî, ku di rudanên vê efsaneyêda "Promîtos" ku peykerekî bo "Pandorayê" dirust diket belê pêdivî bi agirî heye daku peyker ciwan bihêt, û bi tenê "Zeos"  xwedawendê mezinagir heye, "Promîtos" digel xwedawendeka dî derbasî esmanî dibît û agirî ji "Zeos"î didizît, lewra Zeos gelek ture dibît û sizayê didete "Promîtos"î û wî bi zincîran girêdidet û rojane teyrek dihêtê cegera wî dixwet û bi şevê cegera wî çêdibîteve û wesa dubare dibîte ve, heta Hîraklîs dihêt û wî xilas diket.

Her diheman hozanda wesa hatiye berdewamkirin:

" ...
Tu Minîrvayî.
Nimûnetir di ciwanîyê da wek min di vêt
Tu Ahorayî,
Dilovantir di banînê da, wek min di vêt
Ehrîmenî,
Melevantir di zanînê da, wek min di vêt
Enahîtavyî,
Di afirandina jiyanê da, çak dizanim tu Exterî
Tu Esînayî,
Di azirandina viyanê da, hizirdikim tu Exterî
Ji boy guneha xwe binasim
Li beramber te xwe bend dikim
Çîroka xwe, jihilweşiyanên  xwedavendan
Mişt pend dikim
Li ser bilîndîya çiyayê Qaf, zincîrên xwe dipiçînim
Ew Elhuyê ku soz bi xwe bû, direvînim.
Bala min diçît yekbûneke ji agir û ava
Germa sardikim, sara germ dikim, bayê têhildikim

Teya sar û
Di nav mija Jopîterî ra, hest jêvebûy
Di vê têkiliya afirandinên wêriyanê da veder dikim
Ez Mîrzo me, Mîrpromim
Wî nehengêava Dicle û Firat digirt
Werpêç dikim, nav geriyên tolvekirinê
Dinişkê da qurtal dikim
Ew şoxa di vên bikin qurban."[394]

Di vê parça hozanê da hozanvanî çendîn efsane bikar inane; "Minîrva" ku dilovantirîn xwedawenda Grêkî ye, xwedan biha û qedir bû lidef xwedawendên mezin, dergehên erd û asmanî hemî bo di vekirî bûn ku bi azadane hatin û çûn dikir, lê piştî harîkarîkirina wê bo "Promîtos"î dergeh lê hatine girtin, herwesa "Ahura" anku Ahuramezda  xwedayê mezin û bilind e diolê Zerdeştiyanda, ku afirînerê hemî tiştî ye, û yê take û bê hevrike, hebûna wî ya ezelî ye, herwesa hozanvanî navê "Ehrîmen"î bikarînaye ku  xwedawendê xirabiyê ye di Avêstayê da navê wî “Engremaynevî” ye.

Herwesa di hozanê da navê "Enahîta" hatiye ku  xwedawenda avê û jiyanê ye û herwesa hêmayê dayikê û dilovanyê ye. Etîna ku xwedawendeka bihêz ya Grêkî ye ku gelek heza tolvekirinê heye, herwesa behs li wî Elhuy kiriye ewê rojane cegera "Promîtos"î dixwet di îşaretkirina Elhuy bu zordarîya "Zeosî", herwesa nehengî ku ava kaniya digrît û bi xwarina mirovekî hindek avê ber didet, ku diefsaneyên kurdîda hebû ku kiçik dikirine qurban bo wî nehengî daku avê berdet.Belê Mîrzo ku qehremanekê efsaneyî yê kurdî ye wî nehengî dikujît û qurbana kiç xilas diket.

Herwesa her di heman hozanda wesa hatîye berdewamkirin:

"Ev dînatî, ku namirit...
Dînatî ya rûmetê ye, mişe rinde
Hêza xwe ya jiyanê
Hêza xwe ya viyanê û hêza xwe ya qirinde
Ji kûratîya efsaneya Manê werdigirt.
Min li leser kohên bawerî yê
Ji van dabûtebibînim

[394] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.382 - 383.

Di xalbendên xweşîyê da
Di arama İremê da
Aşopa min firî, çû ... çû...
Diban gemiya Exwexî ra, digel xwe birim
Di bilind birca bî xwedî ra
Kirime sîmerxê peyamê
Li kohistanên Loristanê,
Kirim kevirek ji peykerên Mezdayî
Kirime ronahî ya rojê û lite geriyam
Di nav sirodên yariyan da
Kirime şalyar, pîrê pîran... Bo te weriyam
Di nav rijdî û rîsetên yariyan da
Kirime qewalek şemsanî û
Dintîkeyên spêdeyê da, bo te çemiyam.
...
Te dihinartim korerêkên hat û batê
Di şûşeyên dergirtî da
Bend bûy, bo bêhinkirinê
Te di bişaftim ava baranên şubatê "[395]

Di vê parçahozanê da, hozanvanî çendîn babetên efsaneyî yên cuda cuda bikar inane.Peyva "Efsaneya Manê" Ya ku di folklora kurdîda heyî ku di çend efsaneyekan da heye weku "Efsaneya Mendê Tirsnak, Efsaneya Xizir Zîndî, û efsaneya Mîr Mihê û efsaneya Çerxa Felekê". Herwesa "Gemiya Exnuxî" ku dizivrît boefsaneya Somerî ya tofanê, ew efsaneya behs li gemiya Zîyosdaray diket, anku gemiya Nuh pêxember li demê amadekirî bo tofana mezin. Herwesa peyva "sîmerx" ku giyandarekê mezin yê efsaneyî ye, diefsaneyên kurdîda gelek dostê mirovî ye, bi rolê xilaskirina qehremanî radibît, herwesa peyva "Mezda" ku navê Ahoramezdayê xwedawendê aynê Zerdeştî ye, herwesa "yarî" anku Yarsanî ku aynekê kevnêmiletê kurde û heta niha maye, herwesa peyva "hat û bat" ku kurtitirîn rêke diefsaneyên kurdîda ku bi tenê qehreman di vê rêkê da diçin ji ber ku rêkeka pir metirisî ye.

[395] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.387 - 391.

Dibikarînana van peyvên efsaneyî yên cur bi cur di vê hozanê da hozanvanî mebest û meremên cuda hebûne; derbirînkirin ji felsefa jiyanê ku hizra here serekî ye dihozana wîda, herwesa lêkgehandina komeka babetên efsaneyî yên kulturê kurdî yên ciyawaz bo peydakirina hizir û felsefeka yekgirtî derbareyî ayin û hizir û îdeolojiya miletê kurd.

Her di heman hozanda wesa hatiye berdewamkirin:

"Eger min agir nedizîba – ba – şil nedibû
Ta rewanên pîs virêbiket.
...
Lê bizane, ku tu afirandeya minî û
Hind nemaye pifkim sulê
Hest bi janên erdî dikî, lê bi jantir.
...
Li benda jûjî, te morikên bizdiyayî vêdidan
Bêy haya te ji hatîyan hebît
Tu û roji borî dibûne stovang
Têkda morî, bi benkên kîfinkoyî ve dipertîn.
...
Erê gava di şevan da
Pelatînk dihêne agirî?
Ne ji serma, ne ji şerma, ne ji germa dihên
Ne sîxwer û cavenêrin
Ne jinbabên wan dihinêrin.
...
Em tevda rabûn semayê, sema canî
Sema liser  xwîna Yezdanî
Ramanên min dibûn mêşereşk
Li hawîr wê derdibûne cejna Cemayê."[396]

Di vê parçehozanê da çendîn babetên efsaneyêxuya dibin, weku Zeos ku mezintirîn xwedawendê Grêkî ye, li vêrê hozanvan babetê dizîna agirî ji layê Promîtosî ve ji xwedwendî û

[396] Hizirvan Ebdulla, Hindek ji We û Hemî ji Min,b 2,  r.394 - 414.

karvedana ji vî karî peydabûyî ku dergehên kerba Zeos lê vebûn.Herwesa peyva (Sul) anku (Buq) ku firîşteyek bi navê Esrafîl pif diketê û erd bi dengê wê wêran dibît û jiyan li ser namînît.Herwesa babetê ku diefsaneyên kurdî da hatî ku seredana Xewsî bo gora Siyapoşî şahê evîndara, piştî mirina wî bi sed salan ku daxwaz ji xwedê kir digel Siyapoşî baxivît, Xwedayî daxwaza wî qebûl kir û ruha Siyapoşîvegerand û li beramber Xewsî rawestiya, ku xewsî pirsyara mirinê jê kir ka ya çewaye, wî bersivda û got: eve demekê kême ez mirîm bidirustahî ez nizanim ya çewaye, belê li demê ez înam min nedizanî ezim mirî, piştî term veşartî û çûn ez jî da çim, serê min li hilanî ket ji nuka min zanî ez im mirî, paşî periyek hate def min, me hindek yarî kirin û ristka wê ya morîyan qetiya me morî vêdan, bes moriyek mabû, tu hatî eger te çi pirsyarên dî nebin ez dê li moriyê gerhim û min nevêt dîsan vegerm ser dinyayê.

Hozanvanî bikarînana van babetên efsaneyê hozana vexwe pê dewlemend kiriye û hizra babetê wê rohn kiriye bi rêka bikarînana nimûnên efsaneyî, herwesa di vê hozanê da anku hozana “Jiyana me çîrokeke û ... Viyana me çîrokek din” hozanvanî bi rêjeyeka here mezin efsane bikarînaye, çiefsaneyên kurdî yan yên miletên dî, ji ber ku babetên efsaneyî derbirînê jihizir û îdeoliyêdiken, bi taybetî di warê hozanê da mefayekê zor jê wergirtiye.

**Encam**

1 – Efsane kevintirîn janrê edebiyê mirovayetî ye, ku miletê kurd bi xwedanê vî curê edebî dihête hejmartin û Kurdistan bi hêlîvanka mirovayetiyê dihîte nasîn ji berku kevintirîn efsaneyên mirovayetiyê li Kurdistanê peydabûyne.Belge bo vê çendê ku peydabûna efsaneyê digel peydabûna mirovî ye ku di vekolînên mîtolojîda diyardibît ku kevintirîn efsane li welatê di navbera herdu rubaranda bûye (Dicle û Firat) ku cihê neteweyên kevinên kurd bûye.

2 – Rêjeyeka zor ya berhemên edebê kurdî li jêr karîgeriya efsaneyêhatiye nivîsîn û babet û hizir û serhatiyên diefsaneyê da bûyîne hêvên bo babetê berhemên edebî bi taybetî hozanê.

3 – Têgeh û pênaseyên efsaneyê bûye babetekê here girîng û hemecur, lewra vekolînên cuda cuda ji layê zanayên taybetmend yên di biyavên edebî, aynî, zimanî, civakî, derûnî, felsefîhwd. da hatîne encamdan, ev çende bûye egerê hindê ku hizir û dîtinên ciyawaz bo têgehê efsaneyê hebin.

4 – Efsane li def zanayan yek ji babetên aluz û çir û pir dihête hejmartin, lewra heta nuke peydabûna wê diyar û aşkira nîne, ji ber ku efsane di gel peydabûna mirovî serhildaye.

5 – Peydabûna efsaneyê girêday bi peydabûna ayînan ve heye, herçende efsane bi ayîn nahête hejmartin jî, ewrêkek e ji bo bihêzkirina aynî ku karîgerîya wê li ser mirovî zortire û pitir girê didet bi aynîve û ji layê derûnî ve aramtir lê diket.

6 –Yek ji armancên nûxwaziya kurdî bi taybetî grûpê Nûkirin Her û Hersaxkirina berhemên folklora kurdî bû, bi taybetî efsaneyên kurdî, ev çende jî di berhemên wanda diyardibît bi taybetî di hozanê da.

7 – Hozanvanên grûpê Nûkirin Her û Hermefa jiefsaneyên kurdî wergirtiye, bi rêjeyeka zortir jiefsaneyên biyanî herçende rêja bikarînana wan nêzîkî yeke. Ewjî bi merema pend û amojgarîyan bo miletî, çunkî di wan efsananda gelek serbor û serhatî hene.

8 – Hozanvan Hizirvan Ebdullayî efsane di hozanên xweda bikar înane bo meremên ciyawaz, bikarînana efsaneyê weku pend û amojgarî û serborî, herwesa bi merema rexnegirtin licivak û ayin û siyasetê û diyarkirina xalên nerînî di dab û nerîtanda. Herwesa bikarînana efsaneyê bi merema ciwanî yan babetên evîndarî ku birûdan û babetên efsaneyî wesifkirîne.

9 - Bikarînana efsaneyê di hozanên hozanvan Hizirvan Ebdullayî da bûye egerê berfirehbûna hizra hozanên wî, ku rêka peyvên efsaneyî yên bikarînayî di hozanê da çendîn babet li def xwêndevanî rohn û aşkira dibin.

10 – Hozanvan Hizirvan Ebdullayî çendîn efsaneyên kurdî di hozanên xweda bikar inane: pîrhevî, sîmerx, Ehrîmen, Ahuramezda, Siyapoş, Xews, Ferx û Sîna, Gulbarîn, Tomatîn, Mîrza, Herza, Memişvan hwd.

Herwesa çendîn efsaneyên biyanî bikar inane: Gilgamiş, Enkîdo, Vînos, Enahîta, Zeos, Promîtos, Ahura hwd.

## Çavkanî


"Livandina Eqlê Kurd", *Metîn*, j.74.

Al – Boxarî. *Sehîh Al- Boxarî*.

Albuweyle, Nebîle. *fî Al-Qisas Al-Şa'bî*, dar Al-Maarif, Al-Qahire 1977.

Alî, Marof Mohamed. "Efsane û Hozan; Hozanên Arif Hîto Wek Nimûne"*Peyv*, j.12.18/1/1999.

Alî, Marof Mohamed. "Efsane û Kozan",*Peyv*, j.13.1996.

Alîksî Lwesîf. *Felsefet Al-Astore*, Tercume:Minzir Hilum, T.1, Dar Al-Hiwar Lil- Neşir wel Tewzi', Al-Laziqiye 2005

Avîvan.“Efsane û Hozan”, *Peyv*, j.129 – 130.2002.

Badî, İsmaîl.“Kovara Nûxwazî Merem ji Derkeftina Wê Çi Bû”, *Peyv*, j.7.Bihar 1998.

Bedel, İsmet Mohamed, hozan û kawdanên wî, kovara Serhildan, jmare(2).

Bedel, İsmet Mohamed, kurtiyek ldor pêşdaçuna kurte çîrok û rumanê li devera Behdînan, kovara Peyv, jmare(33).

Behmaniyan, Dariyoş. *Efsaney Lorî*, Wer. Ezîz Gerdî, Serdem, Silêmanî 2004.

Dawd, Enîs.“Al-Astore fî Al-Şa’ri Al-Arabî Al-Hadis”, Dar al-Marif, Qahîre 1992.

Deruyşan, Alî Eşref; Gerdî, Ezîz.*Efsanezarî kurdî*, Silêmanî 2002.

Desteka Hozana Hevçerx. “Nikirin Her û Her”,*Peyman*, j.7.

Desteka Hozana Hevçerx. “Nikirin Her û Her”,*Peyman*, j.9.2/11/1992.

Doski, Tehsin. “Di Teraziya Nûxwazyê da”, *Vejîn*, j.11.,Bihar 1998.

Doski, Tehsin. “Ji Deftera Hizr û Bîran”, *Rojnama Peyman*, j.5.Dihok 5/9/1994.

Doski, Tehsin. *Rojnama Peyman*, j.7., Dihok2/11/1994.

Ebdal, Ebdal Nurî.“Nikirin Her û Her”, *Peyv*, j.23.,Bihara 2001.

Ebdulkerîm, Ebdulqadir Nurî. *Yaxîbûn di nav Hozana Nûxwaza Kurdî da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Dihok, Koleja Adabê, Dihok 2008.

Ebdulla, Hizirvan. *Hindek ji We û Hemû ji Min, komberhemê helbestê*, b.1, b.2, Rojhilat, Hewlêr 2013.

Ebdulrahîm, Mohamed Latîf. *Dîroka edeba kevnare (edeba Yonanî*), Weşanên Zankoya Dihok.

Ebdulrahman, Şivan Cercîs.*Erk û Regezên Efsaneyê di Çiwar Romanên Devera Behdînan da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Dihok, Koleja Adabê, Dihok 2012.

Ecînet,Mohamed. *Mawsua Asatir Al-Arab An Alcahilye wa Dalalatuha*, T.1, Dar Al-Farrabî, Beyrut 1994

Ehmed, Yasîn Ehmed. *Binemayên rexneya edebî di rojnamevanya devera Behdînan da,* ç.1, Çapxana Xanî, Dihok 2015.

Eliksîl, Wesîf.*Felsefet Al-Astore.*

Elwenî, Necim. *Efsane û Pendî Komîdî Galte Amêzî Kurdî*, Dezgay Muzîk û Kelepurî Kurd, Hewlêr 2007.

Fetah, Dilêr Dawid. *Sembol di Romana Rojên Êtûn da ya Romannivîs Kovan Sindî*, Hîvî, Hewlêr 2016.

Findî, Emîr. “Serhildan Nêrîneke Din”, *Biyav*, j.2.

Findî, Emîrê.“Livandina 'Eqlê Kurd Berev Xwendineka Rexneyî”,*Metîn*, j.71.,Kanûna Yekê 1997.

Hesen, Mewlud İbrahîm.Berew Efsanenasî Kurdî, Ç.1., Serdem, Silêmanî 2015.

Hesen, Mewlud İbrahîm.*Geran Be Diway Nemiri le Felsefey Kurdi û Farsi da*, Nameya Masterê ya çapnekirî, Zankoya Silêmanî, Koleja Ziman.

Hesen, Mewlud İbrahîmî.*Pêkhatey Efsaney Kurdî*, Ç.1.Renc, Silêmanî2007.

Hesen, Şirîn Hemed Emîn. “Çawlêdaxşandinêk be Efsane û Dastanî Kurdî”, *Asoy Folklorî*, j.28., 2007.

Hewêz, Bêrîvan Samed. *Rehendî Efsaneyî le Şî’rekanî Newzad Rafet da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Selahaddîn, Koleja Ziman, Hewlêr 2008.

Hisen, Ebdulrahman Ebdulxafor. *Ezmûnî Nûxwazî, lay Şa'îranî Livînî Nikirin Her û Her*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Dihok, Koleja Adabê, Dihok 2005.

Hisên, Fazîle Ebdulrahman Hisên.*Fikire Al-Astore û Kitabe al-tarîx*, dar Al-baruzî, Tabiae al-Awlî2009K.K. Ranfîn.*Al-Astore*, Ter. Cafer Sadiq Al-Xalîlî, Menşurat Awidat, Beyrut1981.

Hîto, Arif Hîto.“Nejad û Peydabûna Efsaneyê”, *Peyv*, j.14-15.

Hîto, Arif. “Berev Nûkirina Civakê Me”, *Rojnama Peyman*, j.149., 25/2/1998.

Hîto, Arif. “Hevveyvîn”, *Karwan*, j.42.

Hîto, Arif.“Xwendinek Zimanê Sêyem Kanê ya Her û Her Nûkirinê da”, *Biyav*, j.7., Payîz 2001.

Hîto, Erşed.*Dadayizm di hozana Nûxwaza Kurdî da*, Hewar, Dihok 2013.

İbrahîm, Nebîle; Bedirî, Mohamed.*Efsane (Al-Astore),* Ala Al-Wezîriye, Bexda 1986.

Komelêk Mamostay Zanko, *Kurdolojî*, Hîvî, Hewlêr 2015.

*Kovara Nûxazî*, j.1., Dihok 1991.

Kovilî, Selman. “Hozana Evro”, *Metîn*, j.25., Çiriya Yekê, 1993.

Mexmurî, PîrDawid. “Ferhengî Efsaney Cîhanyekan”, *Asoyi Folklorî*, j.48., 2010.

Mukirî, Kameran, *Edebî Folikloriyê Kurdî*, Beşî yekem, Zankoya Selahedidîn, Hewlêr 1984.

Nehêlî, Nimetulla Hamid. *Praktîzekina Rexna Nû yya Anglo-Emrîkî li ser Tekstên Grûpa Nikirin Her û Her (rexne û vekolîn),* Ç.1., Hawar, Dihok 2013.

Nimettulla Hamid Nehêlî. “Deravek ji Rexnê; Nûkirin Her û Her ji Bilindahiyê Berev Gorê”, *Peyv*, j.51., 2009.

Qoçan, Mihsin. “Hevpeyvîn”, *Gazî*, j.46. 1998

Qoçan, Mihsin.“Mijdarî di Hunerî da”, *Peyv*, j.14-15. Dihok19/6/1997.

Resul, İzzedidîn Mistefa.Edebê Folklorî Kurdî Lêkolînewe, Aras, Hewlêr 2010.

Ridênî, Wesfî Hesen. *Rojnamegerîya devera Behdînan 1950 – 2005*, ç.1. Spîrêz yê çap û Hewlêr 2006.

Sabir, Perîşan Xalid. *Rehendî Efsaneyî le Lawkî Kurdewarî da*, Nameya Masterê ya Çapnekirî, Zankoya Selahaddîn, Koleja Ziman, Hewlêr 2014.

Şareza, Kerîm.*Efsane le şî'rî hawçerxî kurdî da*, ç.1., Roşenbîrî, Hewlêr 2005.

Seccadî, Eladdîn.*Mêjûy Edebî Kurdî Efsane*.

Şehbaz, Şukirî.*Kevalekê Riws*, çapa yekê, Weşanên Yeketiya Nivîserên Kurd – Dihok, Hawar, Dihok2005.

Selîm, Mustefa. “Hevpeyvîn”, *Gazî*, j.46. 1998.

Semara, Ranya; Alî, Hisên Sabîr.*Efsane û Edeb*, Şehab, Hewlêr 2008.

Tadiris, Xalîl Hena.*Hilî Al-Asatir Al-Alemiye*, Dar Kitabina lil neşir, Beyrut2013.

Xweşnaw,Ferhad Ezîz.*Afrandin û Mirdin le Efsaney Kurdî da, Bepêy Avêsta û Deqe Pehlewîyekan,* Hacî Haşim, Hewlêr 2013.

Zerdeşt, Ehmed. *Kawe û Newroz ... Efsane û Bîrî Nwê*, Dezgay Rewşenbîrî û Belawkirdinîwey Kurdî, Silêmanî 1999.

Ziyab, Ebu Ubeyd Ebdulla.Hozana Nûxwazî li Devera Behdînan, ç.1., Wezareta Perwerdê, Dihok 2005.

**Hevpeyvîn:**

Ebdulla, Hizirvan:

Dihok/ Baregayê Kovara Metîn, 28/1/2016.

BaregayêYeketiya Nivêseran, Dihok, 18/1/2016.

Baregayê Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok, 27/12/2015.

Barêgeya Kovara Metîn, Dihok, 29/12/2015.

Baregayê Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok, 30/12/2016.

Barêgeya Kovara Peyv, Dihok, 14/2/2016.

Barêgeya Kovara Metîn, 21/1/2016.

Baregayê Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok, 6/3/2016.

Barêgeya Kovara Metîn, Dihok,3/2/2016.

Barêgeya Kovara Metîn, Dihok, 27/2/2016.

1. Hîto, Arif

Baregayê Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok 1/4/2016.

2. Omer, Fazil,

Baregayê Kanalê Waar TV, 15/2/2016.

Baregayê Kanalê Waar TV, Dihok, 19/1/2016.

Baregayê Kanalê Waar TV, Dihok, 8/2/2016.

Baregayê Kanalê Waar TV, Dihok, 15/2/2016.

3. Qoçan, Mihsin:

Barêgeya Kovara Metîn, 3/2/2016

Barêgeya Kovara Metîn, 30/1/2016

Gulxana Dana, Dihok, 23/1/2016.

Baregayê Yeketiya Nivîserên Kurd, Dihok, 27/2/2016.

Barêgeya Kovara Metîn, Dihok, 21/1/2016.